Kûçik çûnê, nego wirî
Gava çavê mi-l çava ket
Xwin li canê min tewirî.

Erê wele, hime û yela
Hêw-ha, him-ha.....

Dî vir de kêşan hate guhartin:

Golik çûne ziyane
Keçik vêre bezyane
Xortino wemê talane

Erê wela, hime û yela

Lê lê dînê, keça dînê
Kiras sorê pêşmal şînê
Haydê-m hevdi birevînin
Xwe bavêjin dor Mêrdînê.

Erê wela, hime û yela

Lê lê tolê, keça tolê
Pêşmal şînê gol bi golê
Xortê xelkê te dîn kirin
Te har kirin berdan çolê.

Erê wela, hime û yela

Lo Xwedêwo, xweş Xwedêwo
Av di konê me bizê wo
Keça malê rabe pê wo
Çi bejnika zirav lê wo
Çi xeftanê şamî lê wo
Her alîkî cêbek tê wo
Her cêbekê sêvek tê wo
Kes nizanî rizqê kê wo.

Erê wela, hime û yela

Min çî got û tu xeyidî
Ava gola li me cemidî
Geyayê çola li me seridî
Çi aybika te-l dor min dî
Dev ji min berda, yeke xwe dî.

Erê wela, hime û yela

Min gewrê dîbû li kanîya cila
Teşt û beroş li ser mila
Haydê-m hevdi birevînin
Xwe bavêjin nava mila
Xwe bavêjin gundê fila.

Erê wela, hime û yela

Min gewrê dibû li ser kanîyê
Zêra zer kir li anîyê
Reşo lawol her pêşîyê
Jê bistine mêranîyê
Ji bo xatrê cîranîyê
Erê wela, hime û yela
Hêha, himha!.....

Min gewrê dibû li ber qûbê
Ser bi zêrê kum bi ribê
Were rûnin heta sibê
Min çi got û wê go libê.
Erê wela, hime û yela
Hêha, himha!.....

Herê wayê, herê wayê
Qeda bikevî li xwedyê kayê
Ji wi were bihar nayê
Dosta xwe da bi selika kayê.

Herê vayê, herê wayê
Şêx û mele çûn zekayê
Berf û baran bevre dayê
Xwedo-Rebî, yek ji wa nayê

Himew hayê, herê wayê
Dikim nakim dan demayê

Qeşa bikevî vê dinyayê
Kes di hana kesî nayê
Heçî nayê, bigrî tayê.

Ta xerabe jê ranabe
Işev bigrî
Sibe bimrî
Jin û mêre
Mal ji te re
Bibe û here
Tu li çi digere
Ma tî kere?

Erê wela, hime û yela
Hêha, himha!.....

BARANEK BARÎ

Baranek barî lê ji hewrên biharê
Baranê şilkir lê desmala yarê
Geşt û seyrane lê li binya vê darê

Baranek barî lê ji hewrên payîzê
Baranê şilkir lê desmala qîzê
Geşt û seyrane lê li binya vê guîzê

Baranek barî ji hewrên havînê
Baranê şilkir lê desmala zînê
Geşt û seyrane lê li binya Mêrdînê

Baranek barî lê ji hewrên zivistanê
Baranê şilkir lê şeml û kitanê
Geşt û seyrane lê li binya Sînanê.

BAVÊ SEYRO (STRAN Û LAWIK)

Bavê seyro qurba! çima tu deynakî?
Her çar malê Alûca li qûna diyêr deman nakî?
Sîng û berê min keçikê weke bexçê zinara Mêrdînê
Ji xwe ra tapo nakî.

Yadê! navbera min û bavê Seyranê
Xweş dîware
Ezê rabim pehînkê lêxim bere
Ji jorde bêyî xware
Heke dê û bavê min keçikê gotin:
Lawo çî bû çî qewimî?
Ezê bêjim: Yabolo Yadê! bû girêna destare.

Yadê rebenê! min bavê Seyranê dîbû li wî milî
Xwezî sê biskên dişê biketa ber
Sînbêlên bavê Seyro, reşe palikkirî
Min sond xwarîye terka bavê Seyranê tu çar nakim
Heta teresê Çoxreşa li min û
bavê Seyranê nekin gilî.

BAZO QURBA!

Bazo qurba! li ser xaniya li çî dinêrî?
Dawa taqîkê sipî dikî herî!
Wele zanîm tu li kuştina min û xwe digerî

Bazo qurba! li ser xaniya tu meş meke
Dîwê çigarê bi ser simbêlên xwe de tu geş meke
Dilê tog û tewagê gundê min rebenê bimi xweş meke

De were bazî, were bazî, were bazî, were bazî
Tu feqîrî, tu rebenî, tu bê malî, belengazî
Qelenê te nîne, tu nikarî min bixwazî
Ezê muhbeta apê bavêjime ser birazî.

De were bazî, were bazî, tu bazîyê xelkê
Bejna te zirave bazî heyra, ji dara belkê
Minê soza mezin li ber destê Xwedê daye
Heta li darê dinyayê saxim nadim terkê.

BERBÛKÎ

Rojên, ko bûkê diguhêzin, hin dîlokan dibêjin û car na li ser zava jî têne gotin.

Xaniyê bavê bûkê korte
Li ser xêni morte morte
Bûkê megrî! zava xorte

Bavê bûkê gurê nêro
Li ser xêni bê didêro
Bûkê hêjaye tûrek zêro

Xwakê bûkê hatin teyo
Bike kar û bara xweyo
Zava xorte bi dilê teyo

Bûkê delalê! rabe xwe karke
Şûşa gulavê bi ser xwe dake
Zava ciwane xortekî pake

Zava zava, kekê mino zava
Min bazara bedlê te kir
Kekê mino zava
Mi-j bîr kir û te-j bîr nekir
Birikê mino zava

Çûme Şam û Diyarbekir
Kekê mino zava
Min bazara sola te kir
Birikê mino zava
Min ji bîr kir boyax nekir
Kekê mino zava.

Terqînek ji çiyê tê
Îşev ewro



BERDÊLÎ (HESENKO)

Hêli lo, hêli lo, Hesenko hêli,
Hêli lo, hêli lo, Hesenko hêli.

Çekan girêde li, xwe berde geli,
Çekan girêde li, xwe berde geli.

Darê darçinan lo, vegirtin xêli,
Darê darçinan lo, vegirtin xêli,

Hesen zavaye lo, Nûrik berdêli,
Hesen zavaye lo, Nûrik berdêli.

Hêli lo, hêli lo, Hesenko hêli,
Hêli lo, hêli lo, Hesenko hêli.

Deşta Temranê lo, xali ye xali,
Deşta Temranê lo, xali ye xali.

Porê keçikê lo, erdê dimali,
Porê keçikê lo, erdê dimali.

Dergistiya te bûm lo, ketim vi hali,
Dergistiya te bûm lo, ketim vi hali.

BERDESTARÎ

Ew kî bû-l ser erzêlê, li ser erzêlê lê
Ne-m go wê bê, te-dgo, na
Xesro bû li ser erzêlê, li ser erzêlê lê
Ne-m go wê bê, te-dgo, na

Perekê hûr dijmêrê, hûr dijmêrê lê
Ne-m go wê bê, te-dgo, na
Qelenê serbizêrê, kofî kêlê, bisk bi têlê lê
Ne-m go wê bê, te-dgo, na.

BESE DINALE WELAT

Bese dinale welat, ji van kul û derdan.
Refê keçê te rabûn, ji çiya û deştan.

Axa Kurdistan welat, şên û şirine.
Ji bo Kurdistan emê xwinê birjinin.

Serê xwe rakir welat, karker û cotkar.
Ewê derinin dijmin, ji axa Kurdistan.

Em ji gelê xwe welat, em bi hêvi ne.
Emê mafê xwe bi lez, bi zor bistinin.

Bese dinale welat, ji van kul û derdan.
Refê xortê te rabûn, ji çiya û deştan.

BESNA XELIL

Yadê, navê min keçikê Besna Besnayê!
Weyla li min porsorê por belayê,
Teniya Mûşê, heşa Helebê di xwe dayê,
Bavê-m xêrê bikî bi çavê serê xwe nebînî,
Çawa nedame xortekî ji mala Hesên axa apê Behrî
Simbêlsorê ser xaniya, destmala dest lawika
Roja dawet û ayd û şahîya,
Ez dame İbrahimê Temo hirçê Bûbilanî,
Kerqolanê riya Nisêbine, heq ji sîng û berê
Min dernayê, yadê rebenê!
Besê rebenê!

Yadê rebenê!
Ezê rabim kumekî çêkim bi lirakî,
Ezê dorekî lêxim bi heqê gaki,
Ezê nivîstekê lêxim bi devakî..
Min digo:
Qey ezê bidim serê xortekî,
Ji xortê mala Hesên axa apê Behrî,
Min nizanibû,
Ezê bidim serê İbrahimê Temo,
hirçê Bûbilanî, kerqolanê riya Nisêbinê
Şahid û şihûdê vî ciwanmêrî gelek hene,
Ji çemê Amûdê heta bi lêfê Darê,
Reviya ji ber filakî.
Besê rebenê!

Yadê rebenê!
Navê min keçikê Besê, Besna Xelîle,
Porê min sore nava min qendile,
Bavê-m xêrê bikî bi çavê serê xwe nebînî,
Çawa nedame xortekî ji xortê mala
Hesên axa apê Behrî,
Ez dame İbrahimê Temo hirçê Bûbilanî,
kerqolanê riya Nisêbine,
Hostekê Tîfikan û Kulîna.
Besê rebenê!



Bi din me ha bi din me bi din me bû kî ka me

BIDIN ME BÛKİKA ME

Bidin me ha, bidin me,
Bidin me, bûkika me,
Bidin me ha, bidin me,
Bidin me, bûkika me,

Wellehi nadim bûkê yo,
Billehi nadin bûkê yo,
Hetani xêli neyê
Billehi nadim bûkê yo.

Xêli buxe serê we,
Waye mal da hazire,

Bidin me ha, bidin me,
Birin me, bûkika me.

Wellehi nadim bûkê yo,
Billehi nadim bûkê yo,
Hetani sandiq neyê,
Billehi nadim bûkê yo.

Sandiq buxe serê we,
Waye mal da hazire,
Bidin me ha, bidin me,
Birin me, bûkika me.

Wellehi nadin bûkê yo,
Billehi nadim bûkê yo,
Hetani zava neyê
Billehi nadim bûkê yo.

Zava buxe serê we,
Zava wa ye li dû me,
Bidin me ha, bidin me,
Bidin me, bûkika me.

BIRAYÊN DELAL

Brayê delal hun werin, kurdino!
Bihîştê welat em herin, merdino!
Eger hun nayên, vane keç em meşin,
Bese koletî, serfiraz her bijin.

Herne pêş, herne pêş, dewr û demya we ye,
Welat çav li rê, bendewarê me ye.
Herne pêş, herne pêş, dewr û demya we ye,
Welat çav li rê, bendewarê me ye.

Keçên nû gihan, em dixwazî xebat,
Me canê ciwan dani rê ka welat
Dilê me ji pola, gurçîk bûye hesin,
Bo ala rengin hun werin, em besin.

Herne pêş, herne pêş, dewr û demya we ye,
Welat çav li rê, bendewarê me ye.
Herne pêş, herne pêş, dewr û demya we ye,
Welat çav li rê, bendewarê me ye.



BISK BI TÊL

Bisk bî têt, bisk bî têt,
Here were hêla mîn.
Bisk bî têt, bisk bî têt,
Disa sîba te bî xêr.

Bisk bî têtê delalê,
Keremke, were malê.
Bisk bî têt, bisk bî têt,
Te nadim roniya malê.

Sibeye, roj tav daye,
Bisk û tûncik badaye.
Bisk bî têt, bisk bî têt,
Muhbeta nav dilaye.

Bisk bî têt, keçika rinde,
Çiçeka nava gunde.
Bisk bî têt, bisk bî têt,
Serê mîn ji bîlînde.

Sibeye, ro germiji,
Ez û tu tevda diji.
Bisk bî têt, bisk bî têt
Vê hesretê mîn dikuji.

Bisk bî têt, bisk bî têt,
Here were hêla mîn.
Bisk bî têt, bisk bî têt,
Disa sîba te bî xêr.



BIZINA BELLA HÊŞIN

Tow, tow, tow, tow, tozilme,
Hoca lo, dino lo, tozilme,

Dawetê girm û girme,
Haco lo, dino lo, tozilme.

Bızına bella hêşın e,
Tow, tow, tow, tow, tozılme,
Bızına bella hêşın e,
Haco lo, dino lo, tozılme.

Yêk dımırı, yêk dımıne,
Tow, tow, tow, tow, tozılme,
Yêk dımırı, yêk dımıne,
Haco lo, dino lo, tozılme.

Salê carê cot tine,
Tow, tow, tow, tow, tozılme,
Salê carê cot tine,
Haco lo, dino lo, tozılme.

Qelındê yarê dertine,
Tow, tow, tow, tow, tozılme,
Qelındê yarê dertine,
Haco lo, dino lo, tozılme.

BİNGOLÉ TU AVA BI

Oy yeman, yeman, yeman,
Yar yeman.
Oy yeman, yeman, yeman,
Can gulam can.

Bingolê tu ava bi,
Yar yeman.
Tiji bûk û zava bi,
Can gulam can.

Ez heliyam, qet tışt nemam,
Yar yeman.
Ez heliyam, qet tışt nemam,
Can gulam can.

Ez bûme avê çeman,
Yar yeman.
Ez bûme avê çeman,
Can gulam can.

Bingolê tu ava bi,
Yar yeman.
Tiji bûk û zava bi,
Can gulam can.

Oy yeman, yeman, yeman,
Yar yeman.
Oy yeman, yeman, yeman,
Can gulam can.

BINGOLE XWEŞ BINGOLE

Bingole xweş Bingole,
Eman yeman.
Bingole hezar gole,
Can kewam can.

Jê derket qeflek jine,
Eman yeman.
Çavê mın yeka mezine,
Can kewam can.

Mexelê pezê kole,
Eman yeman.
Lê diçêre bızina kole,
Can kewam can.

Bingole gol biçûke,
Eman yeman.
Bingole gol biçûke,
Can kewam can.

Bingole gol mezine,
Eman yeman.
Bingole gol mezine,
Can kewam can.

Jê derket cotek bûke,
Eman yeman.
Çavê mın yeka biçûke,
Can kewam can.

BIRINA REŞ FAŞIZM

Canê me girt, can nehêşt,
Xwina me girt, xwin nehêşt,
Mala me da nan nehêşt,
Bırina reş faşizm.
Mala me da nan nehêşt,
Derdê gıran faşizm.

Leşkerê xwe pır dıkın,
Milletê me qır dıkın,
Cıgera me ar dıkın,
Bırina reş faşizm.
Cıgera me ar dıkın,
Bırina reş faşizm.

Millet dibê rê vaye,
Azadiya me heye,
Faşizm dijminê me ye,
Bırina reş faşizm.
Faşizm dijminê me ye,
Derdê gıran faşizm.

BİRNAKIM HA BİRNAKIM

Birnakim ha birnakım,
Kırına Lenin birnakım.
Riya Lenin danakım,
Birnakım ha birnakım.

Xeber hatiye seheran,
Delil hatiye seheran,
Kurd ketine defteran,
Birnakım ha birnakım.

Sala hevdeh, hejdeh, bist,
Me xeberek xweş bihist.
Derket navê sosyalist,
Birnakım ha birnakım.

Lenin hatiye welatan,
Gel hatine civatan.
Bo azadiya milletan,
Birnakım ha birnakım.

Bü kê lê lê bü kê lê bük ber mali ya
ma la mın Min tılı da we tê di bû
bü kê lê lê bü kê lê mın tılı da we
tê di bû bük ber mali ya ma la mın

BÛKÊ

Bûkê lê, lê, bûkê lê,
Bûk bermaliya mala mın,
Bûkê lê, lê, bûkê lê,
Bûk bermaliya mala mın.

Zendê zer gışt hine bû,
Bûkê lê, lê, bûkê lê,
Zendê zer gışt hine bû,
Bûk bermaliya mala mın.

Mın tu lı dawetê dibû,
Bûkê lê, lê, bûkê lê,
Mın tu lı dawetê dibû,
Bûk bermaliya mala mın.

Fistana sor lê dibû,
Bûkê lê, lê, bûkê lê,
Fistana sor lê dibû,
Bûk bermaliya mala mın.

Tılı û bêçî hine bû,
Bûkê lê, lê, bûkê lê,
Tılı û bêçî hine bû,
Bûk bermaliya mala mın.

Mın ser bejnê biribû,
Bûkê lê, lê, bûkê lê,
Mın ser bejnê biribû,
Bûk bermaliya mala mın.

CANÊ CANÊ


Dilan geş û rewş e, herkes pê serxweş e,
Erd û ezman şen bû bî vê dilanê...

Canê canê canê were meydanê,
Dilê min pırr xweş e bî vê dilanê.

Dilan gelek xweş bû, dilê m' pê şorêş bû,
Dilê dijmin reş bû bî vê dilanê...

Keç û jin û pir tev, xort û mêr hatin rex hev,
Rabûn tev dest dan hev lî vê meydanê.

Moderato



CAREK MIN GOT

Carek min gotî tu were li eywanê,
Du car min gotî tu were li eywanê
Şimikî p'êke, de girêde k'esrewanê,
Wez yarkî t'ome, ç'e'vereşî ç'e'v dermanê,
Wez lawkî t'ome, ç'e'vereşî ç'e'v dermanê

Carek min gotî tu were nav rezî,
Du car min gotî tu were nav rezî,
Şimikî p'êke, de girêde merezî,
Wez yarkî t'ome, tu biskê çarde kezî,
Wez doste t'ome, tu biskê çarde kezî.

Ci ra nê ci ra nê ci ra na min
 he va lê ho girê ber mal ya min
 Na ci ra na min ber be na
 ci ra nê ci ra nê ci ra na min
 na ci ra na min ber be na
 he va lê ho girê ber mal ya min

CIRANÊ

Ciranê, ciranê, cirana min,
 Hevalê, hogirê, bermalya min,
 Ciranê, ciranê, cirana min,
 Hevalê, hogirê, bermalya min,


Na cirana min berbena,
 Ciranê, ciranê, cirana min,
 Na cirana min berbena,
 Hevalê, hogirê, bermalya min,

Qom şirino terk nêkena,
 Ciranê, ciranê, cirana min,
 Qom şirino terk nêkena,
 Hevalê, hogirê, bermalya min,

Terkê dayikan xo nêkena,
 Ciranê, ciranê, cirana min,
 Terkê dayika xo nêkena,
 Hevalê, hogirê, bermalya min,

Corde êna istêran xwar kena,
 Ciranê, ciranê, cirana min,
 Corde êna istêran xwar kena,
 Hevalê, hogirê, bermalya min,

Işlig zama yi naqış kena,
 Ciranê, ciranê, cirana min,
 Işlig zama yi naqış kena,
 Hevalê, hogirê, bermalya min,



ÇAÇANÊ

Yaxû yeman Çaçanê,
H'imra beyda quysanê,
Çaço dîbê li zer birê,
Av k'işandî bi zincîrê,
Zincîr qetya k'et birê,
Destê xwe destê Çaço kim,
Birevînim bavêm welatê Cizîrê.

Yaxû yeman Çaçanê,
H'imra beyda quysanê,
Çaço dîbû li ser dik'ê,
Av k'işandî bi e'lbikê,
Zincîr qetya k'et dik'ê,
Destê xwe destê Çaço kim,
Birevînim bavêm welatê Dêrikê.



ÇÛME ENDÎWARÊ MÊVANÎ

Çûme Endîwarê mêvanî,
Hatim Endîwarê mêvanî,
Malê me ji malê k'oçera,
Halê me ji halê k'oçera.

Danye Endîwarê bêndera,
Me dane ber şûra û xencera,
Hey were, were, were,
Hey were, were, were.

Çûme Endîwarê serê girî,
Hatim Endîwarê serê girî,
Kul û derdê ç'e'vreşê,
H'emû mane vî dilî.

Çûme Endîwarê devê kanyê,
Hatim Endîwarê devê kanyê,
H'eyfa ç'e'vê reşbelek,
Dane ber şûra û e't'fyê.

Pirsa yarê bikne ji xudanî,
Kesek ji halê kesek nizanî,
Hey were, were, were,
Hey were, were, were.

DAYÊ TU HENE BÎNE

Dayê tu hene bine, bine lî destê mîn xine.
Dayê ez işev mêvanîm, çiyê mîn lî cem xwe dayne.
Dayê tu hene bine, bine lî destê mîn xine.
Dayê ez işev mêvanîm, çiyê mîn lî cem xwe dayne.

Bari berfa buharê, govend geriya lî berwarê,
İşev çûbûm govendê, ez ketim milê yarê.
Dayê tu hene bine, bine lî destê mîn xine.
Dayê ez işev mêvanîm, çiyê mîn lî cem xwe dayne.

Çûçik firi, teyr dani, zava derket ser xani.
Çûçik firi, teyr dani, zava derket ser xani.
Dayê tu hene bine, bine lî destê mîn xine.
Dayê ez işev mêvanîm, çiyê mîn lî cem xwe dayne.

DAYÊ WELAT ŞIRINE

Dayê welat şirine, ez sond xwari me.
Ger bî miraz neqewli, çav lî rêwi me.
Jî bo me ew derd û kul gellek dîkşine.
Bê welat ez sêwi me.
Dayê welat şirine, dayê welat şirine,
Welat şirine.

Wek dayika lawîk bin, hemî kîr zava.
Te zar û zêçan pîr kîr, xêni kîr ava,
Te gellek mal û hal kîr, gellek pê hêşiyayî
Dayê welat nebû azad,
Dayê welat şirine, dayê welat şirine,
Welat şirine.

Dayê sibe çet nayê ger mîn nehêli,
Hinek êş bî canê mîn, tu mîn bixemlinî.
Şev û roj lî serê mîn, histêr dibarinî.
Car dîn wek wê nakşinîn,
Dayê welat şirine, dayê welat şirine,
Welat şirine.

Şiyar'ım ez bê welat naxwazım jîyan.
Ewe dayika me hemû lawên kurdan.
Tu car ez wê naxinım jî zar û zıman.
Navê wê ye Kurdistan,
Dayê welat şirine, dayê welat şirine,
Welat şirine:



DAYIK DELİLÊ

Sibe ye, ro zeriqi,
Dayik delilê, delilê,
Sibe ye, ro zeriqi,
Dayik delilê, damayê.

Zêr li heniye bırıqi,
Dayik delilê, delilê,
Zêr li heniye bırıqi,
Dayik delilê, damayê.

Çavan di dil xeriqi,
Dayik delilê, delilê,
Çavan di dil xeriqi,
Dayik delilê, damayê.

Êvar e ro dereng e,
Dayik delilê, delilê,
Êvar e ro dereng e,
Dayik delilê, damayê.

Sî daket ciki teng e,
Dayik delilê, delilê,

Sî daket ciki teng e,
Dayik delilê, damayê.

Heyrana bejna şeng e,
Dayik delilê, delilê,
Heyrana bejna şeng e,
Dayik delilê, damayê.

Êvar e ro li e'sır
Dayik delilê, delilê,
Êvar e ro li e'sır
Dayik delilê, damayê.

Si daket ciki kesır,
Dayik delilê, delilê,
Si daket ciki kesır,
Dayik delilê, damayê.

Qurbana çavê hêsır,
Dayik delilê, delilê,
Qurbana çavê hêsır,
Dayik delilê, damayê.

DAWİD LAWŌ MERE DEW!

Dawid lawo mere dew
Naxum dew, naçinim dew
Çi taştêke bi derew
Dawid lawo mere dew.

Dew dewê bizna kirre
Dawid lawo mere dew
Ava Zêdiyê pirre
Dawid lawo mere dew.

DE BERDE

De berde hay berde
Havîne bi kul û derde
Hay de berde hay de berde...

Lo lawo destê min berde
Wexte mêrêm bê ji der de
Lo lawoo, destê min berde
Mib kujî te bi serde
Serxweşo destê min berde
Hay de berde hay de berde...

Min û axurê gamêşa
Lo lawoo, destê min berde
Destê min girt û kêşa
Serxweşo destê min berde
Xwedê heqîya min bêni
Lo lawo destê min berde
Di nav van bisk û bêşa
Serxweşo destê min berde
Hay de berde hay de berde...

Min û axurê van mîya
Lo lawo destê min berde
Destê min girt û kenîya
Serxweşo destê min berde
Xwedê heqîya min bêni
Lo lawo destê min berde
Di nav hel û morîya
Serxweşo destê min berde
Hay de berde hay de berde...

Min axurê berana
Lo lawo destê min berde
Memik weke fincana
Serxweşo destê min berde
Xwedê heqîya min bêni
Serxweşo destê min berde
Di nav hel û mircana
Serxweşo destê min berde
Hay de berde hay de berde...

DE BI LÛR LÛR TEŞIYÊ

De bı lûr, lûr, lûr teşiyê.
De bı lûr, lûr, lûr teşiyê.

Teşiya mın jı dara bi yê,
Lê dirêsim heriya mi yê.
Îşev çûbûm govendê,
Ketım milê berbûyê.

De bı lûr... (*Girêdan*)

Teşiya mın jı dara darê,
Lê dirêsim heriya kar ê.
Ez gewrê birevinım,
Gune lı hustiyê cinarê.

De bı lûr... (*Girêdan*)

Teşiya mın jı dara merxê,
Lê dirêsim heriya berx ê.
Îşev çûbûm govendê,
Ketım milê çavreşê.

De bı lûr... (*Girêdan*)

DE LE VANE

De le le le le Vane
Bı hasrata yerivane
Bı hasrata yerivane
Gihîştı tu û dermane

De le le le le Naze
Karwan rabu jı Sevaze
Bı hasrata Alagyaze
Xewa şirin te tu raze

(*Girêdan*)

De le le le le Vane
Bı hasreta Ararate
Ew çiyayen (ke) Ararate
Berfa me şa lı ne bare

(*Girêdan*)

De le le le le le Mete
Şahi ket nava mileti
Weka em herin dawate
Xilas bıbın jı nebete

DELALÊ BERÎYÊ

Lo lo, lolo delal,
de lolo, lo delal

Agirek kete binê berîka min di jêre
şewitî şerqalê Evdilezîza şewitî,
Kepezê Kîka, hawîkê Hemedîya xopan
pûş û pelaxê newala İstîlîlê vêre,
Cîhê terş û talanê mala bavê min keçikê.
Ezê neketime heyra terş û tafanê mala
bavê xwe rebenê,
Lê siba bihare, wê Wardozî bigerin
li wara
Ezê ketime heyra şerpezîya siwêre
lo delal, hey lolo!

De lolo, lo delal!
Tu delalî malê,
şekirî nava desmalê,
mewijê Hibabê,
sêvê Xelatê,
êmîşê dora Rişmilê û Qibalê
kul û kedera ber dilê min evdalê lo delal
lo delal!
Lolo lo delal!

Li me derketî sitêra va egîta,
Şewqa xwe daye pozê keleha Mêrdîn,
serê minara Nisêbinê;
pozê Bagoka şewitî
di binyê re, her çar konên me Aşîta
hey lolo!
Minê sonda mezin xwariye!
Terka delalê mala bavê xwe nakim,
Heta li ser serê min evdala xwedê
nebi hewehewê di siwaran,
xuşînê rîman, şingînê şûran,
Terqîna darê bêxwedîyê va darçîte!
Lo delal!
Lolo delal!

Xwedêwo, Rebîyo! minê tiştêkî giran
ji te navê!
Minê tu ters û talan ji te navê!
Minê tu qesr û eywan ji te navê!
Tiştê minê ji te divê:
Konekî sêsitûnî, darçîlî,
ji darê darbenavê!
mêkutî ji darê darbotavê.
Minê vegirta li ber çemê Hemediyê
serê vê duavê,
Bere serê minê li ber sîyê, nigê minê li ber tavê
belkî nola carê di berê
delalî malê, sewarê Hedbên
xwe bide ser qûna rimê,
li min evdala xwedê bikrana silavê
hey lolo!

De lo lo lo delal!
Delalê malê siwar bûye bi sariy sibê re
li mehînê,
Min evdala xwedê destekî xwe avête
zengiwê û destê dinê avête vê dezgînê,
Delalî malê kar û bara xwe kiriye
wê herî nêçîra karê xezala, binê berîka
vê Mêrdînê,
Roja qal û qewamê digiran
mêra dikuje kela vedgerîne;
mala Êmşa û Îmêşa çelabatê bedewa
û Şemera dişkênine
talanî kurê Kurmênc
bi tena darê rimê vedgerîne
hey lolo
de lolo lo delal!

Minê sûnda mezin xwariye
Heçî saloxekê ji delalî malê ji me re bîne
ezê bidimê heft aşê mala bavê xwe rebenê
li ber çemê Nisêbinê.
Eger pê razî nebû, ezê ramîsana rûkê rastê
bidim di mizgînê
Hey lolo.....

DE KINA MÎN, KINA MÎN LÊ

Hezro ye, Hezro ye lê
De kina min, kina min lê
Bişewitî berbiro ye lê
Zerya zer mala minê

Kina min gezo ye lê
De kina miñ kina min lê
Kinika mi gezo ye lê
Zerya zer mala minê.

Mardîne, Mardîne lê
De kina min kina min lê
Mardîne, Mardîne lê
Zeyra zer mala minê.

Kinika min şêrîne lê
De kina min, kina min lê
Kinika min şêrîne lê
Zeyra zer mala minê.

Bişewitî tim havîne lê
De kina min, kina min lê
Bişewitî tim havîne lê
Zeyra zer mala minê.

Alqûşe, Alqûşe lê
De kina min, kina min lê
Bişewitî bi pûş û mûşe lê
Zerya zer mala minê.

Kinika min dergûşe lê
De kina min, kina min lê
Kinika min dergûşe lê
Zerya zer mala minê.

Cezîre, Cezîre lê
De kina min, kina min lê
Bişewitî cihê mire lê
De kina min, kina min lê.

Kinika min wezîre lê
De kina min, kina min lê
Kinika min wezîre lê
Zerya zer mala minê.

Allegro



De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê,
Fîn - ca - no, Des - tek h'i - no, mir - ca - nê lê,
de lê, lê, lê, Fîn - ca - no, Qı - rik t'i - je
mir - ca - nê lê, qı - rik ti - je mir - ca - nê,
De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fîn - ca - no.

DE LÊ, LÊ, LÊ, FİNCANO

De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Destek h'ino, mircanê lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Qirik t'ije mircanê lê, qirik t'ije mircanê,
De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano.

De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Germüş gundê filanê lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Serra E'bra milanê lê, binîra dîzê H'eranê,
De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano.

De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Serê Finco şe'rek lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Şe'r firyabû p'aşûlê lê, şe'r firyabû p'aşûlê,
De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano.

De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Ew p'aşûla keç'ikane, de lê, lê, lê, Fincano,
Memik yara xortane lê, ç'iç'ik yara kalane,
De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano.

De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Serê gundo darek lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Binya gundo darek lê, dara girtî kunciye,
De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano.

De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano,
De çiyê, çiyê, çiyê, lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Dara girtî kuncîye lê, dara girtî kuncîye,
De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano.

De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Anê sûcê min çiyê lê, de lê, lê, lê, Fincano,
Bavo sûcê min çiyê lê, lawik aşiqê min bîye,
De lê, lê, lê, de lê, lê, lê, de lê, lê, lê, Fincano.

DE LÊ LÊ SEYRANÊ

De lê, l ê, lê, lê Seyranê
De lê, lê, lê, lê Seyranê

Siyran dema mîn nine,
Rabê çeka mîn bine,
Carek bala xwe bide,
Lî hawîr bû hurmine,

Heval gazınca meke,
Belê doza me yeke,
Riya mîn diramine,
Çark zarok û baveke,

Xwişka Seyran dîşewati,
Kes dozê nabe xwedi.
Em ji xwedi zarokî.
Doza xwe dibî xwedi.

De lê, lê, lê, lê Seyranê.
De lê, lê, lê, lê Seyranê.

Seyran dayîka zarokan,
Şêr û mêrxasên Kurdan.
Em ji xwedi zarok bûn,
Bo welat serê xwe dan.

Hê pîr şêrê me hene.
Le ew ne weki te ne.
Ger bo welat şehîd bîn,
Kesi dîn du wan heyê.

Xwişka me, em ne kotine,
Namerd navê me nine.
Kesê welatperwer bîn, qet
Bê tevdîr nasekine.

DELİL XANÊ

Ez ser bana, tu ser bana,
Delil xanê, xana mın.
Ez ser bana, tu ser bana,
Dayıka te qurbana mın.

Ez l' şemokê, tu l' şemokê,
Kurtık sorê l' ser neyûkê
Çıl zêr dabû ser ceynûkê.

Ez l' hewliyê, tu lı hewliyê
Kurtık sorê l' ser paniyê.
Çıl zêr dabû ser eniyê

Ez'l sıvdarê, tu l' sıvderê,
Kurtık sorê l' ser mêzerê,
Çıl zêr dabê ser kemberê.

Ez ser bana, tu ser bana,
Delil xanê, xana mın.
Ez serbana, tu ser bana,
Dayıka te qurbana mın.

DE RABIN KURDINO RABIN

Jina Kurdistan xweşe,
Ku em yek bıbın.
Tekoşine, xort û keç
Destê hev bigrın.

De rabın, Kurdino rabın!
Herdu çevê mın.
De rabın, Kurdino rabın!
Herdu mılê mın.
De rabın, Kurdino rabın!
Bav û birê mın.
De rabın, Kurdino rabın!
Herdu çevê mın.

Azadi nêzik bûye,
Hat ber deriyê me.
Rê vekın, bıla were,
Lı ser serê mın.

De rabın... (Girêdan)

Rakın, pır rakın! wext e,
Alê bılındkın!
Zılmên zordaran rakın!
Azadi çêkın!

Şiyarım ro derenge,
Welat benda me.
Karker û gundi hun ın
Dest û mılê mın.

De rabın... (Girêdan)

DERÊ SORÊ

Derê sorê biçûke lê lê lê...
Derê sorê biçûke,
Dest bî hene neynûke,
Par qiz bû, isal bûke lê lê lê...
Par qiz bû, isal bûke
Berxê, sebra mala minê wey lê lê

Derê sorê biçûke lê lê lê...
Derê sorê mezîne,
Dest bî hene bazîne,
Par qiz bû, isal jîne lê lê lê...
Par qiz bû, isal jîne
Berxê, sebra mala minê wey lê lê

Min dit, waye l' paytexte lê lê lê...
Min dit, waye l' paytexte,
Îznê bî derdi rextê,
Temam bî soz û bexte lê lê lê...
Temam bî soz û bexte
Berxê, sebra mala minê wey lê lê

Allegretto

Dê - rî - no. dê - rî - no, dê - rî - no, di - lo,
Ha(j) vir bar - kir mal - ka Si - lo.

DÊRÎNO

Dêrîno, dêrîno, dêrîno, dilo.
Ha ji vir barkir malka Silo,
Malka k' awê miqabilo,
Mi bi ramûsa eşq û dilo.
Dêrîno dilo, virda, virda.
Çi bi serdika serê dilda.

Min ramûsa çîqa gulda,
H' efa malê me wê sûre,
Hê di binyêda gola k'ûre,
Têda t'ijî me'siyê hûre.
Qîzke rinde, keç'ke rinde,
Keç'ke rinde, bê qisûre.

DESTAR GERIYA (BERDESTARI)

Destar geriya li dora bajêre
Ser singê kê û kê madena zêre
Ser singê gewrê xurmîna zêro
Pismam sekinye nabî ji xelkê re.

DE HÛRIK HÛRIK

De hûrik hûrik, hûrik devîya,
Cemê Leylanê girtî herîya
Hero hewarê, hero gazîya
Pêşya hêwarê kî bû bezîya
Pêşya hewarê Xurşîd bezîya
Şûrî bi deste, eba li pîya.

DE BIHÊR, BIHÊR

De bihêr, bihêr dayikê
Te çî-j min e, xwayikê
Ezê te bidim nûşokê
Nûşoka min û kê ye
Nûşoka te û Xurşîd e.

Xurşîd didim ber avê
Lê bireşînim gulavê
Bîrakê mine mi navê.

DESTMALA MIN

Destmala min sor û zere,
Lawik hatiye min dixwaze.

Ka destmalê, herîme malê kuro gede,
Ka destmalê, herîme malê.

Destmala min sor-heşîne,
Lawik hatiye min dixapîne.

Ka destmalê, herîme malê kuro gede,
Ka destmalê, herîme malê.

Destmala min sor û reşe,
Lawik hatiye min direvine.

Ka destmalê, herîme malê kuro gede,
Ka destmalê, herîme malê.

DE WER LÊLÊ


De wer lê lê, de wer lê lê
Lê biçûke kofî kélê
Xwedê mêrê te nehêlê
Wek qeraşê li ber sêlê
Bîstkê rûnim li tehêlê
De wer lê lê, de wer lê lê.

De her deme, deme, deme
Mala barkir çûn Eceme
Ez xilxalê lingê te me
Ez bazinê destê te me
Ez gustîla tilya te me
Ez kembera li piştê te me
Ez guharê guhê te me
Ez xizêma pozê te me
Ez kilçivê çavê te me
Kuçikê mêrê te jî bimirî
Ez kiryarê bejna te me
De wer lê lê, de wer lê lê.



DIKOLIM

Dikolim, dikolim dayê, dikolim berojan,
Dikolim, dikolim dayê, dikolim berojan.
Dertinim, dertinim dayê, dertinim bişkocan,
Dertinim, dertinim dayê, dertinim bişkocan.
Ber qarê, ber qarê dayê, ber qarê xalojan,
Ber qarê, ber qarê dayê, ber qarê xalojan.
Dikolim, dikolim dayê, dikolim bewraran,
Dikolim, dikolim dayê, dikolim bewraran.
Dertinim, dertinim dayê, dertinim xilxalan,
Dertinim, dertinim dayê, dertinim xilxalan.
Ber qarê, ber qarê dayê, ber qarê qizê xalan,
Ber qarê, ber qarê dayê, ber qarê qizê xalan,
Dikolim, dikolim dayê, dikolim çiyar,
Dikolim, dikolim dayê, dikolim çiyar.
Dertinim, dertinim dayê, dertinim mecdiyan,
Dertinim, dertinim dayê, dertinim mecdiyan.
Ber qarê, ber qarê dayê, ber qarê qizê gundiyan,
Ber qarê, ber qarê dayê, ber qarê qizê gundiyan.



DILO İŞEV LI KU ME

Dilo işev li ku me,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Dilo işev li ku me,
Rezilo dilo, sor gulo.

Ser pîreka Pasinê,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Ser pîrêka Pasinê,
Rezilo dilo, sor gulo.

Deng tê dengê yasinê,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Deng tê dengê yasinê,
Rezilo dilo, sor gulo.

Dilo işev li ku me,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Dilo işev li ku me,
Rezilo dilo, sor gulo.

Ser pîreka Pîlûrê
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Ser pîreka Pîlûrê
Rezilo dilo, sor gulo.

Deng tê dengê bîlûre,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Deng tê dengê bîlûre,
Rezilo dilo, sor gulo.

Dilo işev li ku me,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Dilo işev li ku me,
Rezilo dilo, sor gulo.

Ser pîreka Temranê
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Ser pîreka Temranê,
Rezilo dilo, sor gulo.

Deng tê dengê tembûrê,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Deng tê dengê tembûrê,
Rezilo dilo, sor gulo.

DILO MENAL

Dilo menal xweş bhar e
Kulîlk dîkîn zarezar e
Dîbên rabîn temaşe kîn
Welatê me brindar e.

Dilo menal bhar şîn e
Ev dilê mîn kul-brîn e,
Hey lo tîştê felek pîrs ke,
Jî Kurda ra çî xain e.

Dilo menal xweş havîn e,
Kulîlk dîkîn qîrîqîrîn e,
Dîbên rabîn temaşe kîn,
Ev dînya we derewîn e.

DILBERÊ

Ax dilberê de tu zani
Kulilk vebûn çiya û bani
Bilbil pîrs kîr Feqi kani
Wêran ez im mala m' xerab
Hey dilberê ka menale
Feqyê Teyran êdi kal e
Nexweşe ku pîrr bê hal e

Tu him gul i him rihan i
Tu him gul i him derman i
Him hekim i him Loqman i
Ax dilberê tu menale
Feqyê Teyran êdi kal e
Nexweşe ku pîrr bê hal e.

DOMAM

Allegro



We-re do - ma - am,

gul so - si - nê t'e - ka ç'iyê ma - am,

Do.mam. do.mam. do.mam. do - ma - am,

Tu me-re-za ca - nê mi - nî, ya - rî do - mam.

He do ma - am,

do - ma - mê go - tê - ye - k'î hat bu - hu - rî?

Pe - ya - yo, lo, pe - ya - yo.

te ma la mi xi-rab.kir. O-ca-xa min kor - ki - ro.
 se - rê qî - za - pè do - ra se - rê te geŕ - ya - yo,
 De vêsvê qa-we-kî pey pe-ya k'et-ya-yo, Pe - ya-yo,
 De bê do-ma.mê go.tê bi-ra ne-se-ki-ne bê - o.
 De do - ma - am, do.mam,do.mam,do.mam, Do - mam,
 tu me - re - za ca - nê mi - nî, ya - rî do - mam.

DOMAM

Were domam, gul sosinê t'eka c'îyê mam,
 Domam, domam, domam, domam,
 Tu mereza canê minî, yarî domam.

De domam, domamê gotêye- k'î hat buhurî?
 Peyayo, lo peyayo, te mala mi xirabkir,
 Ocaxa min korkiro,
 De vêsvê qawekî pey peya k'etyayo,
 Peyayo, serê qîzapê dora serê te geryayo,
 De bê domamê gotê bira nesekine bêo.
 De domam, domam, domam, domam,
 Domam, tu mereza canê minî, yarî domam.

De domam, divê dêran, gul sosinê t'eka ç'îyê mam,
 De domam, domam, domam, domam,
 De domam teê ez kirime serê gazin, gîfî gotinê were domam,
 De domam, domam, domam, domam,
 Tu mereza canê minî, yarî domam.
 De domamê gotê, bira nesekine bêo.
 Herkê deyndare, ezê bidimê xercê bi salêo,
 Hergê leze, bira bê bixwe qawê bi şayêyo,
 Wezê jêra bik'şinim borê serê afirxanêo.

EBA-GEWRO

Ew kî li hewşê sekinî Eba-gewro!
Reşo li hewşê sekinî, Eba-gewro!
Eba, li pîka mekinî, Eba-gewro!
Welet pismamê minî Eba-gewro!

EMA MÎN ÊMIŞA MÎN

Hat karwanek vê Mûşê,
Êma mîn, êmişa mîn.
Dani lî rasta Erdîşê,
Çavê reş bexşîşa mîn

Eyşo, Fato ez helandim,
Êma mîn, êmişa mîn.
Kırime qulpa qayışê
Çavê reş bexşîşa mîn.

Hat karwanek vê dîngê,
Êma mîn, êmişa mîn.
Dani lî rasta Zırîngê,
Çavê reş bexşîşa mîn.

Eyşo, Fato ez helandim,
Êma mîn, êmişa mîn.
Kırime qulpa tîfîngê,
Êma mîn, êmişa mîn.

Hat karwanek vê darê,
Êma mîn, êmişa mîn.
Dani lî rasta bêderê,
Çavê reş bexşîşa mîn.

Eyşo, Fato ez helandim,
Êma mîn, êmişa mîn.
Kırime qulpa kemberê,
Çavê reş bexşîşa mîn.

E - man, e - man, e - man, e - man, e - man e - man

ko - çe - rê E - man, e - man ko - çe - rê

min buxu - la - ma kem, be - rê Te bi xu - la - ma

Kem, be - rê, Radi mû - sim, ger - den - ze - rê Radi - mû - sim ger -

- den - ze - rê, Piş - ta ma - la, bèn de - rê, E - man, e - man,

e - man, e - man e - man, e - man ko - çe - rê.

EMAN EMAN KOÇERE

Eman, eman, eman, eman,
 eman, eman, k'oçorê,
 Eman, eman, k'oçerê,
 Min bi xulama k'emberê,
 Te bi xulama k'emberê,
 Radimûsim gerdenzerê,
 Radimûsim gerdenzerê,
 Pişta mala, bênderê
 Eman, eman, eman, eman,
 eman, eman, k'oçorê,

Eman, eman, eman, eman,
 eman, eman, k'oçorê,
 Eman, eman, k'oçerê,
 Pişta mala me bi kewot,
 Derê xanya me bi kewot,
 Mêrkê min wextê here jor,

Mêrkê min wextê were jor,
 Qamçi jêre rebene,
 Eman, eman, eman, eman,
 eman, eman, k'oçorê,

Eman, eman, eman, eman,
 eman, eman, k'oçorê,
 Eman, eman, k'oçerê,
 Min dî li afirê gamêşa,
 Te dî li afirê gamêşa,
 Dinya min girtû êşe,
 Gava ç'e' vê min lê k'et,
 Şîşa dilê mi êşya,
 Eman, eman, eman, eman,
 eman, eman, k'oçorê,

EM KURDIN ŞÊRÊ ÇIYANE

Em kurdin, şêrê çiyane.
Da bijin serbest û jir.
Doza me doza welate,
Bistinîn bî qevdê şûr.

Kurdino rabîn, jî bo welatê xwe şer bîkîn!
Merdino rabîn, jî bo welatê xwe şer bîkîn!

Destê me şûr û tîfeng,
Şopa me xwin û mîrîn.
Dewlemendi, serbîlîndî,
Dîbê dil xeber.

Bî xwinxwarî,
Bî dijwarî,
Em naçîn welat.
Em naçîn welat.

Kesk û sor û zeri,
Sîpî û gewherî,
Nişana zaferî,

Ala ya rengî tu,
Bî nav û dengî tu
Nişana cengî tu.

Sîlavê lê bîkîn, sîlavê lê bîkîn,
Sîlavê lê bîkîn,
Ey xortê kurdan!
Ey keçê kurdan!

Hemû karxane û erd
Her tîşt malê xebatkaran.
Ger dînê ê xebatê be,
Ka çî heqê koledaran.
Xwinê ku cellat dirîjînin
Rojekî wan bîherîqîne,
Jî ser vê behra xwinê
Roja sor dê bîbîrîqîne.

Ev şêrê me yêpaşîne
Şêrê dijwar û giran,
Bî enternasyonalê
Rîzgar dibe insan.

ÊMOŞÊ

Hey lê lê lê lê lê lê lê Êmo
Xulem keçka bi dê-mo lê lê Êmo
Xilxalê lingê wê-mo lê lê Êmo
Bazinê destê wê-mo lê lê Êmo

Kembera pişta wê-mo lê lê Êmo
Guharê guhê wê-mo lê lê Êmo
Xizêma pozê wê-mo lê lê Êmo
Kilçivê çavê wê-mo lê lê Êmo
Kilê çavê keçkê we-mo lê lê Êmo
Heçî xwehkê wan pakin lê lê Êmo
Ez û wan destbirakin lê lê Êmo
Heçî xwehkê wan reşin lê lê Êmo
Ez û wan bi hev nexweşin lê lê Êmo

Kevoka xebxeb şîni lê lê Êmo
Xwel govendê dixîni lê lê Êmo
Mala kala xirab kir lê lê Êmo
Mala xorta dihedmîni lê lê Êmo

Pişta dêrê bi ce ye lê lê Êmo
Binya dêrê bi ceye lê lê Êmo
Tu kesik lê tune ye lêlê Êmo
Ji xeyrî keçka file ye lêlê Êmo
Dilê min di keçkê heye lêlê Êmo
Dilê wê di min tune ye lêlê Êmo

Lê Êmo lê Êmûşê lêlê Êmo
Kevoka deşta Mûşê lêlê Êmo
Keroşka nav karûşê lêlê Êmo
Çar gamêşa didoşê lêlê Êmo
Dew tune rûn difroşê lêlê Êmo.

Berçem, berçem diçûme lêlê Êmo
Benîştê xwe dicûme lêlê Êmo
Pêrgî gewra xwe dibûme lêlê Êmo
Gewr kenya ez şabûme lêlê Êmo.

EM JI RÊ DERNAKEVIN

Em ji rê dernakevin çendan bi bînî zûm û zor
Lewlê û çerxa cihanê, geh li jêrî geh li jor
Lê bidî, dora we ye ey koledar û zorkeran
Ev pikole em ji hawîrwe dikin, çavên kor
Nivê karker dar bi destin, ê dî herdem kêferat
Va nêzik bûye dema me, karê dinyâ tim bi dor
Win li Çîn û rojhilatê meyzekîn, xweş meyzekîn
Tev di vê rê di bazîn, wek pilingan qore qor
Her çîqa zorê bîkîn, win me tajon ber bi pêş
Pîr nezîke sewre rabî leşkerê Kurdî û sor

Cigerxwin

ENTERNASYONAL

Hışyarbın êdi jî xewê
Hışyarbın bîndestên dinê!
Diji zilmê wek wolqan in em;
Ev şerê jiyin û mîrîne.
Bîhelîşînin vê dezgehê kevn
Jiyinek nû dîxwazîn em!
Pozbîlînd êdi bîzanîbîn:
Nah şûnda her tîşt em in!

Ev şerê me'y paşîne
Şerê dijwar û giran,
Bî enternasyonalê
Rîzgar dibe insan.

Xwedê, paşa, mir, axa û sûltan
Ka me çer rîzgar dîkîn!
Ev tenê destê me ne
Dîkarîn me rîzgar bîkîn.

Bîlîndke ala azadiyê
Bîde ber bê zîlm û zor!
Harke agirê şoreşgerî,
Dem e, lêxe hesinê sor!

Ev şerê mey paşîne
Şerê dijwar û giran,
Bî enternasyonalê
Rîzgar dibe insan.



EREBO

Erebo dakev, dakev, erebê mîn,
Erebo dakev, dakev, sing çelengê mîn.

Ereb lî Beriyê pîr in, erebê mîn,
Ereb lî Beriyê pîr in, sing çelengê mîn.

Eşîka kon bî bakev, erebê mîn,
Eşîka kon bî bakev, sing çelengê mîn.

Kehêlê sor xur-xur in, erebê mîn,
Kehêlê sor xur-xur in, sing çelengê mîn.

Şev sare were rakev, erebê mîn,
Şev sare were rakev, sing çelengê mîn.

Pîsmaman dotmam bîrîn, erebê mîn,
Pîsmaman dotmam bîrîn, sing çelengê mîn.

Ereb sabûnê tine, erebê mîn,
Ereb sabûnê tine, sing çelengê mîn.

Ereb lî Beriyê giştî, erebê mîn
Ereb lî Beriyê giştî, sing çelengê mîn.

Mal bî mal digerine, erebê mîn,
Mal bî mal digerine, sing çelengê mîn.

Kehêlê sor bî nivîştî, erebê mîn,
Kehêlê sor bî nivîştî, sing çelengê mîn.

Mala yarê nabine, erebê mîn,
Mala yarê nabine, sing çelengê mîn.

Pîsmaman dotmam niştî, erebê mîn,
Pîsmaman dotmam niştî, sing çelengê mîn.

ESMER Û GEWRA

Gewran digotin esmeran:

Em ji we çêtirin,
Em bejin bilndin
û guhar ji almas û durin,
Em şevên tarî zivistanê dibin,
Ebayên xortan de diveşirin.

Esmeran bakirin gewran û gotin:

Em we nakin gelfi xwehan em we nakin!
Emê di taxa jorî û jêrî ve,
Biçin û benîyên xwe li bakin,
Emê mirîyên heftê sale ji mar û cebana,
Ji gornistana bi awira rakin.

Gewra gote esmera, belane
Emê gewrin em şêrinên ber dilane,
Em bi herkesî razî nabin,
Lê babetê mir û yêx û melane.

Esmera gotin: Ji esmera em esmerên tarîne,
Bejna me bilinde û gerdena me mirarîne,
Em ne babetê şêx û melane,
Lê em babetê xundekarîr rûsipîne.

EVÎN TÎNIM

Kur: Keçê dinê lê lê zêran tinim, way way.

Keç: Kuro dino lo lo te nastinim, way way.

Kur: Keçê dinê lê lê bazin tinim, way way.

Keç: Kuro dino lo lo te nastinim, way way.

Kur: Keçê dinê lê lê fıstan tinim, way way.

Keç: Kuro dino lo lo te nastinim, way way.

Kur: Keçê dinê lê lê guhar tinim, way way.

Keç: Kuro dino lo lo te nastinim, way way.

Kur: Keçê dinê lê lê qondere tinim, way way.

Keç: Kuro dino lo lo te nastinim, way way.

Kur: Keçê dinê lê lê EVÎN tinim, way way.

Keç: Kuro dino lo lo te distinim, way way.

EY KARKER, BIBIN YEK

Karkerê kurd tev lı karın
Dest bı dar û tevr û bêr
Wek xebatkarê cihan ew
Tev dı cengê mêr û şêr
Ev cihan qada me ye
Ev cihan qada me ye
Her divê bibne yek
Her divê bibne yek
Weke bira bin wek bira

Ta bı kengî kole bin em
PHî dı bend û mıl dı nîr
Tım dı benda koleraran
Wer bı mînin destegîr
Ev dema azadî ye
Ev dema azadî ye
Ger bı kuştın wer bı hıştın
Yan xweşî û yan reşî
Her divê em bibne yek
Her divê em bibne yek
Weke bira bin wek bira

EY NEWROZ

Ey newroz, ey newroz
Biji cejna azadi!
Bı xêr û gellek piroz
Kurd te bı ruhê xwe nadi.

Te pır serê me hılda
Me ji bin destan derani.

Newroz tu bûka salê
Cejna Kurd û Kurdistan.
Bıla dijmin binali
Tev rabın bıkın dilan.

Ala rengin hıldın jor
Her biji xortê Kurdan!

Ey newroz... (Girêdan)

Tev mirovin em bı carek
Gewr û sor û reş çıye
Sed tıf û sed tıf bıbarın
Zor û diktatorî ye
Ev setemkarî çıye?
Ev setemkarî çıye?
Ger bı kuştın wer bı hıştın
Yan xweşî û yan reşî
Her divê em bibne yek
Her divê em bibne yek
Weke bira bin wek bira

Cigerxwin

Te pır serê me hılda
Me ji bin destan derani.

Kawa yê ku ji kurdan
Wi derba mezın dani.
Şıkand serê namerdan
Me j' bin destan derani.

Kurd naminin cem kesi
Ka em destê te da ne.

Ey newroz... (Girêdan)

EY REQİB

Ey reqib her maye qewmê Kurd zıman
Naşikê û danayê topê zeman.

Keş nebê Kurd dımırın
Kurd jin dıbın.
Jin dıbın, qet nakavê ala Kurdan.

Em xortê Medya û Keyxisrevın.
Din iman û ayınman, her nıştımın
Din iman û ayınman, Kurd û Kurdıstan.

Kes nebê Kurd dımırın
Kurd jin dıbın.
Jin dıbın, qet nakavê ala Kurdan.

Em xortên rengê sor û şoreşın
Seyr bike xwina tiya me da rijand.

Kes nebê Kurd dımırın
Kurd jin dıbın.
Jin dıbın, qet nakavê ala Kurdan.

Lawe Kurd rabûye ser pê, wek şêran.
Ta bixwin, nexşın bike taji jıyan!

Kes nebê Kurd dımırın
Kurd jin dıbın.
Jin dıbın, qet nakavê ala Kurdan.

Xortên nuh tev hazır û amade ne,
Can fida ne, can fida, her can fida!

EYŞANA MİRZA BEGÊ

Eyşan! Eyşan!
Xinus xweşe Bîngol di berde,
Bere Şuşan bişewitî Turkman bi serde.
Te dilê min evdalê xwedê kiriyê mîna
behra Wanê, cî û meskenê kul û derda.
De hay, de hay! Eyşan hayê...
Wer Eyşanê!

Eyşan! Eysan!
Naçim Mûşê bi dikane,
Sing û berê Eyşana Mîrza begê
mîna zivê Sewadê, bi zêr kildane.
Çawa sala par vî çaxî Eyşana Mîrza begê
Sala vê salê, ketiye bin darê Ezîzxane.
De hay, de hay! de Hayê!
Ver Eyşanê!

Eyşan! Eyşan!
Bihare lezke rabe ser xwe!
Tê navê Xwedê û Pêxembera dihebîne,
Kilê subhanî û neynikê deyne ber xwe,
Min sûnd xwariye heta bejna bilind,
çavên belek li darê dinyayê saxin,
Ezê navê rewacê nabin ser xwe.
De hay, de hay! de hayê!
Lê wer Eyşanê!

Ezê dikim nakim têr nabim,
Ji galgalê, ji gotinê, ji awirdanê,
Sîng û berê Eyşana Mîrza begê,
mîna cotek sêvê Xelatê li ser dikanê,
Lê li sûka Wanê.
De hay, de hay! de hayê!
Lê wer Eyşanê!

EYŞOKÊ

Eyşokê ha Eyşokê
Eyşoka romani.
Şîrnê, şemamokê,
Destmala xortani.

Eyşokê çîma - çîma,
Eyşoka romani.
Kulilika nav genîman,
Destmala xortani.

Fîrcana dest hakîman,
Eyşoka romani.
Xelq zewici, ez û tu man,
Zalimê tu dîzani.

Eyşokê ha Eyşokê
Eyşoka romani.
Kulilka nav garisan,
Destmala xortani.

Fincana dest mebûsan,
Eyşoka romani.
Xelq zewici eman usa,
Zalimê tu dizani.

Moderato



Ez a - va - go - la nay - nim, Ha Gu - lê ha Gu - lê
ha Gu - la - min Ez a - va go - la nay - nim Ha Gu - lê ha Gu - le
ha Gu - lê min, Şen - gê şû - xê zer - ya - min .

EZ AVA GOLA NAYNIM

Ez ava gola naynim,
Ha Gulê, ha Gulê , ha Gula min,
Ez ava gola naynim,
Ha Gulê, ha Gulê, ha Gula min,
Şengê şûxê, zerya min

Gulê, şêrinê, canê,
Ha Gulê, ha Gulê , ha Gula min,
Ez te li ber beh'ra Wanê,
Ha Gulê, ha Gulê, ha Gula min,
Şengê şûxê, zerya min

De werin gula biçinin,
Ha Gulê, ha Gulê , ha Gula min,
De werin gula biçinin,
Ha Gulê, ha Gulê, ha Gula min,
Şengê şûxê, zerya min

Dikin k'êf û seyranê
Ha Gulê, ha Gulê , ha Gula min,
Dikin k'êf û seyranê
Ha Gulê, ha Gulê, ha Gula min,
Şengê şukê, zerya min

Gulê me sor û şînin,
Ha Gulê, ha Gulê , ha Gula min,
Serê gula biçîpînin
Ha Gulê, ha Gulê, ha Gula min,
Şengê şûxê, zerya min





EZ BERFIM

Ez berfım, berfım, berfım
Lê lê nar, lê lê nar
Ez berfım, berfım, berfım
Lê lê nar, tu delali.

Ez berfa çiyaki sor ım,
Lê lê nar, lê lê nar
Hemayla dor bı mor ım,
Lê lê nar, tu delali.

Ez berfa çiyaki sıpi me,
Lê lê nar, lê lê nar
Hemayla dor bendi me,
Lê lê nar, tu delali.

Dosta lawikê gundi me,
Lê lê nar, lê lê nar
Dosta lawikê gundi me,
Lê lê nar, tu delali.




Em kurdın, kurdın, kurdın,
Lê lê nar, lê lê nar
Em kurdın, kurdın, kurdın,
Lê lê nar, tu delali.

Barê Kurdistan hıldın,
Lê lê nar, lê lê nar
Barê Kurdistan hıldın,
Lê lê nar, tu delali.

EZ DÎ HERÎM

Ez di herim naw baxçe û gulan
Da bibinim delale dılan
Tew da runen weke du gulan
Tew da bejin derdan û gulan
Ez rabun çum hesiri çawan
Dı qezina xwe weke gul awan
Welate min deste xeriban (dijmınan)
Jı bo mı buye xe kırıye weran

Gule tim rabun axu birine
Cane dile min agir û dimine
Dalale min tene bizane
Tuji derdan gulan te dine



EZ KEVOTKİM

Ke votkim, lê, lê, lê, ke votka nêrim, lê,
Lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê,
Ez ke votkim, way, way,
Ser kê bana, bin bana ez diçêrim, way, way,
Deşt û zozan, lê, lê, lê, tew danîme, way, way,
Ez aşîqê lê, lê, lê, maldinyaê way, way,
Ez aşîqê lê, lê, lê, maldinyaê way, way,

Kevotkim, lê, lê, lê, kevolta şînim, lê,
Lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê,
Ez kevoltakim, way ,way,
Serkê bana, bin bana ez diç'êrim, way, way,
Deşt û zozan, lê, lê, lê, tew danîme, way, way,
Ez aşiqê lê, lê, lê, ç'êvê şînim way, way,
Ez aşiqê lê, lê, lê, ç'êvê şînim way, way,

Kevotkim, lê, lê, lê, kevolta spîme, lê,
Lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê,
Ez kevoltakim, way ,way,
Serkê bana, bin bana ez diç'êrim, way, way,
Deşt û zozan, lê, lê, lê, tew danîme, way, way,
Ez aşiqê lê, lê, lê, keç'ikê bi xastîme, way, way,
Ez aşiqê lê, lê, lê, keç'ikê bi xastîme, way,

Kevotkim, lê, lê, lê, kevolta peşim, lê,
Lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê,
Ez kevoltakim, way ,way,
Serkê bana, bin bana ez diç'êrim, way, way,
Deşt û zozan, lê, lê, lê, tew danîme, way, way,
Ez aşiqê lê, lê, lê, ç'êvê reşim, way, way,
Ez aşiqê lê, lê, lê, ç'êvê reşim, way,

EZ KEVOKİM LÊ LÊ (HELBESTE Û BERDILAN)

Ez kevokim lê, lê
Kevoka şînim way, way
Li ser bana lê, lê
Ez dixwînim way, way
Ji xelkê weye lê, lê
Har û dînim way, way
Ez aşiqê lê, lê
Çavên şînim way, way.

Ez kevokim lê, lê
Kevoka sipîme way, way
Li ser bana lê, lê
Xweş danîme way , way
Ji xelkê weye lê, lê
Ez xwîni me way, way
Ez aşiqê lê, lê
Jinka bî me way , way.

Ez kevokim lê, lê
Kevoka beşim way, way
Li ser bana lê, lê
Hûr dimeşim way, way
Ji xelkê weye lê, lê
Ez nexweşim way, way
Ez aşiqê lê, lê
Çavên reşim way, way.

Ez kevokim lê, lê
Kevoka nerim way, way
Li ser bana lê, lê
Xweş diç'êrim way , way
Ji xelkê weye lê, lê
Ez newêrim way, way
Ez aşiqê lê, lê
Jinka mêrim way, way.

Allegro



EZ NE DÎNIM

Ez ne dînim, ne dirustim. Ser xanîngê we p'al dame.
Hay lê, lê hay lê, lê, hay lê, lê dînê. Hay lê, lê hay lê, lê, hay lê, lê dînê.

Ez ne dînim, ne hahame Ç'e'vbelek ç'e' va wez t' evdame,
Hay lê, lê hay lê, lê, hay lê, lê dînê. Hay lê, lê hay lê, lê, hay lê, lê dînê.

Ser xanîngê we diwastim,
Hay lê, lê hay lê, lê, hay lê, lê dînê.

Allegretto



EZ TEYRIM

Ez teyrim, teyrê nalim, nar, nar, narê can,
Ez teyrim, teyrê nalim, ez bê m nerê, tu bê can.
Xastya lawkê delalim, nar, nar, narê can,
Xastya lawkê delalim, ez bê m narê, tu bê can.
Ber bi zozan dik'alim, nar, nar, narê can,
Ber bi zozan dik'alim, ez bê m narê, tu bê can
Ez teyrim, teyrê reşim nar, nar, narê can,
Ez teyrim, teyrê reşim, ez bê m narê, tu bê can.
Xastya lawkê k'eleşim, nar, nar, narê can,
Xastya lawkê k'eleşim, ez bê m narê, tu bê can.
Ber bi zozan dimeşim, nar, nar, narê can,
Ber bi zozan dimeşim, ez bê m narê, tu bê can
Ez teyrim, teyrê sorim, nar, nar, narê can,
Ez teyrim, teyrê sorim, ez bê m nerê, tu bê can.
Xastya lawkê pisporim, nar, nar, narê can,
Xastya lawkê pisporim, ez bê m narê, tu bê can.

EZ XELEFİM

Ez xelefim, xelefim
Heware mîro heware,

Ez xelefim, xelefim
Ezdîñşêr mîrê Botane
Xwedîyê şûrê bi sedefim
Heware mîro heware,

Xwedyê şûrê sedefim
Ezdîñşêr mîrê Botane
Li nav eşîran bi gefim
Heware mîro heware,
Li nav eşîran bi gefim
Ezdîñşêr mîrê Botane

Ez xelefê kinikim
Heware mîro heware,
Ez xelefê kinikim
Ezdîñşêr mîrê Botane
Xwedyê şûrê bi şirikim
Heware mîro heware,

Xwedyê şûrê bi şirikim
Ezdîñşêr begê Botane
Li nav eşîran bi rikim
Heware mîro heware,
Li nav eşîran bi rikim
Ezdîñşêr mîrê Botane

Ez xelefê şûvî me
Heware mîro heware,
Ez xelefê şûvî me
Ezdîñşêr mîrê Botane
Xwedyê şûrê Misrî me
Heware mîro heware,
Xwedyê şûrê Misrî me
Ezdîñşêr mîrê Botane
Li nav eşîran bengî me
Heware mîro heware,
Li nav eşîran bengî me
Ezdîñşêr begê Botane

EZ XORTE KURDIM

Ez xortê kurdîm, pîr bî nav û deng.
Wa mîn hilgîrtî bumba û tîfeng.
Ezê herîm şer, ezê herîm ceng,
Ger ez nezivîrim, dayê tu negri.
 Jî vir heta Çin, nav û dengê mîn.
 Dinya hemû dit, şan û rengê mîn.
 Tu temaşe ke, şer û cengê mîn.
 Ger ez bê m kuştî, dayê tu negri.
Te mîn xwedi kîr; bî şîr mijandi.
Hîstîrê çavan bo mîn rijandi.
Dîlê xwe te pîr bo mîn pijandi.
Mîn helal bîke, dayê tu negri.
 Ger ez vege rim, dê tîştêk xweş be.
 Dîlê mîn û te, dê tevda geş be.
 Ku ez nehatî, her meh xweş be;
 Kurd û Kurdistan, dayê tu negri.

FEQÎ Û EYŞANÊ

Eyşanê digo: Feqîyo qurba!
Bejna zirave tak rihane pel dije,
Li devê deryê, mala bavê min keçikê
şax tavêjje,
Ezê esl û fêslê te nasnakim,
Çika esl û fêslê xwe-j min ra bêje.
Lowiko lo!..
Feqîyo lo!..
Bext ne waye kuro

Feqî digo: Eyşanê!
Bejna min zirave takê vê rihanê,
Bere şîn nekira li davê deryê
mala bavê te keçikê li ser dikanê,
Wele heke tê li esl û fêslê min dipirsi?
Ezê mihacirê deşta Wanê beriya Qaqizmanê.
Eyşanê lê!..
Nezanê lê!..
Te-z helandim keçê.

Eyşanê digo: Feqîyo qurba!
Bejna min zirave takê vê rihanê,
Bere şîn nekira li davê deryê
mala bavê te keçikê li ber dikanê,
Ezê keça Hecî Elî me, navî min Têlîeyşanê.
De Feqîyo lo!..
De lawiko lo!..
Bext nemaye kuro.

Feqî digo: Eyşanê dînê!
Ezê ji teyra teyrê bilindci me,
Li devê deryê mala bavê te danîme
îsal heft sale bi sê jina zewicîme.
Eyşanê lê!..
Cîranê lê!..
Te-z helandim keçê.

Eyşanê digo: Feqîyo qurba!
Dilê min sêla hesinî,
Ji êvara xwedê de agirê qurba daye binê,
Çika ji min re bêje: tu ezebî ya bi jînî?
Lawiko lo!..
Feqîyo lo!..
Bext ne waye kuro.

Eyşanê dîgo: Feqîyo qurba!
Bejna min zirave ji darê biyê
Bere şîn nekira li devê deryê
mala bavê min keçikê li ber kaniyê,
Kuro, min qebûle derdê vê hêwiyê.
De Feqîyo lo !..
De lawiko lo !..
Bext ne waye kuro.

Feqî dîgo: Eyşanê dînê!
Wele nabî, bile nabî,
Şûşa dilê min şikestîye cebar nabî,
Min nanê mala bavê te xwariye,
Reva keçê Eşîra ji min re nabî
Eyşanê lê! ..
Nezanê lê !..
Te-z helandim keçê.

Eyşanê dîgo: Feqîyo qurba!
Devî deryê mala bavê min bi rê ye,
Feqîyê min rebenê bi şev û bi ro
pêde diçî, têye,
Kuro, de rabe destê-m bigre emê
hev û dinê birevînin,
Ma dê û bavê min çi jêye.
Lawiko lo!..
De Feqîyo lo!..
Bext ne waye lo. .

Feqî dîgo: Eyşanê dînê!
Bejna min zirave takê vê benavê
Bere şîn nekira li davê deryê
mala bavê te keçikê li ber avê,
Keçê bela xwe ji min vekê !
Wele tu dîya min bi tu xuha min bî,
min tu navê.
Eyşanê lê!..
De nazanê lê!..
Te-z helandim keçê.

Eyşanê dîgo: Feqîyo qurba!
Devê deryê mala bavê min bi ce ye,
Ezê bala xwe didimê serê vî cehî bûye şe ye,
De rabe tûrik û kitêbê xwe hilgire here
Ji gundê me ye.
Mihaciro lo ! ..
Feqîyo lo !..
Bext ne waye kuro.

FERHO

Ferho bavê Uzêre
Axa bavê Uzêre
Talan anî ji berjêre
Talan anî ji berjêre

Ferho tu bavê Emînê
Axa tu bavê Emînê
Talan anî ji Mardînê

Ferho ez birîndarim
Axa ez birîndarim
Ji derdê gewran dinalim.

GELO EW KÎ YE?

Gelo ew kî ye, ji wê da têya,
Çi bejnek zirav, wek rihanê ye.
Gelo ew kî ye, ji çi eslê ye,
Çavi kıldane, keça kurdane.
Navê wê Xan e, gula bexçane,
Eslê bavê xwe keça kurdana.

Ew çiqas xweşe, çavê wê reşe,
Bejnay narine, bî xwe şirine.
Xwezi mîn bîdya, têr jê hezbîkra,
Wê ji dilê mîn eceb xweş bîkra.
Mîn xew da diye, dibê mî hori ye,
Navi danine, dibên Têli ye.

Andante

Gel.yê Şen-galê p'a.lê. gel.yê Way-way.kê p'a.lê,
E'î beg sva.rê Xe-zalê. fer-ma-ne ser Şen-galê.
E-ma-ne,xweş e-ma-ne. E'î beg mî-rê şê-xa-ne,
Mûs.lê da-ye dî-ya-ne. boy xa-tî-rê êz-dya-ne.

GELYÊ ŞENGALÊ

Gelyê Şengalê p'alê, gelyê Waywaykê p'alê
E'le beğ s(i) yarê Xezalê, fermane ser Şengalê.
Emane, xweş emane. E'li beg mîrê şêxane.
Mûs (i) lê daye dîyane, boy xatirê êzdyane.
Gelyê Şengalê tenge, gelyê Waywaykê tenge,
Şêxane daye renga, êzdyane maye renga.
Emane, xweş emane, E'li beg mîrê şêxane.
Mûs (i) lê daye dîyane, boy xatirê êzdyane.
Gelyê Şengalê k'ûre, gelyê Waywaykê k'ûre,
Şêxane fûre-fûre, êzdyane nema destûre.
Emane, xweş emane, E'li beg mîrê şêxane.
Mûs (i) lê daye dîyane, boy xatirê êzdyane.



Ge ni mē ça la ma zi ge nım ge nım Gê lan
qo nk zeri yê mıl lan

GENİM

Genimê çala mazi,
Genim, genim, Gêlan,
Genimê çala mazi,
Qorik zeri yê mıllan.

Mın çini bı çep lê tazi,
Genim, Genim, Gêlan,
Mın çini bı çep lê tazi,
Qorik zeri yê mıllan.

Avranî xal û xwarzi,
Genim, genim, Gêlan,
Avranî xal û xwarzi,
Qorik zeri yê mıllan.

Genimê çala çûkê,
Genim, genim, Gêlan,
Genimê çala çûkê,
Qorik zeri yê mıllan.

Mın çini das û nê nûkê,
Genim, genim, Gêlan,
Mın çini das û nê nûkê,
Qorik zeri yê mıllan.

Avranê zava û bûkê,
Genim, genim, Gêlan,
Avranê zava û bûkê,
Qorik zeri yê mıllan.

Genimê pışta dêrê,
Genim, genim, Gêlan,
Genimê pışta dêrê
Qorik zeri yê mıllan.

Mın çini das û kêrê,
Genim, genim, Gêlan,
Mın çini das û kêrê
Qorik zeri yê mıllan.

Avranê sala xêrê,
Genim, genim, Gêlan,
Avranê sala xêrê,
Qorik zeri yê mıllan.

GEWRÊ

Lêlê Gewrê, kubarê !
Navê kanîka gundê me Bîrîna,
Xwedê hebî jê avê bikişîne,
Bi gumguma, bi misîna,
Kûzî girane, avrazî bilinde,
Milê zerî-kubara min têşîne.
De hay Gewrê!
De hay Gewrê!
Tu bermalya min bî lê!

Lêlê Gewrê, kubarê !
Sêrtê sed carî bi min Sêrtê,
Xelka mine têlî, serê sibehê
bi tena kirasê melesî ji avê tê,
Ezê bala xwe didimê çîqa kirasê melesî
li bejnê tê.
Ca ramîsanekê ji dêmê gulî,
Çavê reşbelek li min keremke,
Wê çaxê mirina malxerab di bîra kê tê.
De hay Gewrê!
De hay Gewrê!
Tu bermalya min bî lê!

Lêlê Gewrê, kubarê !
Ezê navê te nasnakim gazî dikim:
Filan û bêvan!...
Sîng û berê xelka mine têlî,
Mînane bexçekê gulan û sévan,
Dê ji xêra mala xwedê re,
Şevêkê ji şevê çile-kanûnê zivistanê,
Ezê di ber sîng û berê xelka têlî de
bibûma mêvan.
De hay Gewrê!
De hay Gewrê!
Tu bermalya min bî lê!

Lêlê Gewrê, kubarê!
Ev payîze çaxê maşan û debrê,
De tu rabe, emê du qam limêja sibehê bikin,
Berê xwe bidin paşayê kerem û sebrê,
Belkî nehêlî hesreta çavê reşbelek,
Bi min evdalê-xwedê ra here qebrê.
De hay Gewrê!
De hay Gewrê!
Tu bermalya min bî lê.

Ha gı ran gı ran te ze gı ran
 can gı ran gı ran te ze gı ran
 gu lû re ha na gu lû re ha na
 gu lû re ha na nav ça dı ran

GIRAN - GIRAN

Ha gıran, gıran, teze gıran,
 Can gıran, gıran, teze gıran,
 Gul û rehana, gul û rehana,
 Gul û rehana nav çadırın.

Ha gıran, gıran, tê ji bêriyê,
 Mêze şar daye ser xêliyê,
 Elb û eşir, elb û eşir,
 Elb û eşir, daye siye.

Ha gıran, gıran, tê ji mıtmitan,
 Şar û kıtan tev xelitan,
 Cigerê lawıkan, cigerê lawıkan,
 Cigerê lawıkan te bı peritan.

Moderato

Gi - re sî - rê bi sî - rê lê - lib, lê lib Mey - ro.
 gir - xo - pa - nê bi sî - re tu li - bi ca - ne Mey - ro.

GIRÊ SÎRE BI SÎRE

Girê sîrê bî sîrê
 Lê lib, lê lib Meyro,
 Gir xopanê bi sîrê
 Tu li bi canê Meyro.

Xasiyê Meyro wezîre
 Lê lib, lê lib Meyro,
 Xasiyê Meyro wezîre
 Tu li bi canê Meyro.

Dijvare leme-leme,
 Lê lib, lê lib Meyro,
 Dijvare leme-leme
 Tu li bi canê Meyro.

Dijvare wîle-wîle
 Lê lib, lê lib Meyro,
 Dijvare wîle-wîle
 Tu li bi canê Meyro

Girê sîrê bî k'eleme,
 Lê lib, lê lib Meyro,
 Gir xopanê k'eleme,
 Tu li bi canê Meyro.

GIRTİKÊ HEBSA

Wele nadim, bile nadim
Girtikê hebsa bernadim
Ezê bînim, ezê bînim
Şivan axa ezê bînim
Girtikê xwe ji te bistînim.

Wele nadim, bile nadim
Girtikê hebsa bernadim
Ezê bînim, ezê bînim
Ezê Hemo axa bi xwe re bînim
Girtikê xwe ji te bistînim.

Wele nadim, bile nadim
Girtikê hebsa bernadim
Ezê bînim, ezê bînim
Şemû axa bi xwe re bînim
Koma eşirê bi biberxînim
Girtikê xwe ji te bistînim.

Allegro

Go - vend geř - ya ba - nê k'ur - sî. Wex - ta
bê. lo, lo, wex - ta bê, De' - wat geř - ya ba - nê
k'ur - sî. Sûs - li - xa - nim de bi - ra bê.

GOVEND GERYA (BANÊ K'URSI)


Govend gerya banê k'ursî,
Wexta bê, lo, lo, wexta bê,
De' wat gerya banê k'ursî,
Sûslîxanim de bira bê

Te ç'e' vreşê ser bi nivsî,
Wexta bê, lo, lo, wexta bê,
Te ç'e' vreşê ser bi nivsî,
Sûslîxanim de bira bê


Dil k'etye qîzka muxsî
Wexta bê, lo, lo, wexta bê,
Dil k'etye qîzka muxsî
Sûslîxanim de bira bê

Sergovendiyêda wê reqisî,
Wexta bê, lo, lo, wexta bê,
Sergovendiyêda wê reqisî,
Sûslîxanim de bira bê

Allegro



Wel-le go-vend fa-na-be, Bil-le go-vëndîa-na-be,



Xwe-li mê-rê xi-rab be, Râ-za qe hiş-yar-na be,



Xwe-li mê-rê xi-rab be, Râ-za qe hiş-yar-na be,



Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,



Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo

GOVEND RANABE

Velle, govend ranabo,
Bille, govend ranabe,
Xwelî mêrê xirab be,
Raza qe h'işyar nabe,
Xwelî mêrê xirab be,
Raza qe h'işyar nabe,
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo.
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo.
Nîna, Nîna, Nînaê
Nîna li gundê me, naê
Çi bikim malê dinyaê,
Bê te sobra min naê,
Xwelî mêrê xirab be,
Raza qe h'işyar nabe,
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo.
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo.

Ha di cîda, di cîda,
Mala apê H'ecîda,
Ramûsanok bide min,
Di quncikê te'rîda.
Welle, govend ranabe,
Bille, govend ranebe,
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo.
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo.
Awa hatû, awa çu,
Sîar hatû, peya çû,
C'e'vê min bi ç'e'vê reş k'et;
H'iş û aqil pêra çû,
Welle, govend ranabe,
Bille, govend ranebe,
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo.
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo.

Berç'em, berç'em diçûme,
 Benûştê xwe dicûma,
 Liqei dostê bûme,
 Dost k'eniya, pê şabûme.
 Welle, govend ranabe,
 Bille, govend ranabe,
 Lo, lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo.
 Lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo.


Mi dî li gir fitilî,
 E'ynik danî xemilî,
 Xwezil gewra xwe bidîta,
 Li ser k'ewna e'wfiye.
 Welle, govend ranabe,
 Bille, govend ranabe,
 Lo, lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo.
 Lo, lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo. lo.



GUL

Ha Guli, ha Guli, ha Gula yeman,
 Can Guli, can Guli, çiçega çeman.
 Gul xeyizi, Gul xeyizi.
 Gul xeyizi reng lê nema.
 Ha Gula Botan, can Gula Botan,
 Ha gula Botan, can Gula Botan.

Te suret sorê, te suret sorê,
 Te suret sorê, da ber gezan.
 Ser hev ketin, ber hev ketin
 Ser hev ketin, lawikê metan.



GULÊ GUL BEYAZÊ

Jorda, jorda, jorda, lo,
 Mala gul Beyazê.

P'îda, p'îda, p'îda, lo,
 Mala gul Beyazê.

Nava gulê sorda, lo,
 Mala gul Beyazê.

Nava gulê spîda, lo,
 Mala gul Beyazê.

Radimûsim hingorda, lo,
 Mala gul Beyazê.

Radimûsim hîvîda, lo,
 Mala gul Beyazê.

GULÊ HEY NARÊ

Gulê hey narê, bî narê, narê,
Dinê hey narê, bî narê, narê.
Gulê mîn çavê belek xwarê,
Dinê mîn çavê belek xwarê.

Gulê, Gultapo ciki dûze,
Dinê, Gultapo ciki dûze.
Gulê, şîr meydan bûya bûze.
Dinê, şîr meydan bûya bûze.



Gulê sêva sor li gulyê darê,
Dinê sêva sor li gulyê darê,

Gulê şev doste, bî ro baldûze,
Dinê şev doste, bî ro baldûze,

Gulê ço davêm, were xwarê,
Dinê ço davêm, were xwarê,
Gulê tu qismeta vê carê,
Dinê tu qismeta vê carê.

Gulê hey narê, bî narê, narê,
Dinê hey narê, bî narê, narê.
Gulê mîn çavê belek xwarê,
Dinê mîn çavê belek xwarê.

Allegro moderato



GULÊ HOYNAR

Gulê hoynar, hoynar, hoynarê,
Gulê hoynar, hoynar, hoynarê.

Gulê şamqutni bejna xwe ne kir,
Gulê şeweke tûncik şe kir.

Gulê ava Şamê şîrîne,
Gulê belgê dara hêşîne.

Gulê ya min bû xwedê ne kir,
Gulê ya min bû xwedê ne kir,

Gulê memkê qîza cindîne,
Gulê memkê qîza cindîne,

Gulê şivana hêre, hêre,
Gulê hoynar, hoynar, hoynarê.

GULÊ HOY NAR

Gulê hoy nar, hoy nar, hoy narê
Gulê hoy nar, hoy nar, hoy narê.

Gulê ya min bû, xwedê nekîr,
Gulê ya min bû, xwedê nekîr.

Gulê hoy nar, hoy nar, hoy narê
Gulê min çavên belek xwarê.

Gulê şivanan hêre-hêre,
Gulê şivanan hêre-hêre.

Gulê ava Şamê şirine,
Gulê pelkê darê heşine.

Gulê hoy nar, hoy nar, hoy narê
Canê hoy nar, hoy nar, hoy narê.

Gulê memikê keçan cîndine,
Gulê memikê qîzan cîndine.

Gulê hoy nar, hoy nar, hoy narê
Canê hoy nar, hoy nar, hoy narê.

Gulê şamqutnî li bejna xwe kir,
Gulê şe ani, tûncik şe kir.

Gulê min çavên belek xwarê,
Canê min çavên belek xwarê.

GULÊ HEY NARÊ

Gulê hey narê, narê, narê Gulê
Gulê hey narê, narê, narê delal.

Gulê min çavê belek xwarê Gulê
Gulê min çavê belek xwarê delal
Gulê ava kwîzê kevnarê Gulê
Gulê ava kwîzê kevnarê delal.

Gulê ava Şamê şerbete Gulê
Gulê ava Şamê şerbete delal
Gulê ramîsanê keçkokê Gulê
Li mala bavê adete delal.

Gulê mid pacê re meyzekîr Gulê
Gulê ted pacê re meyzekîr delal
Gulê şamqutnî li bejna xwe kir Gulê
Gulê şamqutnî li bejna xwe kir delal.
Gulê a min bû xwedê nekîr Gulê
Gulê a min bû xwedê nekîr delal

Gulê mid pacê re nehêrî Gulê
Gulê ted pacê re nehêrî delal
Şamqutnî li bejnê birî Gulê
Şamqutnî li bejnê birî Gulê
Gulê a min bû xwedê birî Gulê
Gulê a min bû xwedê birî delal.

Allegro

Gul - gu - lî, ha bi gul - gu - lî, gul - gu - lî,

K'esk û sor - da xe - mi - lî, gul - gu - lî,

Din - ya kin û ke - mi - lî, gul - gu - lî,

Gul - gu - lî, ha bi gul - gu - lî, gul - gu - lî.

GULGULÎ, HA BI GULGULÎ

Gulgulî ha bi gulgulî, gulgulî
 K'esk û sorda xemilî, gulgulî,
 Dinya kin û k'emilî, gulgulî
 Gulgulî ha bi gulgulî, gulgulî

Keç'kê K'urda dengbêjin, gulgulî
 Ji ser dila dibêjin gulgulî
 T' emam kezî dirêjin, gulgulî
 Gulgulî ha bi gulgulî, gulgulî

Xortê K'urda xalisin, gulgulî,
 Ji e'lbeta fêrisin, gulgulî,
 Xwe e'gîtin, natirsin, gulgulî,
 Gulgulî ha bi gulgulî, gulgulî

Keç'kê K'urda delalin, gulgulî
 Dengbêjin, deng zelalin, gulgulî
 T' ev yekin, t' ev, hevalin, gulgulî
 Gulgulî ha bi gulgulî, gulgulî

Alleg

Gul - şê - na min, şê - na min,

Gul - şê - na min, çê - vê min.

GULŞÊNA MIN

Gulşêna min, şêna min,
 Gulşêna min, ç'e'vê min.

Te li guhare gupikî,
 Gulşêna min, şêna min,

Te li şe'ra serê rişî,
 Gulşêna min, ç'e'vê min,

Gulşêna min, sipikî
 Gulşêna min, ruh'ê min,

Gulşêna min, ramoşî,
 Gulşêna min, ruh'ê min.

GUNDO BÊRÎ

Gundo bêrî, bêrî, bêrî
 Gundo ber xopano bêrî
 Mala gewram li taxa jêrî
 Gundo ber xopano bêrî
 Gewram rinde pez da bêrî
 Gundo ber xopano bêrî
 Ez ramîsim li mala mêrî
 Gundo ber xopano bêrî.

Gundo, bêrya berx û mîya
 Gundo ber xopano bêrî
 Wêl pêşingê av û mîya
 Gundo ber xopano bêrî
 Gewram rinde, mêr kotîya
 Gundo ber xopano bêrî.

Gundo, bêrya berx û peze
 Gundo ber xopano bêrî
 Wêl pêşingê av û heze
 Gundo ber xopano bêrî
 Gewram rinde, mêr tereze
 Gundo ber xopano bêrî



GUR

Newalo bî dar e,
 Dom ha domê, domligê,
 Newala bî dar e,
 Çûm Saxnisa Gonigê.

Newalo bî bi ye,
 Dom ha domê, domligê,
 Newalo bî bi ye,
 Çûm Saxnisa Gonigê.

Gur hato bî xwar e,
 Dom ha domê, domligê,
 Gur hato bî xwar e,
 Çûm Saxnisa Gonigê.

Gur têyo hêdi ye,
 Dom ha domê, domligê,
 Gur têyo hêdi ye,
 Çûm Saxnisa Gonigê.

Çavê gur li kar e,
 Dom ha domê, domligê
 Çavê gur li kar e,
 Çûm Saxnisa Gonigê.

Çavê gur li mi ye,
 Dom ha domê, domligê
 Çavê gur li mi ye,
 Çûm Saxnisa Gonigê.

Kar kara muxtar e,
 Dom ha domê, domligê
 Kar kara muxtar e,
 Çûm Saxnisa Gonigê.

Mi, mi ya Cîndi ye,
 Dom ha domê, domligê
 Mi, mi ya Cîndi ye,
 Çûm Saxnisa Gonigê.

Moderato



Ha ber-de, ber-de, ber-de, law-ko zen-da zer-ber-de,



ez hatim te bi-vî-nim, ha ber-de, ber-de, ber-de.


HA BERDE

Ha berde, berde, berde,
Lewko zenda zer berde,
Ez hatim te bivînim,
Ha berde, berde, berde.


Dê û bavê te min nazin,
Ha berde, berde, berde,
Ez hatim aliê weda,
Lewko zenda zer berde.

Dê û bavê te mi k'inin,
Lewko zenda zer berde,
Ez hatim te bixazim,
Ha berde, berde, berde.

K'oçkerîa rê me neda,
Lewko zenda zer berde,
Min xastî bavê neda,
Lewko zenda zer berde.



Ha ber-de, ber-de, ber-de De-la-lo, des-tê min ber-de.



Ha ber-de, ber-de, ber-de. De-la-lo. des-tê min ber-de.

HA BERDE

— Ha berde, berde, berde,
Delalo, destê min berde,
Ha berde, berde, berde,
Delalo, destê min berde.

— Gede were min bixaze,
Dê û bava bistîne,
Ew merîne p'ir re'min,
Qelenê p'ir nastînin.

— Xortê delal E'fixan,
Mêrkê maqûlo, mêrxas,
Zû bike min birevîne,
Destê bavê hilîne.

— Ez hatim te bivînim,
Ji dê~bavê te bistînim,
Qelenê te min nestînin,
Ez gelekî k'esivim

— Dilê meda bû bahar,
Hersal, hergav em cînar,
Gava, gava t têi,
Gul û sosina hiltêi.

— Tu kulîlka rû e'zman,
Tu çîç'eka nav dilkan,
Tu kulîlka rû e'rdan,
P'erîşanê, P'erîşan.

Allegretto

The image shows two staves of musical notation in G major (one sharp) and 2/4 time. The first staff has the lyrics: "Lê bi Ha - cê, bi Ha - cê, bi Ha - cê, Ha - cê - Hac." The second staff has the lyrics: "Lê bi Ha - cê, bi Ha - cê, bi Ha - cê, can, wey, can." The music consists of eighth and sixteenth notes, with some rests.

HACÊ-HAC

Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, Hacê Hac,
Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, can, wey can.

Zêr li sêrî bû t'acê, Hacê-Hac,
Zêr li sêrî bû t'acê, can, wey can.

Wextê lawka zewacê, Hacê-Hac
Wextê lawka zewacê, can, wey can.

Karê xezala cotin, Hacê-Hac
Karê xezala cotin, can, wey can.

Berbi dengê xwe dikotin Hacê-Hac
Berbi dengê xwe dikotin can, wey can.

Nêç'îrvan melkematî, Hacê-Hac
Nêç'îrvan melkematî, can, wey can.

Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, Hacê Hac,
Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, can, wey can.

Karê xezala bi sêne, Hacê-Hac
Karê xezala bi sêne, can, wey can.

Berbi dangê xwe têne, Hacê-Hac,
Berbi dangê xwe têne, can, wey can

Nêç'îrvane malêne, Hacê-Hac,
Nêç'îrvane malêne, can, wey can.

Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, Hacê-Hac,
Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, can, wey can.

Karê xezala bi çarin, Hacê-Hac.
Karê xezala bi çarin, can, wey can.

Berbi dengê xwe dik'alın, Hacê-Hac
Berbi dengê xwe dik'alın, can, wey can.

Nêç'îrvane xwendk'arin, Hacê-Hac
Nêç'îrvane xwendk'arin, can, wey can.

Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, Hacê Hac,
Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, can, wey can.

Karê xezala bi pêncin, Hacê-Hac
Karê xezala bi pêncin, can wey can.

Berbi dengê xwe gencin, Hacê-Hac
Berbi dengê xwe gencin, can, wey can.

Nêç'îrvane kurmêncin, Hacê-Hac
Nêç'îrvane kurmêncin, can, wey can.

Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, Hacê Hac,
Lê bi Hacê, bi Hacê, bi Hacê, can, wey can.

Karê xezala bi şeşin, Hacê-Hac
Karê xezala bi şeşin, can wey can.

HA GULA ZER

Ha gula zer,
Ca gula zer,
Ha zeriye, zeriye.

Ha gula zer,
Ca gula zer,
Ha zeriye, zeriye.

Ha gula zer,
Ca gula zer,
Ha zeriye, zeriye.

Ha gula zer,
Ca gula zer,
Ne qazım, ne gulingım.

Ha gula zer,
Ca gula zer,
Ne şêrım, ne pilingım.



Hamin di ji ma lan ber jê ro ber jê ro

HA MIN Dİ

Ha mın di ji malan berjêro, berjêro,
Ha mın di ji malan berjêro, berjêro.

Ha mın di ji malan hawa çû, hawa çû,
Ha mın di ji malan hawa çû, hawa çû.

Şivika destan kennêro, kennêro,
Şivika destan kennêro, kennêro.

Ber bı mala keya çû, peya çû,
Ber bı mala keya çû, peya çû.

Çi bikım yara bı mêro, bı mêro,
Çi bikım yara bı mêro, bı mêro.

Siwari hat û peya çû, peya çû,
Siwari hat û peya çû, peya çû.

Dilê xortan vêra çû, vêra çû,
Dilê xortan vêra çû, vêra çû.

Moderato



Ha şı-lo-re, hay. hay. hay, hay. ge-ni-mê bê-de-



-ra, wey. Can şı-lo-re ca-nê. ku-ro dî-no.



ge-ni-mê bê-de-ra, hay, hay.

HA ŞILORE

Ha şilore, hay, hay, hay, hay, genimê bêdera, wey,
Can şilore canê, kuro dîno genimê bêdera, hay, hay.

Biskê zerya min, hay, hay, bûne sê kera, wey,
Gulyê bedewê, kuro dîno, bûne sê kera, hay, hay,

Bigrin ramûsin, hay, hay, van xizêm zera, wey
Bigrin ramûsin, kuro dîno, van xizêm zera, hay, hay.

Ha şilore, canê hay, hay, hay, genimê gidîşa, wey,
Can şilore canê, kuro dîno genimê gidîşa, hay, hay.

Biskê tobavê, hay, hay, bûne sê tîşa, wey,
Gulyê bedewê, kuro dîno, bûne sê tîşa, hay, hay.

Bigrin ramûsin, hay, hay, daykêd dergûşa, wey,
Bigrin ramûsin, kuro dîno, daykêd dergûşa, hay, hay.

Ha şilore, canê hay, hay, hay, genimê şovêye, wey,
Can şilore canê, kuro dîno genimê şovêye, hay, hay.

Gulyê tobavê, hay, hay, dak'etin k'ovêyo, wey,
Gulyê bedewê, kuro dîno, dak'etin k'ovêyo, hay, hay.

Bigrin ramûsin, hay, hay, delalya dêyo, wey,
Bigrin ramûsin, kuro dîno, delalya dêyo, hay, hay.

Min holek çêkir, hay, hay, hol ji dara darê, wey,
Min holek çêkir, kuro dîno, hol ji dara darê, hay, hay.

Çend k' ašo lêda, hay, hay, hol k'ete xarê, wey,
Çend k' ašo lêda kuro dîno, hol k'ete xarê, hay, hay.

Serholî dûre, hay, hay, şerjêkin karê, wey,
Serholî dûre, kuro dîno, şerjêkin karê, hay, hay.

Min holek çêkir, hay, hay, hol ji dara merxê, wey,
Min holek çêkir, kuro dîno, hol ji dara merxê, hay, hay.

Çend k' ašo lêda, hay, hay, hol k'ete çerxê, wey,
Çend k' ašo kuro dîno, hol k'ete çerxê, hay, hay.
Serholî dûre, hay, hay, şerjêkin berxê, wey,
Serholî dûre, kuro dîno, şerjêkin berxê, hay, hay.

HAY CELEBE

Hey celebe, hey celebel
Wele bavo xweş celebel
Ji Mûsil birye Helebe,
Wele bavo xweş celebel
Ew celebê berx û mîya
Wele bavo xweş celebel
Min jimartin, sed û sî ye
Wele bavo xweş celebel
Mi-j gewrê re da bi derzî ye
Wele bavo xweş celebel!

Ew celêbe van bizina
Wele bavo xweş celebel
Min çêrandî li dor kizina
Wele bavo xweş celebel!
Mi-j gewrê re da bi bazine
Wele bavo xweş celebel!
Ew celebê berx û kara
Wele bavo xweş celebel!
Min jimartin, sed û çare
Wele bavo xweş celebel!
Mi-j gewrê re da bi guhare
Wele bavo xweş celebel!

Ew celebê van karika
Wele bavo xweş celebel!
Min çêrandî li dor tatika
Wele bavo xweş celebel!
Mi-j gewrê re da bi qiflika
Wele bavo xweş celebel!
Ew celebê van berana
Wele bavo xweş celebel!
Min çêrandî li zozana
Wele bavo xweş celebel!
Mi-j gewrê re da bi karbana
Wele bavo xweş celebel!

Ew celebê pezên qere
Wele bavo xweş celebel!
Min çêrandî li dor mexere
Wele bavo xweş celebel!
Mi-j gewrê re da bi kembere
Wele bavo xweş celebel!

HAY DE NAYÊ

Hay de nayê, hay de nayê
Tu xezala-l ber çemayê
Tu keroşka-l nav lemayê
Tu kevoka li ber çayê.

HAY DIL

Hay dîl, hay dîl,
Hay dîl... dîl xirabe yedê.
Hay dîl, birinâ dîlê mîn pîr kûre,
Eman eman, pîr xedare.

Derdê dîlan pîr xirabe,
Eman gîdi û bê çare.
Lo lo lawîko, lo lo kurîko!
Halê te ne hale, û derdê dîlan pîr xirabe,
Û bê çare.

Birindarîm... birindarîm, eman-eman,
Lê gîdiyanê, lî wan çolan.
Birindarîm, kûr dînalîm, eman eman jî kezebê.
De herî doxtorkî binî jî Beyrûtê, jî Helebê.
Bextê te hekîmo, derman bîkî vê serê sîbê.
Hay dîl, hay dîl,
Hay dîl... dîl xirabe yedê.

HAY DIL DILO LO

Hay dîl, hay dîl, dîlo lo
Te dîgo çî, mî dîgo wîlo lo.
Wexta ez hatîm were lo !
Heyran ez helîyam lo.

Hay dîl, hay dîl, dîlê geş.
Te dît gellek tîştê xweş.
Pê ez bîgrîm, bîfroşe !
Helandîm kezeba reş.

Hay dîl, dîlê xortanî,
Gellek tîştên xweş zanî.
Mî dîgo qey tu b' zîmanî
Lê kurmancî nîzanî.

Hay dîl, hay dîl, dîlo lo
Te dîgo çî, mî dîgo wîlo lo.
Wexta ez hatîm, were lo !
Heyran ez helîyam lo.

HEY MÎRO

Hey mîro, mîro, mîro
Hekîmo xweş wezîro
Roj hat qîya nîro
Şer xweşkir, bî qefta şîro.

Hey hatin, hatin, hatin
Koçer jî zozana hatin
Dora mêrgê wer hatin
Hemî Ereb û tatin.

Hey têno, têno, têno
Koçer jî zozana têno
Dora mêrgê wer têno
Hemî koçerê çêno

♩ Allegro

Hay lê lê lê lê lê Hay Bu kê Na-re

Hay lê lê lê lê lê Xam lê-we-la tê

Hay lê lê lê lê lê Ka - bi-çım gun-de - me

Hay lê lê lê lê lê Bax - û ren-gi - ne

Da - we-ta qiz - ma xo - ort û zê - rî - ne.

HAY LÊ LÊ

Hay lê lê lê lê lê
 Hay Bukê narê
 Hay lê lê lê lê lê
 Xamlê welatê
 Hay lê lê lê lê lê
 Tu were runê
 Hay lê lê lê lê lê
 Bo min xlatê

Hay lê lê lê lê lê
 Hay Bukê narê
 Hay lê lê lê lê lê
 Qezgan wehîlê
 Hay lê lê lê lê lê
 Biskan tu qildî
 Hay lê lê lê lê lê
 Dil pir evîne

Hay lê lê lê lê lê
 Axa welatê
 Hay lê lê lê lê lê
 Bo te dibejim

(Girêdan)

(Girêdan)

Hay lê lê lê lê lê
 Ka biçım gunde mê
 Hay lê lê lê lê lê
 Bax û rengî mê
 Xort û zerinê
 (Girêdan)

Hay lê lê lê lê lê
 Hay Bukê narê
 Hay lê lê lê lê lê
 Xemla xwe berdê

Moderato

Hay nêr - gız, nêr - gız, nêr - gız, nêr -
- gi - zê, na - ri cûwa - nê. Hay nêr - gız, nêr - gız, nêr - gız, sor -
- gu - lê bê - rî - va - nê.
Nêr - gi - za ç'îa - kî fe - şim, nêr -
- gi - zê, nêr - gi - zê, nêr - gi - zê, nari cû - wa - nê,
De - la - la ç'îa - kî fe - şim, sor -
Bap.
De - la - la ç'îa - kî fe - şim, sor -
- gu - lê bê - rî - va - nê.

HAY NÊRGIZ

Hay nêrgız, nêrgız, nêrgız, nêrgizê, nari cûwanê,
Hay nêrgız, nêrgız, nêrgız, sorgulê bêrivanê.
Nêrgiza ç'îakî reşim, nêrgizê, nêrgizê, nêrgizê, nari cûwanê,
Delala ç'îakî reşim, sorgulê bêrivanê.

Hay nêrgız, nêrgız, nêrgız, nêrgizê, nari cûwanê,
Hay nêrgız, nêrgız, nêrgız, sorgulê bêrivanê.
H'imayîla bi nexşim, nêrgize, nêrgizê nêrgizê,
H'imayîla bi nexşim, sorgulê bêrivanê.

Moderato

Hey be - rî, be - rî, be - rî.

An - dê - rê av li h'e - rî.

HEY BERÎ

Hey berî, berî, berî
Andêrê av li h'erî.

Min dîbû Sêvê bê dê,
Hey berî, berî, berî.

Ez çûme berya bê xwê,
Hey berî, berî, berî.

Ez çûme berya bê av,
Hey berî, berî, berî.

Min dîbû Sêvê bê bav,
Hey berî, berî, berî.

HÊLI DAY

Hêli day, hêli day,
Heseno hêli.
Hesen zava ye day,
Xwedê bihêli.

Hêli day, hêli day,
Heseno hêli.
Hesen zava ye day,
Xwedê bihêli.

Hat ji gundê me day, kaxizek sore.
Çû ji gundê me day, kaxizek sore.
Hesen zava ye day, zavaki zore.

Hat ji gundê me day, kaxizek zere
Çû ji gundê me day, kaxizek zere
Hesen zava ye day, zava qembere

Hêli day, hêli day,
Heseno hêli.
Hesen zava ye day,
Xwedê bihêli.

Hêli day, hêli day,
Heseno hêli.
Hesen zava ye day,
Xwedê bihêli.

Hat ji gundê me day, kaxizek reşe
Çû ji gundê me day, kaxizek reşe
Hesen zava ye day, zava keleşe

Allegro

Her Dad, her Dad, her Da - do lo, Da - do - ka
min Da - do. Da - do k'î - sik ni - qi - şa - (a)nd,
Da - do - o. Da - do - ka min Da - do.

HER DAD

Her Dad, her Dad, her Dado lo,
Dadoka min Dado,
Dado k'îsik niqîşand,
Dado, Dadoka min Dado.

Her Dad, her Dad, her Dado lo,
Dadoka min Dado,
Ha li ber piştê, ha li teniştê,
Hilk'îşand, Dadoka mi Dado.

Her Dad, her Dad, her Dado lo,
Dadoka min Dado,
Dado qîza melleye,
P' aşil t'iye xurmeye.

Her Dad, her Dad, her Dado lo,
Dadoka min Dado,
Dado qîza k'eşîşe,
P' aşil t'iye k'îşmîşe.

HER BÊLİM

Her bêlîm, bêlîm, bêlîm, Xwedê hivza me bîka
Her bêlîm lo. Her bêlîm lo.
Her bêlîm, bêlîm, bêlîm, J' tometên mala xalê
Evdalîm lo. Evdalîm lo.

Taji berda kewroşkê
Her bêlîm lo.
Taji berda kewroşkê
Evdalîm lo.

Her sê malên newalê
Her bêlîm lo.
Her sê malên newalê
Evdalîm lo.

Her sê malên lî koşkê
Her bêlîm lo.
Her sê malên lî koşkê
Evdalîm lo.

Xwedê hivza me bîka
Her bêlîm lo.
J' tometên mala xwişkê
Evdalîm lo.

Taji berda xezalê
Her bêlîm lo.
Taji berda xezalê
Evdalîm lo.

HERE LEYLÊ LEYLÊ

Herê leylê, leylê, leyl û leylanê
Kera bêriyê reşe, tu gula vi canî.
Ser barê min bar zêbeşe, keçikê nîzami
Bêrivan çî keleşe, leyl û leylanê

Herê leylê, leylê, leyl û leylanê
Kera bêriyê cûne, leyl û leylanê
Ser barê min bar tîtûne, leyl û leylanê
Bêrivan çî keleşe, tu gula vi canî.

Herê leylê, leylê, leyl û leylanê
Kera bêriyê boze, tu gula vi canî.
Ser barê min bar qantoze, leyl û leylanê
Bêrivan çî fitoze, tu gula vi canî.

Lento

He . . rê lo, Ba . so lo, wî lo . îi- mo . îî,
Év . da . lo, Ba . so lo, wî lo . îi- mo . îî.

HERÊ LO BASO

Herê lo, Baso lo, wî lotî-motî,
E'vdalo, Baso lo, wî lotî-motî.

Dest kire cêbê lo, wî yar k'ete bîrê,
Dest kire cêbê lo, wî yar k'ete bîrê.

Te li min gofî lo, wî melkematî,
Te li min gofî lo, wî melkematî.

Herê lo, Baso lo, wî çîma, çîma,
E'vdalo, Baso lo, wî çîma, çîma.

Herê lo, Baso lo, wî kurê pîrê,
E'vdalo, Baso lo, wî kurê pîrê.

Çî li hal-hale lo, wî nav genîma,
Çî li hal-hale lo, wî nav genîma,

Tîving hildabû lo, wî çû nêç'îrê,
Tîving hildabû lo, wî çû nêç'îrê.

Te li wê bejnê lo, wî mame tima,
Te li wê bejnê lo, wî mame tima.

Allegretto



HERÊ, RINDÊ

Herê, rindê, rindê, rinda min.
Belê rindê, rindê, rinda min.

Herê, rinda mine awazî,
Belê, dosta mine awazi.

Herê wêda tê bi çawîşe,
Belê wêda tê bi çawîşe,

Herê, te k' ofî barê gaki,
Belê, te k' ofî barê gaki,

Herê, ç'evê reş bexşîşe,
Belê, ç'evê reş bexşîşe,

Herê, k' ember barê peyaki
Belê, k' ember barê peyaki

Herê, rinda min t'ewnek danî,
Belê, dosta min t'ewnek danî.

Herê, tu ji malê mera nakî,
Belê, tu ji malê mera nakî.

Herê nexşê ort'ê gul danî,
Belê nexşê ort'ê gul danî.

Herê, tuê malê me xirabkî,
Belê, tuê malê me xirabkî.

Herê, navê min û xwe lê danî,
Belê , navê min û xwe lê danî.

HERNE PÊŞ

Bırayîn delal wın werın kurdino
Bihîştta welat da'm herin, merdino
Eger wın nayên vane keç em meşın
Base koletî serfıraz her bijın

Heme pêş herne pêş dew û dem ya weye
Welat çav lı rê bendewarê meye

Keçên nûgîhay em dixwazın xebat
Me canê ciwan danî rêka welat
Dilê me j'pola gurçık bûne hesın
Bo ala rengın wın werın em besın

Heme pêş herne pêş dew û dem ya weye
Welat çav lı rê bendewarê meye

HERNE PÊŞ KARKERNO

Herne pêş karkernol
Bırano herne pêş!
Herne pêş karkernol
Hevalno herne pêş!
Ala me ya sor
Sinoran bibûre.

Ala me pêşta em dimeşin.
Ala me pêşta em dimeşin.
Ala me pêşta em dimeşin;
Armanc sosyalizm û azadi.

Herne pêş karkerno!
Bırano herne pêş!
Banzdide zaferê
Ala piroz.

Ala me pêşta em dimeşin.
Ala me pêşta em dimeşin.
Ala me pêşta em dimeşin;
Armanc sosyalizm û azadi.



HER RO HER ŞEV

Serê malan darîk
Lê, lê, darîk lê
Binê malan darîk,
Lê, lê, darîk lê

Wê darê ji narîk.
Lê, lê, darîk lê
Wê darê ji narîk.
Lê, lê, darîk lê

Her ro-her şev yarîk.
Lê, lê, yarîk lê
Her ro-şev yarîk.
Lê lê yarîk lê

Serê malan çûkîk
Lê, lê, çûkîk lê
Binê malan çûkîk
Lê, lê, çûkîk lê

Wê çûkê ji tûkîk,
Lê, lê, tûkîk lê
Wê çûkê ji tûkîk,
Lê, lê, tûkîk lê

Her ro-her şev bûkîk
Lê lê bûkîk lê
Her ro- her şev bûkîk
Lê lê bûkîk lê

Serê malan gûzîk,
Lê, lê, gûzîk lê,
Binê malan gûzîk,
Lê, lê, gûzîk lê,

Wê gûzîkê gûzîk,
Lê, lê, gûzîk lê,
Wê gûzîkê gûzîk,
Lê, lê, gûzîk lê,

Her ro-her şev qizîk,
Lê, lê, qizîk lê,
Her ro-her şev qizîk,
Lê, lê, qizîk lê.



HER WENDELİ

Her Wendeli, Wendeli.
Her Wendeli, Wendeli.

Hû werne, werne.
Her Wendeli, Wendeli.

Hûn werne rewa h'irçê.
Her Wendeli, Wendeli.

H'irçek têye gelyê k'ire,
Her Wendeli, Wendeli.

Şerê h'irçê û midûre.
Her Wendeli. Wendeli.

P'arsuyê wi kime hûre.
Her Wendeli, Wendeli.

H'irçek têye nav tirşika.
Her Wendeli. Wendeli.

Şerê h'irçê û şemsika.
Her Wendeli, Wendeli.

H'irçek têye nav malane.
Her Wendeli, Wendeli.

Şerê h'irçê û be'ravane,
Her Wendeli, Wendeli.

Her Wendeli, Wendeli.
Her Wendeli, Wendeli.

HESENÊ İRBAM

Hesenê İrbam qurban, siyar lı nışt ın,
Lı deşta me Qebaxtepe cirit listın,
Sıyarê xelkê hatın rabirtın,
Brangê mın l' şûnê xwe hıştın.

Hey brano brano l' her derekê win mano,
Derê oda wan hiltinım, xwedanê mêvana kijano.

.....

(Sanz yöresi türkülerinden)

HESENÊ MÛSA

Hey wax, hey wax, hey wax mala minê!
Soz û bext û qerar neman li darê dinê
Xwedê xerab bikê mala xwedî dilgirtinê
Yabo, yadê, Hesenê mala Mûsa min dixwazi
min nadinê,

Wele bi Xwedê min didinê- min bidinê,
min nadinê, ezê kincê xwe bişênime ser
boyaxê reşkirinê,

Ezê mara mêra piştî çavê reş û belek
li xwe heram kim li darê dinê.

De hey wax mala minê!

Sola torinê mala Mûsa qetya ji çûyênê, ji hatinê
Cilê mala bavê min qetiyan ji daninê, ji raxistinê
Guhê dêka min qul kirin bi galgalê, bi gotinê
Heyf û xebînetê çavê reş û belek sirta golê
ax û av ketinê.

De hey wax, hey wax... mala minê

Mala minê, mala minê, mala minê !

Heseno qurba li me derketî cejna Remezanê
Qîzê gundê me derketin ber govendê, ber dîlanê,
Xortê gundê me derketin ber kêlikê, ber nişanê
Ezê çîqa çavê xwe rebenê digêrinim, nagerînim
ezê torina mala Mûsa qe nabênim li meydanê.

De hey wax,mala minê !

Hey wax, mala mine !

Yadê rebenê ! Hesenê mala Mûsa tenbûrvane
Gustîla tilya torinê malê qaş-almase, karevane
Xwedê xerab bikî mala Simê Qaso, Hesenê Cafo !
Li serê min û torine mala Mûsa rakirne fermane.

De hey wax,mal minê !

Hey wax, mala mine !

Min dî dawetka li Biloka xopan digerîya,
Ez û Hesenî mala Mûsa ketin çiyayê mazi
nav devîya,

Ketin kêf û henek û lîz laqirdîya

Min dî tîfingka ji sirta golê diteqîya

Hesenê mala Mûsa bi ser mi-de wergerîya

Simo digo: Xwekê Hedô ! birîna Hesenê Mûsa
ka li kuya ?








Minê digo: Simo ! Keko ! korocaxo!

Birîna Hesanê Mûsa li ebabelek li nava piya

De hey wax, hey wax ! mala minê

H' ESENKO

Andante



H' ESENİKO

Haê, haê, haê, haê, de haê, haê,
 Heseniko gurba, de haê, haê, haê, haê,
 De haê, haê, delilê Asê.
 Haê, haê, haê, haê, de haê, haê,
 Asê vêspê destê H'esenikê xwe girte,
 Bir ber ava ç' emê Mûradê,
 Du, sê denge gezikir go:
 "K'eleş lawko ez bextê te ji xwedême,
 De haê, haê, delilê Asê.
 De tu H'esenikê min derbazke"
 Asê digo: "Ez k' efilê heqê tema, delilê Asê"

Haê, haê, haê, haê, de haê, haê,
 Heseniko gurba, de haê, haê, haê, haê,
 De haê, haê, delilê Asê.
 Asê digot: "H' emû ç'îya neman, haê, haê, de haê, haê,
 Ci ç'îya neman, haê, haê, de haê, haê,
 Li min xwera lê danenî, haê, haê, de haê, haê,
 Kanî neman, haê, haê, de haê, haê,
 Go, Asê xwera av lê neanî
 Asê digot: "Min çira yekî
 Mîna H' esenikê xwera nanî, delilê Aşê".



HEVAL

Heval megri, melorine, Heval megri, melorine.	Heval xaniyê bavan çal e, Heval xaniyê bavan çal e,	Heval xwaniyê bavan kort e, Heval xwaniyê bavan kort e.
Istêran ji xwinê nebarine, Istêran ji xwinê nebarine.	Van dilopan nal û nal e, Van dilopan nal û nal e.	Van dilopan şort û şort e, Van dilopan şort û şort e.
Loman meke, dê tunine, Loman meke, dê tunine.	Heval dıgri, zava kal e, Heval dıgri, zava kal e.	Heval megri, zava xort e, Heval megri, zava xort e.
Heval megri, melorine, Heval megri, melorine.	Heval megri, melorine, Heval megri, melorine.	Heval megri, melorine, Heval megri, melorine.

HEY DOLABÊ

Hey dolabê, dolabê,
Eman yeman dolabê,
Hey dolabê, dolabê,
Bû şingina dolabe.

Dolab j' dara darâ
Hey dolabê, dolabê.
Dırêsim heriyâ karê
Eman yeman dolabê.

Dolab j' dara biyê
Hey dolabê, dolabê.
Dırêsim heriya miye
Eman yeman dolabê.

Dolaba rızı-mizi
Hey dolabê, dolabê.
Min gewrê j' bavê dizi
Eman yeman dolabê.

HEYLA BÊZÊ

Heyla bêzê, li te bêzarê!
Çelemçitî da ber şarê
Sêva sorê li gulîya darê
Lawno ! lêxin bînin xwarê!

Bêzê kevoka beleke
Firek da xwe çû feleke
Yarê bêzê sed û yeke

Bêzê kevoka sipî ye
Firek da xwe çû banî ye
Yarên bêzê sed û si ye

HEYLA DELALÊ

Heyla delalê, weyla hevalê
Ez û delalê çûne qırşika
Wê-l me derketin siwarê şimika
Wê-j me bistênin delalê cotê memika

Heyla hevalê
Weyla delalê

Ez û delalê çûne piştîya
Wê-l me derketin siwarê romîya
Wê-j me bistênin hel û morîya


Heyla hevalê
Weyla delalê

Ez û delalê çûne çolê wo
Wê-l me derketin siwarê romê wo
Wê-j me bistênin qeza piştê wo

Heyla hevalê
Weyla delalê

Ez û delalê çûne sergîna
Wê-l me derketin siwarê Badîna
Wê-j me bistênin cote potîna

Heyla hey lêlê
Heyla hevalê
Weyla wey lêlê
Weyla delalê



HEY LAWÎN

Hey lawîn, lawîn, lawîne.
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Zozanêd me cot kanîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Min sê peya deştê dîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Zozanêd me cot kanîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Min sê peya deştê dîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Min ji kanya gul çinîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Hersê peya celalîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Min ji kanya gul çinîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Hersê peya celalîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

T'ilya lawik ew birîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

T'ivingê mila e'ynelune.,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

T'ilya lawik ew birîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

T'ivingê mila e'ynelune.,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Min şandye h'ekîm bîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Gede hatye min birevîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Min şandye h'ekîm bîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Lawik hatye min birevîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

H'ekîm mala xweda nîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Min bavêje t'erkyazîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

H'ekîm mala xweda nîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Min bavêje t'erkyazîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Înşalla xweda nîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Min hêlanêd bilind xîne,
Hey lawîn, lawîn, lawîne.

Înşalla xweda nîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Min hêlanêd bilind xîne,
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Hey lawîn, lawîn, lawîne.
Hey lo, lo, kuro min lawîne.

Allegro



Hey lê kal. hey lê kal. hey lê ka - lo, ka - li - ko,
E - vî ka - lî çi di - kir? Çerx û çer - kez xwe - di - kir,
Di - ra - nê rî - zî çê - kir, be - sa ze - wa - cê di - kir,
Hey lê kal. hey lê kal, hey lê ka - lo, ka - li - ko.

HEY LÊ KAL

Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko. Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko.
Evî kalî çi dikir? Çerx û çerkez xwedikir. Navê kalê Emîne, bavê lê kir t'emîne.
Diranê rizî çêkir, be'sa zewacê dikir. Çar-pênc h' ev girtîne, du-sê h'ev berdayîne.
Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko. Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko.

Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko.
E'mrê kalê nod sale, kalê t'irê sî sale.
Evî kalî çi dikir? Çerx û çerkez xwedikir.
Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko.

HEY LO LO DELAL

Hey lo, lo delal,
Hey lo lo lo lo lo lo lo delal.
Bî gavê dibêjîm delal,
Bî saetê dibêjîm delal,
Ezizê ber dilê mîn Xeyo, lo lo lo lo lo.

De lê lo heyran
W'ezê delalê malê bîrêkîm,
W'ezê taşteki ji delalê malê ra çêkîm,
W'ezê temamê rûnê Xenisan jêra lêkîm,
Eger qeyma delalê malê pê neyê
W'ezê cotê memîkan jêra pêşkêşkîm.

Hey lo, lo delal... (*Girêdan*)

De lê lo heyran,
Berika Mêrdînê beriki dûze.
Pozê Qerecdaxa şewiti lî serda
xûze.
Nava singê mehbûbê mîn, evdalê,
Temam ziv û zêr û altûne.

Hey lo, lo delal... (*Girêdan*)

Moderato

Hey lo, Şê - nî, hey lo, Şê - nî,
hey lo, Şê - nî, hey lo, Şê - nî.
De tu we - re ma - la, Şê - nî.
hey lo, Şê - nî, hey lo, Şê - nî.
De tu we - re ma - la, Şê - nî.
dew - ra sa - re we - re xê - nî.
Hey lo, Şê - nî, hey lo, Şê - nî.
dew - ra sa - re we - re xê - nî.

HEY LO, ŞÊNÎ

Hey lo, Şênî, hey lo Şênî, hey lo Şênî, hey lo Şênî.
De tu were mala. Şênî, hey lo Şênî, hey lo Şênî.
De tu were mala Şênî, dewra sare were xênî.
Hey lo, Şênî, hey lo Şênî, dewra sare were xênî.

HEY WAX LI MIN

Hey wax li mîn wax
Ev çî dînya ye?
Kurdîstan bîndestê dijîmîna ye,
Mal û milkê mîn jî xelkê ra maye.

Bax û baxçê mîn tevda kani nê,
Dîlê mîn jî we ax kul û brîne,
Em dawe dîkîn, dibên wîn ki nê,
Mexsedê dilan dişewitîne.

Hey wax (*Girêdan*)

Welatê şêrin em te j' bir nakîn,
Dest bîdîn dest hev bî hev ra bangkîn,
Kurdîstana şêrin zû azadkîn.

Hey wax (*Girêdan*)

HÎNÊ BÎNIN

Hînê binîn d' testê kîn
Şîr û şerbetê çêkîn
Kevçî b' kevçî rûn lêkîn
Binîn l' destê zavê kîn
Binîn l' serê bûkê kîn

Şara bûkê heft reng e
Dayê rabe dereng e
Dawet hate ber deri
Bîna bûkê pîrr teng e
Bîna zavê pîrr teng e

Ha dilan dilan dilan
Stran û dilan dilan
Çî bûkeke delal e
Zava bû xwedi mal e.

Allegro

Ho - ho - hoy Na - ze Na - ze Na - ze
ho - ho hoy Na - ze ger - den ga - ze.

HO, HO, HOY NAZÊ

Ho, ho, hoy, Nazê, Nazê, Nazê,
Ho, ho, hoy, Nazê gerden gazê.

Gerden şûşe gélazê,
Ho, ho, hoy, Nazê, Nazê, Nazê.

Ez Nazêva çûne dara,
Ho, ho, hoy, Nazê, Nazê, Nazê

Radimûsim paşê razê,
Şîrin, rindê Nazê.

Em p'ev k'elin nol'ila dara,
Şîrin, rindê Nazê.

Ez ne nazim ne nazikim,
Ho, ho, hoy, Nazê, Nazê, Nazê.

Derdê dila ez pepûkim,
Şîrin, rindê Nazê.

Allegro

Hoy can, hoy can, hoy ca - nê, hoy ca - nê.
Hoy can, hoy can. hoy ca - nê. Rî - h'a - nê.

HOY CAN

Hoy can, hoy can, hoy canê, hoy canê,
Hoy can, hoy can, hoy canê, Rih'anê.

Me qirarkir bi xîret, hoy canê,
Me qirarkir bi xîret, Rih'anê

Hoy canê, e'rdî h'işk bû, hoy canê,
Rih'anê, e'rdî h'işk bû, Rih'anê.


Çêkir cewê avdanê, hoy canê,
Çêkir cewê avdanê, Rih'anê

T'iye lê me'r û mişk bû, hoy canê,
T'iye lê me'r û mişk bû, Rih'anê,

Deşt ji bûne zozane, hoy canê,
Deşt ji bûne zozane, Rih'anê

Bona p'ala, gundyane, hay canê,
Bona p'ala, gundyane, Rih'anê.

Allegro



HOY ZEYNÊ

H' evke penîrê spîme.
Hoy, hoy, hoy, Zeynê, Zeynê.

H'evke penîrê sorim,
Hoy, hoy, hoy, Zeynê, Zeynê.

H' evke penîrê spîme.
Kulîlka E' vdile'nyê.

H'evke penîrê sorim,
Kulîlka E' vdile'nyê.

H'mayîla dor cindîme,
Hoy, hoy, hoy, Zeynê, Zeynê.

H'imayîla dor bi dorim,
Hoy, hoy, hoy, Zeynê, Zeynê.

H'imayîla dor cindîme,
Kulîlka E' vdile'nyê.

H'imayîla dor bi dorim,
Kulîlka E' vdile'nyê.



Xasînga te rûspîme,
Hoy, hoy, hoy, Zeynê, Zeynê

Xasînga te pisporim,
Hoy, hoy, hoy, Zeynê, Zeynê.

Xasînga te rûspîme,
Kulîlka E' vdile'nyê.

Xasînga te pisporim,
Kulîlka E' vdile'nyê.

Andante



HURMÎNE

Hurmîne hîne - mîne,
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Hurmîne hîne-mîne
Bi mala min, zerya min.

Kes t'une chabê bîne
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Kes t'une chabê bîne,
Bi mala min, zerya min.

Heyder, şikak revîne,
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Heyder, şikak revîne,
Bi mala min, zerya min.

Hurmîne van soqaqa
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Hurmîne van soqaqa
Bi mala min, zerya min.

Wez çûme xana sergirtî
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Wez çûme xana sergirtî
Bi mala min, zerya min.

Girtîng h'absê filitî,
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Girtîng h'absê filitî
Bi mala min, zerya min.

Berx berdane dorê zenga,
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Berx berdane dorê zenga.
Bi mala min, zerya min.

Hat fermana şikaka,
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Hat fermana şikaka
Bi mala min, zerya min.

Wez çûm xana bi h'izh'izî,
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Wez çûm xana bi h'izh'izî
Bi mala min, zerya min.

Du k'ênara jê derizî
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Du k'ênara jê derizî
Bi mala min, zerya min.

Girtîng h'absê da rizî
Lo, lo, lo, lo, bi lo,
Lawko yeman, kurko de can,
Girtîng h'absê da rizî,
Bi mala min, zerya min.

INÊ CAN

"Kılam evda ra heval-hogır e,
Kılam hın şewat, hın ji ağır e,
Wextê medeyi, kılam guman e,
Wextê eşqi, kılam Xudane,
Kılam merya ra din û iman e,
Kılam merya ra derd û derman e,
Wextê bengiyi, kılam hêsır e,
Wextê dılsari, kılam ağır e,
Ki bê kılam e-Bexçê bê gul e,
Ewi bê iman, ewi bê dil e."

(Eskerê Bayık)

IRO ROJA REHETIYE

Iro roja rehetiye,
Bilivîn em herine dawetê,
Têkevîne ser govendiyê,
Ha lêxîn, lêxîn, lêxîn.

Têkevîne ser govendiyê
Ha lêxîn, lêxîn, lêxîn.
Bilizîn listîka cimetê
Lawîko xırpanî lêxîn.

Sazbendê me Şero ye,
Ha lêxîn, lêxîn, lêxîn.
Lêxîn qeydê heroye.
Lawîko xırpanî lêxîn.

ÎSKANÊ QASIM

Hay delal, hay delal !

Hay delal Îskano !

Lo tu berxo, tu berano,

Li helanê Zêwê keleka koçera,

Li pêşîya Hesîwê Bîrahîm, Cemîlê Çeto

û Seîdî Ehmed bûye qere sindyano.

De hay delal, hay delal Îskano lawo !

Bêzê digo, Neîma ! rebenê !

Dilê min rebena xwedê ji êvarde

çima wilo di kewgirî ?

Min bala xwe dayê hewara Rema

û mala Faro û mala Nêsir hat û dibihirî,

Ezê çûme pêşîya Hesîwê Bîrahîm, axekî nûkemilî

Minê digo, Heso ! lawo ! bi serê bavê xwekî

te laşê Îskanê me nedîye?

Digo, Bêzê rebenê! here pîrsa xwe bike

Ji Cemîlê Çeto, gawirê sorê şewqekirî.

Ezê diçûm û minê digo, Cemîlo lawo!

bi xwekî bi xwedêkî, te laşê Îskanê min nedîye?

Digo, Bêzê rebenê! here pîrsa xwe bike

ji Seîdê Ehmed, sê barî xulamê şîretkirî.

Ezê diçûm ê pêşîya Seîdê Ehmed, minê digo:

Seîdo ! kawo ! te laşê Îskano min nedîye?

Digo, Bêzê rebenê ! ezê bi helanê Zêwê diketim,

Minê Îskanê te dîtîye,

Minê digo, lawo ! Îskano ! rabe,

Tu xortekî nestêleyî, destê mi-l te nabe.

Lê Îskanê Qasim bavê Simaîl digo:

Seîdo ! lawo ! dilê wê, sed carî bi min wêye,

Bi serê bavê xwe û te kim ! kuştina min heyê

û tucar reva min tune ye.

Minê derbekî tavêtî bejn û bala rextê

eyneliyê û min xerabdikirî pêşanêka meqeskirî.

ÛSMAÏLÊ XELÏL

Were were... wer Simaïlo !

De were, were, were, were, xwaro !

Yadê ! Qesra Simaïlê Xelil di kortê de,
Xwedê xera bikî mala lawê gurî,
Nêrdewan danî û kişya pêde,
Wela li min rebenê, Simaïlê Xelil
suttin di xewka sibê de.

De were were, were, wer Simaïlo!

De were were, were, xew girano!

Yadê ! remenê ji Talatê heya Sitê,
Weyla li min rebenê, beri û baran bi kulî tê
De giryê gawir û misilmana bi halê min û
Simaïlê Xelil tê.

De were were, were, wer Simaïlo!

De were were were, xew girano!

Yadê ! rebenê ! ez û Simaïlê Xelil,
Li hafa mala li hev rast hatin,
Wele qidûmê min rebenê şikestin,
Çokê min evdalî çûn û hatin,
Wele min û Simaïlê Xelil bi qozîyên
çava hev axaftin.

De were were, were, wer Simaïlo !

De were were.

Andante



JI GERGETÊ

Ji Gergetê, ha ji Gergetê, delal, xezalê,
Ji Gergetê, ha ji Gergetê, delal, delalê,

Qîrîna dîkê qer tê, xezal, xezalê,
Qîrîna dîkê qer tê, delal, delalê,

Şingîna bazinê zer tê, xezal, xezalê
Şingîna bazinê zer tê, delal, delalê.

Jİ PELÊ DARÊ

Ji pelê darê, lê ji pelê darê
Kirasê Meymo, lê ji pelê darê
Min dirûtî lê par biharê
Kirasê Meymo, ji pelê darê
Sed pîroz bî lê li bejna yarê
Kirasê Meymo, lê ji pelê darê.

Ji pelê gwîzê, lê ji pelê gwîzê
Kirasê Meymo, lê ji pelê gwîzê
Min dirûtî lê par payîzê
Kirasê Meymo, lê ji pelê gwîzê
Sed pîroz bî lê li bejna qîzê
Kirasê Meymo, lê ji pelê gwîzê

Ji pelê ketê, lê ji pelê ketê
Kirasê Meymo, lê ji pelê ketê
Min dirûtî lê ji dawetê
Kirasê Meymo, lê ji pelê ketê
Sed pîroz bî lê li bejna te tê
Kirasê Meymo, lê ji pelê ketê.

Ji pelê bîyê, lê ji pelê bîyê
Kirasê Meymo, lê ji pelê bîyê
Min dirûtî lê bi derziyê
Kirasê Meymo, lê ji pelê bîyê
Sed pîroz bî lê li te zerîyê
Kirasê Meymo, lê ji pelê bîyê

KANI KANI AVSAR KANI

Kani kani avsar kani,
Malan barkır lî ser dani,
Felek destê xwe berevke,
Me mradê xwe hîlnani.

Tê bêy kingê ku bêm hingê,
Mala me derine dîngê,
Kal û kurmê xelkê zewcin,
Ez bî te ve mame kingê?

Hivê daye hiva bharê,
Şewgê daye gulyê darê,
Xwedî mradê mîn û te bîkra,
Mina Şah Smail û Gulizarê.

(Sarız yöresi türkülerinden)

KANI KANI RINDÊ KANI

Kani kani rinde kani
Malan barkır lîser dani
Mî bîteva qewlek dani
Tu pişmani tu dizani

Mere meye mero meye
Ber derime meke reye
Ciran ê me pîr qovcine
Diben dilê xwe î lêye

Hatım çûm ku te bîbinim
Dungurçine te bîşinim
Te didîn mî bîra bîdîn
Ku tu nedan dîrevinim

(Sarız yöresi türkülerinden)

KEÇA KURDAN

Keçê binêr, çerxa cihan zor girêdane mêrê zor
Jin çûne pêş, pir dixwinin, êdi qelem gîş çûne jor.

Keçê, em dixwazin bî mera werin şêwrê
Dilo, em dixwazin bî mera werin cengê.

Hayê hayê, em keçikên kurdanin,
Şirin, em şengîn, em hêviya merdanin.

Hayê hayê, em kulilkên kurdanin
Derdê nezana ber bend û ser hundanin.

Serê xwe rake keça kurdan, dil û cigerê heliyan.
Ka niştîman, ka azadi, ka dayika me sêwîyan ?

Keçê, em dixwazin bî mera werin şêwrê
Dilo, em dixwazin bî mera werin cengê.

Hayê hayê, em kaçikên kurdanin,
Şirin, em şengîn, em hêviya merdanin.

Hayê hayê, em kulilkên kurdanin
Derdê nezana ber bend û ser hundanin.

Xwişka delal, jî bo welat gerek mêr û jin tev rabîn.
Ki nexwaze; paşverûne, ne perwerin, azad nabîn.

Keçê, em dixwazin bî mera werin şêwrê
Dilo, em dixwazin bî mera werin cengê.

Hayê hayê, em kaçikên kurdanin,
Şirin, em şengîn, em hêviya merdanin.

Hayê hayê, em kulilkên kurdanin
Derdê nezana ber bend û ser hundanin.

KEÇÊ WERE WERE

Keçê were were nav zebeşan.
Ez heyranâ çavê reşan.
Were keçê keçê, ez nexweşim.
Nexweşê çavê reşim.

Keçê were were nav kelekan.
Ez heyarana çavê belekan.
Meke keçê keçê, van hênekan.
Vere keçê keçê hukımdarê.

Keçê were were nav tit û nan.
Ez qurbana çav xatûnan.
Agır dayne ser qelûnan.
Vere keçê keçê, hukımdarê.

KEÇ KEÇIKE-KEÇIKE

Keç keçike keçike, lo lo li min, lê lê li te.
 Keç keçika min eve, lo lo li min, lê lê li te.
 Te li min gerandî şeve, lo lo li min, lê lê li te.
 Her tim karê min eve, lo lo li min, lê lê li te.
 Keç keçike keçike, lo lo li min, lê lê li te.

Keç keçika elmanî, lo lo li min, lê lê li te.
 Lawik derket ser xani, lo lo li min, lê lê li te.
 Keçik jêre av ani, lo lo li min, lê lê li te.
 Li ber derikê me dani, lo lo li min, lê lê li te.
 Lawikah lêxîst hilani, lo lo li min, lê lê li te.

Keç keçike keçike, lo lo li min, lê lê li te.
 Keç keçike, keçike, derdê li min, kula li li te.

Allegro



Ke - jê, tu ke - jî, lê, Wel - le, bil - le, tu ke - jî:

KEJÊ

Kejê, tu keji, lê
 Welle, bille, tu keji

Kejê, tu keji, lê,
 Welle, bille, tu keji.

Çoçê min şkestin, lê,
 Xoşik çû mala xwe ji.

Piştê min şkênand, lê,
 Te ez kırım ta û derzî.

Kezebê min şkênand, lê,
 Xoşik çû mala xwe ji.

Destê hev bigrin, lê,
 Dak'evin nav vî rezî.

Keja min h'elwandî
 Dimsê rûnê h'elandî.

Kejê, kejiyê, lê,
 Xwaya çarde gulîye.

Ç'e' vê bi k'il mayî,
 Dilê min jî tewandî.

P'orê zêrê zer, lê,
 Xwe bir da pişt e'niyê.

Gurç'ik gele kir, lê,
 Kezab pêra k'ewandî

Min û keja xwe, lê,
 Ber xaniyê hev û dû diye.

Keji, te çi kir, lê,
 Xudikê Şemê te xwe kir?

KEMALO

Kemalo, Kemalo, wer wer Kemalo
Min çavê serî xwaro, wer wer Kemalo.

Kemalo bavê me tê, wer wer Kemalo
Reysê cemhûryetê, wer wer Kemalo
Şêxê şerîetê, wer wer Kemalo
Kemal bikêrî me tê, wer wer Kemalo.

Kemal go ez nakim, wer wer Kemalo
Sulhê qebûl nakim, wer wer Kemalo
Şêxan ji vir rakim, wer wer Kemalo
Axa ji vir rakim, wer wer Kemalo.

Kemola rêzane, wer wer Kemalo
Ismeto rêzane, wer wer Kemalo
Çarox girêdane, wer wer Kemalo
Şerîl ser Yewnane, wer wer Kemalo.



KÊNA QIC

Ay, lo dilo, lo dilo,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Is, lo dilo, sor gulo.

Warê ma piyer geraji,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Warê ma piyer geraji,
Is, lo dilo, sor gulo.

Manena bakê kênano,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Manena bakê kênano,
Is, lo dilo, sor gulo.

Kiyan bar kerd şî waran,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Kiyan bar kerd şî waran,
Is, lo dilo, sor gulo.

Hegao pilo hira o,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Hegao pilo hira o,
Is, lo dilo, sor gulo.

Kêna qic mî nêdano,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Kêna qic mî nêdano,
Is, lo dilo, sor gulo.

Ware şar piyer zozani,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Ware şar piyer zozani,
Is, lo dilo, sor gulo.

Yo hao miyande aw dano,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Yo hao miyande aw dano,
Is, lo dilo, sor gulo.

Îşallah kêda bîmano,
Ay, lo dilo, lo dilo,
Îşallah kêda bîmano,
Is, lo dilo, sor gulo.

KERİM LAWŌ ÇEQİLMASŌ


Kerîm lawo çeqilmast
Min meyand û nebû mast
Kûçîkê Mexmer alast
Bû koçerke birast

Kerîm lawo çeqilmast.

Ez çûme Şam û Heleb
Anîn sê biznê celeb
Yeke kwîr û yeke pîr
A dinê bizna tiştîr
Bûm hemberê mala mîr

Kerîm lawo çeqilmast.

Vivace



KEWÊD GOZEL

Em yekin, zerî yekin.
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Bax û bostan hurmêne,
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Bax û bostan ç'îç'ekin,
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Em çarin, zerî çarin,
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Em cotin, zerî cotin
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Bax û bostan hurmêne
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Bax û bostan kewotkin,
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Em pêncin, zerî pêncin,
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Em sêne, zerî sêne.
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Bax û bostan birincin,
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

KEZÎZERÊ

Kezîzerê, Kezîzer
Xulam memkê gilover
Serî sor û binî zer
Mîna berfa zinarê
Sîka dara tim li ser
Mîna sêvên Xelatê
Serî sor û binî zer
Mînane penîrên ter
Min givaşt û av jê her
Tu ji govendê were der
Te ramûsim, cardî her
Te divê her û te divê mer.

Kezîzerê lewendê
Gewrê, bozê, bilindê
Kevoka nava gundê
Sîng doşek, balîf zendê
Ez ramûsim te rindê
Destê xwe bi destê min de
Tevde herin govendê.

Kezîzerê hithîti
Li binya mala şemîti
Dawa têqî lewîti
Dilê lêwik şewîti.

Kezîzerîn me çarin
Ner çar jî bi kum û şarin
Hilma memkan em xwarin.

Kezîzerên me şeşin
Her şeş jî bi şarên reşin
Hilma memkan çî xweşin..



Nin nım Nin nım Nin na yê di lo Nin na yê di lo Ni na yê



Nin nım Nin nım Nin na yê di lo çı bı kım ma lê dun ya yê

KILAMA KORÉ (*)

Ninnım, Ninnım, Ninnayê dılo. Ki nexwine poşman e, dılo, Ninnım qıza Keşiş e, dılo,
Ninnayê dılo, Ninnayê, Ninnayê dılo, Ninnayê,
Ninnım, Ninnım, Ninnayê dılo, Ki nexwine poşman e, dılo, Ninnım qıza Keşiş e, dılo,
Çı bı kım malê dunyayê. Çı bı kım malê dunyayê. Çı bı kım malê dunyayê.

Hat eskerê Korayê, dılo, Ninnım qıza melle ye, dılo, Paşıl tiji mewij e, dılo,
Ninnayê dılo, Ninnayê, Ninnayê dılo, Ninnayê,
Hat eskerê Korayê, dılo, Ninnım qıza melle ye, dılo, Paşıl tiji mewij e, dılo,
Çı bı kım malê dunyayê. Çı bı kım malê dunyayê. Çı bı kım malê dunyayê.

Mektûba mın vêrayê, dılo, Paşıl tiji xurme ye, dılo, Pıştı xwe da gitêş e, dılo,
Ninnayê dılo, Ninnayê, Ninnayê dılo, Ninnayê,
Mektûba mın pêrayê, dılo, Paşıl tiji xurme ye, dılo, Pıştı xwe da gitêş e, dılo,
Çı bı kım malê dunyayê. Çı bı kım malê dunyayê. Çı bı kım malê dunyayê.

Ew mektûba dılan e, dılo, Pıştı xwe da derge ye, dılo,
Ninnayê dılo, Ninnayê, Ninnayê dılo, Ninnayê,
Ew mektûba dılan e, dılo, Pıştı xwe da derge ye, dılo,
Çı bı kım malê dunyayê. Çı bı kım malê dunyayê.

Allegro



Ki - na min ki - ni - ke, lê, Ki - na min ki - ni - ke, wey,



Ki - na min ki - ni - ke, lê, Ki - na min ki - ni - ke, wey,



Ga - va xwe çê - di - ke, lê, Ma - la mi(n)xi - rab di - ke.

(X) Yıl 1950. Dönemin Türkiye Başbakanı Adnan Menderes, Türkiye'nin Amerika'ya "yakınlığını" Kore savaşına binlerce asker göndermekle kanıtladı. Bu askerlerin içinde Kürtler de vardı. Derken delikanlılar sevgililerini, erler kadınlarını bırakıp gittiler. Kimi sağlam döndü, kimi sakat, kimisi de hiç dönmedi. Ve analar yavruları, gelinler kocaları, genç kızlar sevgilileri için türküler yaktılar; acılı türküler.

"Kılama Koré" savaşın kaçınılmaz sonucu olan ayrılık hasretinin ve ölüm korkusunun türküsüdür. Türkü, kocası Kore harbine giden Ninnım adlı gelin üzerine söylenmiş.

KINA MIN

Kina min kinike, lê,
Kina min kinike, wey,
Gava xwe çêdike, lê,
Mala min xirab dike.

Kina min kin nîne, lê,
Kina min kin nîne, wey,
Gava xwe dixemlîne, lê,
Canê min di h'elfîne.

Berbûş û Berbûşe, lê
Berbûş û Berbûşe, wey,
Fêfêre bi p'ûşe, lê,
Kina min bi dergûşe.

Hêlûn û hêlûne, lê,
Kina min xatûne, wey,
Gava xwe dixemlîne, lê,
Aqilê min di çelqîne.



KINÊ

Kînim, kînim, lê, lê, lê,
Dirêj nebîm, lê, lê, lê,
Dirêj nabîm, way, way.

Zêrê zer îm, lê, lê, lê,
Xirab nabîm, lê, lê, lê,
Xirab nabîm, way, way.

Paşa were, lê, lê, lê,
Ber ranabîm, lê, lê, lê,
Ber ranabîm, way, way.

Pîrsê xelkê, lê, lê, lê,
Xirab nabîm, lê, lê, lê,
Xirab nabîm, way, way.

Ax lê kînê, lê, lê, lê,
Maliya mînê, lê, lê, lê,
Maliya mînê, way, way.

Kîn macîra, lê, lê, lê,
Deşta Mûşê, lê, lê, lê,
Deşta Mûşê, way, way.

Kîn şêrbet bû, lê, lê, lê,
Berda şûşê, lê, lê, lê,
Berda şûşê, way, way.

Ez di ramusîm, lê, lê, lê,
Ber dergûşê, lê, lê, lê,
Ber dergûşê, way, way.

KIN IM

Kînim, kînim, kînim,
Kînkê canê heyran.

Kînim, dirêj nabîm,
Kînkê canê heyran.

Zêrim, xirab nabîm,
Kînkê canê heyran.

Entaxê, Entaxe,
Kînkê canê heyran.

Şewiti tax bî taxê,
Kînkê canê heyran.

Dergûşe, dergûşe,
Kînkê canê heyran.

Şewiti qevdek pûşe,
Kînkê canê heyran.

Moderato

Ki - ra - sê te me - le - se, he - war lê, lê,
he - war lê, lê, he - war lê, ki - ra - sê te
me - le - se, can û can, can, can qur - ban.

KIRASÊ TE

Kirasê te melese,
Hewar lê, lê, hewar lê, lê, hewar lê,
Kirasê te melese,
Can û can, can qurban.


Min dabû ber meqese,
He war lê, lê, hewar lê, lê, hewar lê,
Min dabû ber meqese,
Can û can, can qurban.

Herçî yiarê t'unîne,
He war lê, lê, hewar lê, lê, hewar lê,
Araq xwerî serxweşin,
Can û can, can qurban.


Kirasê te medrûme,
He war lê, lê, hewar lê, lê, hewar lê,
Kirasê te medrûme,
Can û can, can qurban.

Hûrik hûrik didrûme,
He war lê, lê, hewar lê, lê, hewar lê,
Hûrik hûrik didrûme,
Can û can, can qurban.


Vivo



E-man, e-man, e-man, e-man, e-man, e-man, k'o-çe-rê,



E-man, e-man, k'o-çe-rê, Min bi xu-la-ma k'em-be-rê,



Te bi xu-la-ma k'em-be-rê, Râdi-mû-sim ger-den-ze-rê,



Râdi-mû-sim ger-den-ze-rê. Piş-ta ma-la, bên-de-rê,



E-man, e-man, e-man, e-man, e-man, e-man, k'o-çe-rê.

K'OÇERÊ

Eman, eman, eman,
eman, eman, eman, k'oçerê.
Eman, eman, k'oçerê,
Min bi xulama k' emberê,
Te bi xulama k' emberê,
Radimûsim gerdenzerê
Radimûsim gerdenzerê
Pişta mala, bänderê,
Eman, eman, eman,
eman, eman, eman, k'oçerê.

Eman, eman, eman,
eman, eman, eman, k'oçerê.
Eman, eman, k'oçerê,
Pişta mala, me bi kewot,
Derê xanya me bi kewot
Mêrkê min wextê here jor,
Mêrkê min wextê were jor,
Qamçi jêra rebene,
Eman, eman, eman,
eman, eman, eman, k'oçerê.

Eman, eman, eman,
eman, eman, eman, k'oçerê.
Eman, eman, k'oçerê,
Min dî li afirê gamêşa,
Te dî li afirê afirê gamêşa,
Dinya min girtû êşe,
Gava ç'e'vê min lê k'et
Şîşa dilê mi êşya,
Eman, eman, eman,
eman, eman, eman, k'oçerê.

Allegro

Ko - ce - rê hey ko - ce - rê,

Na - rû - nê, Na-rû-nê hoy-nar, Ko - ce - re,

hey ko - ce - re xar - bûm ser bej-ne - da.

K'OCERÊ HEY K'OCERÊ

K'ocere, hey k'ocere, Narûnê, Narûnê hoynar,
K'ocere, hey k'ocere, xarbûm ser bejnêda.

K'ocere, ji bêryê tê, Narûnê, Narûnê hoynar,
K'ocere, ji bêryê tê, xarbûm ser bejnêda.

Nastînim keç'ka bê dê, Narûnê, Narûnê hoynar,
Nastînim keç'ka bê dê, xarbûm ser bejnêda.

Imbara berbi mi tê, Narûnê, Narûnê hoynar,
Imbara berbi mi tê, xarbûm ser bejnêda.

Gava mi dest dida, Narûnê, Narûnê hoynar,
Gava mi dest dida, xarbûm ser bejnêda.

Ling mi dilerizî, Narûnê, Narûnê hoynar,
Ling mi dilerizî, xarbûm ser bejnêda.

K'ocere, ji bêrya bê av, Narûnê, Narûnê hoynar,
K'ocere, ji bêrya bê av, xarbûm ser bejnêda.

Imbara bi ser û ç'e'v, Narûnê, Narûnê hoynar,
Imbara bi ser û ç'e'v, xarbûm ser bejnêda.

Nastînim keç'ka bê bav, Narûnê, Narûnê hoynar,
Nastînim keç'ka bê bav, xarbûm ser bejnêda.



KULA DİLÊ MIN WELAT

Kula dilê mın welat,
Kesera dilê mın welat.
Tavê avêt rohilat,
Wexta şixul û xebat.

Welat deşt û zozane,
Milletê navda birane.
Qesr û qonax lê da ne,
Ji boy emrê insane.

Welatê me zef xwşe,
Şixul ser rê ye, dimeşe.
Dilê bûka dilgeşe,
Kêfa mın û Keleşe.

Welat gellek şirine,
Millet welat dihebine.
Axa dıl û şirine,
Xebatê tım pêşta tine.

Kula dilê mın welat,
Kesera dilê mın welat.
Tavê avêt rohilat,
Wexta şixul û xebat.

Kula dilê mın welat,
Kesera dilê mın welat.
Tavê avêt rohilat,
Wexta şixul û xebat.

Kula dilê mın welat,
Kesera dilê mın welat.
Tavê avêt rohilat,
Wexta şixul û xebat.

KURDISTANA BI DENGÎ ME

Kurdîstana bî dengî me,
Bax û bostan bî rengî me.
Kurdîstana bî dengî me,
Bax û bostan bî rengî me.
Ax şirîne saxî me.
Milletê kurd, milletê kurd,
milletê kurd.
Ax şirîne saxî me.
Milletê kurd, milletê kurd,
milletê kurd.

Şal û şapîk libasê mın,
Govend-çepîk hunerê mın
Şal û şapîk libasê mın,
Govend-çepîk hunerê mın
Ne zaniya kê m qetiyê mın,
Milletê kurd, milletê kurd,
milletê kurd.
Ne zaniya kê m qetiyê mın,
Milletê kurd, milletê kurd,
milletê kurd.

Reşîk hat liqan hêja
Bo azadi xwin rîja.
Reşîk hat liqan hêja
Bo azadi xwin rîja.
Maldaran ji ber xwe revand,
Milletê kurd, milletê kurd,
milletê kurd.
Maldaran ji ber xwe revand,
Milletê kurd, milletê kurd,
milletê kurd.

Gelê kurd em şiyarbin
Riya Azadi karbin.
Gelê kurd em şiyarbin
Riya Azadi karbin.
Roja Welat bawerbin,
Milletê kurd, milletê kurd,
milletê kurd.
Roja Welat bawerbin,
Milletê kurd, milletê kurd,
milletê kurd.

KURDİSTAN IM KA

Bax û bîstan im ka,
Ax gulistan im ka,
Dijmîn tev girtin ax,
Ax Kurdistan -im ka !

Em anin cihan wê,
Em kîrîn insan wê
Lê me zû ew berda,
Ax Kurdistan -im ka !

Gest û seyran -im çûn,
Heyran xan-im çûn.
Çavê mî xurbet ma,
Ax Kurdistan -im ka !

Guh nadim ê çû do,
Şev dîçî zû, tê ro.
Te jî bir nakim na, na, na;
Ax Kurdistan -im ka !

Mî ceger tev bû xwîn,
Bê xwendin û zanin,
Bê tac û bê Kesra,
Ax Kurdistan -im ka!

(Cigerxwîn)

KURDISTAN WELATÊ ME

Kurdistan welatê me,
Her bîjî Kurdistan !
Şîrîne ber dilê me,
Her bîjî Kurdistan !

Kurdistan welatê me,
Her bîjî Kurdistan !
Lenin e serokê me,
Her bîjî Kurdistan !

Kurdîstana şîrîne,
Her bîjî Kurdistan !
Temam mêrg û kanîne,
Her bîjî Kurdistan !

Çavê dijîmîn derîne
Her bîjî Kurdistan !
Heqê xwe jî wan bîstîne
Her bîjî Kurdistan !

Kurdîstana rengîne,
Her bîjî Kurdistan !
Azadî jî mera mîzginîne,
Her bîjî Kurdistan !

LAVIJÊ BOTAN

Çiyayên bilind xalî nabin,
Ji mijê, ji moranê,
Keviyên biçûk pala xwe didanê,
Qentarê kul û xeman birêket,
Lê ê şahîyan li nêvê rê gihanê..

Şavên çiriyan dirêjin,
Xewa min nayê,
Bist û pêwir bilind bûne,
Qurix li min hate qayê,
Xwedê birinên kurilavêjê
min kûrin derman li wan nayê.

Ezê li dîwanê fikirîm,
Dîwan ne temame,
Qehweçî qehwê digerênî
Bi fincan û came,
Eze çavên xwe digerênim,
Herwekû bûye Misr û Şame.

Dilo kovandaro !
Emê pîr bûne û tu pîr nabî.

Dilo minê divên tivingeke berwec,
Çotek dermanê du aşivan bihevre dayê,
Wextê serê min diçî ser sitehrikê,
Ji min weye nêriyê pezkêviye,
Lê çawa dibezimê, Evdalê gulî berdayî.

Lo dilo kovandaro !
Emê pîr bûne û tu pîr nabî.

Vivace



LÊ BI CANÊ

Lê bi can, lê bi can,
lê wer, lo, lo,
Lê bi can, lê bi can, lê
Lê bi can, lê bi can,
lê wer, lo, lo,
Lê bi canê, min h'eyranê.

Bejna te bi rih' ane, lê,
Lê bi can, lê bi canê, lê
Bejna te bi rih' ane, lê,
Lê bi canê, min h'eyranê.

E'nya te meydane, lê.
Lê bi can, lê bi canê, lê
E'nya te meydane, lê,
Lê bi canê, min h'eyranê.

Devê te dik'ane, lê,
Lê bi can, lê bi canê, lê
Devê te dik'ane, lê,
Lê bi canê, min h'eyranê.

Diranê te mircane, lê,
Lê bi can, lê bi canê, lê
Diranê te mircane, lê,
Lê bi canê, min h'eyranê.

Dilê min k'ete, lê,
Lê bi can, lê bi canê, lê
Dilê min k'ete, lê,
Lê bi canê, min h'eyranê.

Dilê qîza xelqêye, lê,
Lê bi can, lê bi canê, lê
Dilê qîza xelqêye, lê,
Lê bi canê, min h'eyranê.

LÊ BI HOLÊ

Lê bî holê, lê lê bî holê, lê lê bî holê,
Lê bî holê, lê lê bî holê, sefil bûkê.

Lê bî holê, lê lê bî holê, lê lê bî holê,
Lê bî holê, lê lê bî holê, sefil bûkê.

Xaniyê axê biçûke, lê lê bî holê,
Istûna navay hêlûge, sefil bûkê.

Jê derket cotek qize, lê lê bî holê,
Derdêm ewa mezîne, sefil bûkê.

Jê derket cotek bûke, lê lê bî holê,
Derdêm ewa biçûke, sefil bûkê.

LÊ CANÊ

Lê canê, canê, canê, cana min
Qirik tije mircanê Cana min
Sorgulê bel û banê, Canê lê
Şîn bû li Aşê Hecîko cana min
Li ser dika Şabanê, canê lê

Doşeke ji bo razanê, Canê lê.
Balîfe ji bo paldanê cana min
Rû kul bû ji ramûsanê, Canê lê
Sing kul bûye ji tevdanê, Canê lê.

Min dî li gir fitilî, Cana min
Bi tena xeftanê gulî, lê Canê
Li serî Şara Mûsilî lê Canê
Gulkê şarê giran bûn, Cana min
Li kêlekê edilî Cana min
Çarik li bejnê herbilî lê Canê
Neynik danî xemilî Cana min
Kulên te pir giranin, Canê lê
Şax dane ser vî dilî, Cana min
Xwezî min gewra xwe bidîte, Cana min
Li ser kewna ewilî, Canê lê, Canê lê...

LÊ CANÊ

Lê canê, lê canê, lê can hey can.
Lo gelo zeriya tê ji mala kê?

Tak rihanan lê, li van rêzan,
Şax davê tê, lê gêliyê Hezan,
Kêr û kem lê, rewşa qizan.

Tak rihanan lê, li van kortan,
Şax davê tê, lê gêliyê Botan
Hesp û tîfing lê, şanê xortan.

Lê canê, lê canê, lê can hey can.
Lo gelo zeriya tê ji konê kê?

Tak rihanan lê, li van sûkan,
Şax davê, tê lê gêliyê Çûkan,
Şar û gulik lê, rewşa bûkan.



LÊ DINÊ

Tu mîraza xortani, lê dinê,
Lê lê dinê, lê dinê, tew dinê.
Tu mîraza xortani, lê dinê,
Lê lê dinê, lê dinê, tew dinê.

Gerden sisê, por mîrcan, lê dinê,
Lê lê dinê, lê dinê, tew dinê.
Gerden sisê, por mîrcan, lê dinê,
Lê lê dinê, lê dinê, tew dinê.

Tu êmişa cêba xortani, lê dinê,
Lê lê dinê, lê dinê, tew dinê.
Tu êmişa cêba xortani, lê dinê,
Lê lê dinê, lê dinê, tew dinê.

LÊ DOTMAM

Xeber hate min lê, ser eşqa dîl,
Eywax gul bû evindara bîlbîl.
Azadar bûm lî ser evina dîl,
Eywax gul bû evindara bîlbîl.

Bîlbîl xeman qet nakşîne jî gul.
Bîlbîl xeman qet nakşîne jî gul.

Lê dotmam, lê dotmam, lê rû reşê
Lê dotmam, lê dotmam, w'em rê reşê.
Lê dotmam, lê dotmam, lê dotmamê
Lê dotmam, lê dotmam, lê dotmamê,
Delalâ evindara pîsmamê,
Zeriyê evindara pîsmamê.

Dotmam dayîka me tev niştîmane,
Dîqiri û dîzgazi l' ber destane.
Wê çawa bê sebra me kurdane,
Wê çawa bê sebra me kurdane.

Lê dotmam (*Giredan*)

Dotmam tu pîr xweşî lî ba Şîvan,
Lê niştîman nadîm hezar dîlan.
Bo azadi dibêm, canê m qurban,
Bo rîzgari dibêm, axa goran.

Lê dotmam (*Giredan*)

LÊ GEWRÊ


Kanya hêlê li mêrgêwo
Lê, lê, lê lêlê lê gewrê
Lêlê, lêlê, lê gewrê.

Kanya hêlê li mêrgêwo
Xulam sê bîskê şêwo
Berdan alîkê bêwo
Mi-l eslê gewrê pîrsî
Gewrê bi esil jî Golê wo

Ezê gewrê birevînim
Xwe bavêjim sitewrê wo
Hay lê lê
De lê lê lê lê gewrê.

Kanya hêlê li Mezreqa
Lêlê, lêlê, lêlê
lêlê, lêlê, lê gewrê
Kanya hêlê li Mezreqa
Enîya gewrê mi-b deqa
Enîya gewrê birevînim
Xwe bavêjin senceqa
Hay lê lê....
De lê lê lê lê gewrê.

Allegro



LÊ GIDYÊ

Lê gidyê, lê gidyê, lê gidyê can,
Lê gidyê, lê gidyê, lê k'awê can,
Gerden şûşê t'or mircan.
Lê gidyê, lê gidyê, lê gidyê can,
Gerden şûşê t'or mircan.

Lê gidyê, lê gidyê, lê k'awê can,
Gidya mine qîzîne,
Lê gidyê, lê gidyê, lê gidyê can,
Gidya mine qîzîne,
Lê gidyê, lê gidyê, lê k'awê can.

LÊ LÊ BEJNÊ

Ez û bejnê berhev ketin,
Lê lê bejnê, lê lê bejnê.

Ez û bejnê berhev ketin,
Dev û diran şekirê Şamê.

Rastê dosta xırab hatım,
Lê lê bejnê, lê lê bejnê.

Rastê dosta xırab hatım,
Dev û diran şekirê Şamê.

Bilınd fıriyam, nızım ketım,
Lê lê bejnê, lê lê bejnê.

Bilınd fıriyam, nızım ketım,
Dev û diran şekirê Şamê.

LÊ LÊ KINÊ

Lêlê kinê lê, lê, mala minê way way

Ez ne kinim lê, lê, pel dirêjim way way
Tak rihana lê, lê, pel dirêjim way way
Aqlê xortan lê, lê, ez tavêjim way way.

Ez ne kinim lê, lê, ne kinikim way way
Tak rihana lê, lê, pel hûrikim way way
Aqlê xortan lê, lê, sivik dikim way way.

Weyla kinê lê, lê, mala minê way way...

LÊ LÊ RUHÊ

Lê lê ruhê, ruhê mın i,
Tu şirigê emrê mın i,
Tu jinika mala mın i, emrê mın.
Tu şirigê emrê mın i,
Tu jinika mala mın i, emrê mın.
Bı şev, bı roj ez xew nakım
Jı eyb û şerman ez heyakım, ruhê mın.
Lê lê ruhê, ruhê mın i,
Avê bine ez ji ti me,
Çıma dibihisi ez birçi me, ruhê mın.

Lê lê ruhê, ruhê mın i,
Tu kevoka ser hêlinê,
Kela-kela vê havinê, ruhê mın.
Lê lê ruhê wê şırine,
Eşqa dılan dil xewine,
Xewên giran direvine.
Xewên şevan lı mın hesrete,
Car razaye rehm û bete,
Derdê dılan ne rehetê.

Allegretto

The image shows two staves of musical notation in 4/4 time. The first staff has a treble clef and a key signature of one flat. The melody consists of eighth and sixteenth notes. Below the first staff, the lyrics are: "Lê. lê. Wa - sê, lê. lê. lê, Wa - sî - na - ê, wey, wey." The second staff continues the melody with similar note values. Below the second staff, the lyrics are: "Lê. lê. Wa - sê, lê. lê. lê, Wa - sî - na - ê, wey, wey."

LÊ, LÊ, WASÊ

Lê, lê Wasê, lê, lê, lê, Wasinaê, wey, wey,
Te, p' orsorê, lê, lê, lê, h'ine dayê, wey, wey,
T' eşîrê, lê, lê, lê, çûre, wey, wey.
Mala Wasê, lê, lê, lê, mala wêda, wey, wey,
Wez radimûsim, lê, lê, lê, ji mala bavê, wey, wey.

LÊ MEYRO, MEYREMÊ

Erdik bi dare lê Meyro, Meyremê
Erdik bi dare, li erdikê rûmenê.
Gur tê bixare, lê Meyro, Meyramê
Gur tê bixare, li erdikê rûmenê
Çavê wî l'kare, lê Meyro, Meyremê
Çavê wî l'kare, li erdikê rûmenê
Erdik bi erxe lê Meyro, Meyremê
Erdik bi erxe, li erdikê rûmenê.
Gur tê bi çerxe, lê Meyro, Meyramê
Gur tê bi çerxe, li erdikê rûmenê
Çavê wî l'berxe, lê Meyro, Meyremê
Çavê wî l'berxe, li erdikê rûmenê
Erdik bi nîske lê Meyro, Meyremê
Erdik bi nîske, li erdikê rûmenê.
Gur tê bi tîske, lê Meyro, Meyramê
Gur tê bi tîske, li erdikê rûmenê
Çavê wî l'gîske, lê Meyro, Meyremê
Çavê wî l'gîske, li erdikê rûmenê
Erdik bi geze lê Meyro, Meyremê
Erdik bi geze, li erdikê rûmenê.
Gur tê bi leze, lê Meyro, Meyramê
Gur tê bi leze, li erdikê rûmenê
Çavê wî l'peze, lê Meyro, Meyremê
Çavê wî l'peze, li erdikê rûmenê

LÊ NAZÊ, NAZÊ NAZÊ

Nazê, navê du dîloka ye: Yek ji ber Paleyê re tê gotin û yek ji, di Bêlotê de tê gotin.

(Naza Palêvanan)

Lê Nazê, Nazê, Nazê
Şêrînê gerden gazê
Xwezî bi kesê te bixwazê
Yê di ber sînga te-d razê.

Navê naza min Fatê
Kember zivê toqatê
Mala paşê nava bî
Esker anî bi qatê.

Navê naza min Sisê
Kember kete ser kîsê
Mala paşê nava bî
Esker anî ji Bedlîsê.

LÊ NAZÊ! NAZÊ

Lê nazê, nazê, lê naza min!
Şêrînê gerdengazê delala min!
Xwezî bir kesê te bixwazê, lê naza min!
Ê d'ber sînga te-d razê, delala min!

Du çiya li Elmokê hene lê naza min!
Şîşe û Mengene ne delala min!
Zozanêd zeryên me ne, lê naza min!
Zozanêd zeryên me ne delala min!

Du çiya li Elmokê bilindin, lê naza min!
Şîşe û Mengene bilindin lê naza min!
Zozanêd zeryên gundin, delala min!

Lê nazê, nazê, nazê lê naza min!
Garden şûşa şîrazê delala min!



LÊ NAZO NAZÊLIÊ

Lê Nazo nazêliê,
Lê Nazo, lê Nazo,
Lê Nazo nazêliê,

Lê Nazo, sebrê dilan.
Lê Nazo, lê Nazo,
Lê Nazo, nazêliê,

Kih'êlê e'rebiê,
Lê Nazo, lê Nazo,
Lê Nazo, sebrê dilan.

Lê Nazo nazêliê,
Lê Nazo, lê Nazo,
Lê Nazo, sebrê dilan.

Ç'e'v reşê kaniê kila
Lê Nazo, lê Nazo,
Lê Nazo, sebrê dilan.



Gundû cînar çî ji mene,
Lê Nazo, lê Nazo,
Lê Nazo, sebrê dilan.



LEYLA

Tu bî dev i tu nazî k i Leyle Leyla
Keça Kurda çıqa rind i Leyla Leyla
Leyla Leyla Leyla
Leyla Leyla bhar e, dilê min zarezar e.
Leyla Leyla êvar e, lêvya te me de were
Leyla Leyla bhar e, dilê min zarezar e.

Tu kulilka çiyayê Kurdan Leyla Leyla
Tu dermanê dilê xortan Leyla Leyla...



LEYLA

Mi bihîstê t nexweşî, Leyla,
Çi bikim bextê min t'im reşe, Leyla,
Dilê min her dedr û kule, Leyla
Carekê nebûye geşe.

H'alê min eve, ez bi girî, Leyla
Çima dilo, tu bê sebrî, Leyla
Ew bîna te ez h'elandim, Leyla,
K'a sozê te, h'eya k'engê.

Delala min, tu p'ir başî, Leyla,
Tu mînanî sêva geşî, Leyla
Derdê dila ez h'elyam, Leyla,
Tê gilyê xwe ji mira bêjî.

Mi bihîstî tu nexweşî, Leyla,
Çi bikim bextê min t'im reşe, Leyla,
Dilê min her derd û kule, Leyla,
Carekê nebûye geşe.

Hêsttir ji ç'e'vê min têne xarê, Leyla
Wek xulxula ava baharê, Leyla,
H'alê min te kir bêxewê, Leyla,
Ç'e'wê min ji boy te şyarin.

LÊ NÛRÊ

Lê Nûrê, Nûrê, Nûrê, lêlê Nûrê,
Lê Nûrê, Nûrê, Nûrê, heyla Nûrê,
Biçûkê, bê qisûrê lêlê Nûrê
Biçûkê, bê qisûrê hay lê Nûrê

Porsorê, gulî hûrê lêlê Nûrê,
Porsorê, gulî hûrê hay lê Nûrê,
Qîza şêxê Bizgûrê lêlê Nûrê,
Qîza şêxê Bizgûrê hay lê Nûrê,

LEYLANÊ

Leylanê, ho bi Leylanê, ho bi Leylanê
Leylanê, ho bi Leylanê, rih û canê

Leylanê çima, çima, ho bi Leylanê
Leylanê çima, çima, sîng dermanê.

Halhala li nav geneka ho bi Leylanê
Halhala li nav genima sîng dermanê.

Fincana li dest hakima ho bi Leylanê
Fincana li dest hakima sîng dermanê.

Leylanê wesa, wesa ho bi Leylanê
Halhala li nav garisa sîng dermanî.

Fincana li dest fêrisa ho bi Leylanê
Fincana li dest fêrisa sîng dermanê.

LEYLO, LEYLO!

Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.

Leylo tê ji kanîya bi şirike
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.

Destek cêre, yek şerbike
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.

Te xerabkir mala lêwike
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.

Leylo tê ji kanîya jorîna
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.

Destek cêre, yek misîne
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.

Te xerabkir mala lêwîne
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.
Leylo tê ji kanîya nav rezo
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.
Lêv şêrinê dims û gezo
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.
Mêr şindole, evdal ezo
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo !
Leylo, Leylo xanimê canê.

LI BAXEMİN BU ZIWISTAN

Lı baxemin bu ziwistan
Hey dilberê te gulistan
Hey dilberê te gulistan
Çelmisi gul bax û bostan
Weran ezim malem xırap

Hey dilberê qe menale
Feqi'ye Teyra edi kale
Nexweşe pır pır bîhale

Tı hım gule hım rehane
Tı hım derde hım dermane
Tı hım derde hım dermane
Hım hakime hım lokmane
Weran ezim malim xırap


Hey dilberê qe menale
Feqi'ye Teyra edi kale
Nexweşe pır pır bîhale

Sıpaj nawe tera tene
Xalek'j xala ax gerdene
Xalek'j xala ax gerdene
Te birkirim tedan bine
Weran ezim malim xırap

Hey dilberê qe menale
Feqi'ye Teyra edi kale
Nexweşe pır pır bîhale

Wey dilberê te tu zani
Qulilk webu çiya û bani
Qulilk webu çiya û bani
Bılbıl pırskır Faqi kani
Weran ezim malim xırap


Andante



Wey.ma.lî.no. we.zê çe - wa bi.kim.



xwe vî di.lî, Li min, li min,




xwe ji vî di.lî, Gun - dî, ma - lî - no k'a - wa k'u.



.bar no - na stê - ra kev - ran qî - rê. E.man.pêş.ya hî - vê.



di - mil - mi - lî, Li min, li min.



li min, li min. di - mil - mi - lî.

LI MIN-LI MIN

Wey, malîno, wezê çewa bikim, xwe vî dilî.
Li min, li min, xwe ji vî dilî.
Gundî, malîno k'awa k'ubar nona stêra kevran qîrê.
Eman, pêşya hîvê dimilmilî.
Li min, li min, Li min, li min, dimilmilî.

Ax malîno, k'awa min yeke sore, spîye xûnşîrîne,
Li min, li min, xûnşîrîne.
Ay de min go, morî mircanê zenda zerda sor sipîne,
Li min, li min, sor spîne,
Gundî, malîno, de bira kes paşî-k'awa gozel nebân,
Em nazikin, em cindîne.

Ax malîno, k'awa min yeke ne kine, ne dirêje,
Li min, li min, ne dirêje,
Gundî, malîno, mîna ta rih'ana
Ser sûra Dîyarbek'îrêra şax bavêje,
Li min, li min, şax bavêje,

Ay lê dînê, de tu were ramûsanekê min k'eremke,
 Bira şîndo rûnê xwêra bêje,
 Li min, li min dînê,
 Wey lê dînê, wezê navê te nizanîm, dibêjim Hewê,
 Li min, li min, dibêjim Hewê,
 De dibê vê sibê mîrat'ê bilbilê, dixûnê sî û sê zimana,
 Li min, li min, zimanê kewê,
 Wê t'evê, dike zimanê kewe,
 Wey gundîno, welle, bille t'ucara t'erka vê rindê,
 Ç'e'v biruyê belek, vê bedewê nakin h'eya roja vê mirinê,
 Li min li min, li min.

Allegro

Lo. li min. li min. lo. bi li min.

Lo, li min, li min, wey. li min, Bav ke - ç'i - kê

na - de min. Lo, li min. li - min. wey. li min.

LO, LI MIN

Lo, li min, li min, lo, bi li min,
 Lo, li min, li min, wey, li min,
 Bav keç'ikê nade min,
 Lo, limin, li min, wey, li min.

Wê bi çawa bi halê min,
 Lo, li min, li min, wey, li min,
 Keç'ikê Cercerîsê,
 Lo, li min, li min, wey, li min.

K'imber zêrê T'ilbîsê,
 Lo, li min, li min, wey, li min,
 Radimûsim navê bi Sîsê,
 Lo, li min, li min, wey, li min.

Keç'ikê Camûşvanê,
 Lo, li min, li min, wey, limin,
 K'imber zêrê Rewanê,
 Lo, li min, li min, wey, li min.

Radimûsim navê bi Anê,
 Lo, li min, li min, wey, li min,
 Keç'ikê K'orbilaxê,
 Lo, li min, li min, wey, li min.

Ba lêdixê, baê Axbilaxê,
 Lo, li min, li min, wey, li min,
 Radimûsim te qazaxê,
 Lo, li min, li min, wey, li min.

LORI - LORI

Lori, lori, lori, lori,
Canêm heyran, malêm gori.
Ew ref-refê çûk û mûkan,
Ew xopanê çûk û mûkan.
Hêlin çêkir serkê qûçan.
Hêlin çêkir serkê qûçan.
Em dê herne tev Dêrsimê;
Ew mekanê zar û zêçan.

Lori, lori, lori, lori,
Canêm heyran, malêm gori.
Ew ref-refê qaz û mazan,
Ew xopanê qaz û mazan.
Hêlin çêkir serkê gazan.
Hêlin çêkir serkê gazan.
Em dê herne Diyarbekir;
Ew mekanê xal û xwarzan.

Lori, lori, lori, lori,
Canêm heyran, malêm gori.

LORKÊ

Lorkê, lorkê, lorkê, lorkê,
Xanimê lorkê.
Lorkê, lorkê, lorkê, lorkê,
Delalê lorkê.
Kêrê bine penir hûrkel
Xanimê lorkê.
Mın qurbana guliyê sor kel
Delalê lorkê.

Çûme mala apê Eli,
Xanimê lorkê.
Dani ber mın nan û çeli,
Delalê lorkê.
Çûme mala apê Mistê,
Xanimê lorkê.
Dani ber mın kilola pistê,
Delalê lorkê.

Lorkê, lorkê, lorkê, lorkê,
Xanimê lorkê.
Lorkê, lorkê, lorkê, lorkê,
Delalê lorkê.

LO ŞIVANO

Lo şivano lolo şivano
Dil bi kulo bi kovano
Serê dostê bi qurbano

Lo şivano lolo şivano
Dil bi kulo bi kovano
Serê dostê bi qurbano

Navê şivanê min Elî ye
Pez berda dora gelî ye
Keç dosta lawkê gundî ye

Lolo şivano,pez hêrhêr ke
Serî nêrî ser berjêr ke
Dost xeyîdye xwedê xêrke.

Navê şivanê min Emere
Pez berdaye dor mexere
Dost qurba, lawkê esmere

Lo şivano, lolo şivano
Dil bi kulo, bi kovano
Serê dostê bi heyrano.



LÛRKA-LÛRKA

Lorka, lorka, lorka, lorka
Lê xatûnê lorka
Mi- b xulama gulyê sorka
Lê bêmalê lorka.

Çûme mala Hemê Heso
Lê Xatûnê lorka
Liber min danîn nan û gezo
Lê Xatûnê lorka
Navê qîza malê Erzo
Lê bêmalê lorka.

Çûme mala Hemê Elî
Lê Xatûnê lorka
Liber min danîn nan û qelî
Lê bêmalê lorka.

Allergro



LÛRKE-LÛRKE

Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke, xanimê lûrke Çûme mala E'liê Kalê, xanimê lûrke
Min h'eyrana gulyê hûrke, Porsorê lûrke, Denî ber min qeliyê sêlê, P'orsorê lûrke

Kêrê bine penîr hûrke, xanimê lûrke Çûme mala xalê Bek'ir, xanimê lûrke
Min h'eyrana gulyê hûrke, Porsorê lûrke, Danî ber min h'eft p'ut şekir, P'orsorê lûrke

Çûme mala Hamîde Dişo, xanimê lûrke
Danî ber min nan û tirşo, P'orsorê lûrke

Moderato

Lûr- ke, lûr- ke, lûr - ke, lûr - ke. xa - tû - nê lûr - ke.

Lûr- ke, lûr - ke, lûr - ke, lûr - ke, Dil- be - rê lûr - ke,

Cû - me ma - la E' - iyê Me - t'ê, xa - tû - nê lûr - ke,

Hati- me ma - la E' - iyê Me - t'ê Dil - be - rê lûr - ke.

LÛRKE, LÛRKE XATÛNÊ, LÛRKE

Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke, xatûnê, lûrke,
Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke, Dîlberê, lûrke,
Çûme mala E'liyê Met'ê xatûnê, lûrke,
Hatime mala E'liyê Met'ê Dîlberê, lûrke.

Danî ber min goştê betê, xatûnê, lûrke,
Danî ber min goştê betê, Dîlberê, lûrke,
Min h'eram be vê de'watê xatûnê, lûrke,
Min h'eram be vê de'watê Dîlberê, lûrke.

Çûme mala E'liyê Bek'ir xatûnê, lûrke,
Hatime mala E'liyê Bek'ir Dîlberê, lûrke.
Danî ber min şîr û şekir, xatûnê, lûrke,
Ew h'eram be min te'm nekir, Dîlberê, lûrke.

Çûme mala E'liyê Besê xatûnê, lûrke,
Hatime mala E'liyê Besê Dîlberê, lûrke.
Danî ber min nanê p'arsê, xatûnê, lûrke,
Ew h'eram be nekir bêsê, Dîlberê, lûrke.



MALAN BAR KIR (*)

Malan bar kîr lê, lê, çûne waran lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn,
Malan bar kîr lê, lê, çûne waran lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

Ez kew nebûm lê, lê, qefes kîrîm lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn,
Ez kew nebûm lê, lê, qefes kîrîm lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

Sebi mame lê, lê, ber diwaran lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn,
Sebi mame lê, lê, ber diwaran lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

Ez hîrç nebûm lê, lê, kedi kîrîm lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn,
Ez hîrç nebûm lê, lê, kedi kîrîm lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

Goştîm xwarîn lê, lê, mîşk û maran lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn,
Goştîm xwarîn lê, lê, mîşk û maran lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

Ez din nebûm lê, lê, te ez din kîrîm lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn,
Ez din nebûm lê, lê, te ez din kîrîm lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

MALAN BARKIR

Malan barkîr lê, lê, çûne waran lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn.
Goştê me xwar lê, lê, mîşk û maran lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

Ez kew nebûm lê lê, kedi kîrîm lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn.
Paşla xweda lê lê, xwedi kîrîm lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

Ez din nebûm lê, lê, te ez din kîrîm lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn.
Ez hurç nebûm lê, lê, hula kîrîm lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

Deriyê muxtar lê lê, bı mîfteye lê,
Dinê lê, dinê lê, dinara mîn.
Keça muxtar lê lê, ne lı male lê,
Gewrê lê, rîndê lê, hevala mîn.

(*)1925 Şeyh Sait isyanından sonra, Kemalist yönetim tarafından 10 Haziran 1927 tarihli ve 1097 sayılı İskan Kanunu ile isyan bölgesi Kürtlerinin bir kısmı Anadolu içlerine doğru sürgün edilir. "Malan Bar Kır" türküsü, sürgüne gönderilenlerden geriye kalanların acı, çaresiz ve ümitsiz durumlarını hüzünle dile getiren bir türküdür.

Allegro

Mal me da-nîn wa-rê ber-fê, Lê, lê, ke-ç'i .kê,
Mal me da-nîn wa-rê ber-fê, La be - de - wê, rî - n - di - kê.

MAL ME DANÎN WARÊ BERFÊ

Mal me danîn warê berfê
Lê, lê, keç'ikê,
Mal me danîn warê berfê
La bedewê, rindikê.

De'wat gerya zurnê, defê,
Lê, lê, keç'ikê,
Govend gerya zurnê, defê
La bedewê, rindikê.

Te ç'e'vresê, sîng sedefê,
Lê, lê, keç'ikê,
Te ç'e'vresê, sîng sedefê,
La bedewê, rindikê.

De'wat gerya vê havînê
Lê, lê, keç'ikê,
Govend gerya vê havînê
La bedewê, rindikê.

Xew xaş bûne nav nivînê,
Lê, lê, keç'ikê,
Xew xaş bûne nav nivînê,
La bedewê, rindikê.

Te bi nazikê, nazefînê,
Lê, lê, keç'ikê,
Te bi nazikê, nazefînê,
La bedewê, rindikê.

MAMÎRO

Mamîr, Mamîr, Mamîr, Mamîro,
Mamîr, Mamîr, Mamîr, wezîro
Mamîr ji çiyê tê Mamîro
Bîna gula jê tê wezîro.

Xelkê dosta te bir Mamîro
Xwelî li serê te kir wezîro
Hespî qer li meydanê Mamîro
Sor bûye ji xwêdanê wezîro.

Allegro

Ma - mir. Ma - mir. Ma - mir, lo, Ma - mo,
Ma - mir. Ma - mir, Ma - mir, piz - ma - mo.

MAMO

Mamir, Mamir, Mamir, lo, Mamo,
Mamir, Mamir, Mamir, pizmamo.

Ava ji çîyê tê, lo, Mamo,
Ava ji çîyê tê, lo, kurmalo.

Nav gul û nêrgiza tê, lo, Mamo,
Nav gul û nêrgiza tê, pizmamo.

Bina yara jê tê, lo, Mamo,
Bina yara jê tê, lo, kurmalo.

Ava ji gêdûkê, lo, Mamo,
Ava ji gêdûkê, pizmamo.

Hêlûna ser ç'ûkê, lo, Mamo,
Hêlûna ser ç'ûkê, kurmalo.

Jê tê bîna bûkê, lo Mamo,
Jê tê bîna bûkê, pizmamo.

Xelqê yara te bir, lo Mamo,
Xelqê yara te bir, pizmamo.

Xelqê xasînga te bir, lo, Mamo,
Xelqê xasînga te bir, kurmalo.

MAMÛRO

Mamûr, mamûr, mamûra
Ketme kodê tenbûra
Ketme oda maqûla
Ketme devê sakûla
Yadê gidî li mamûra.

Mamûr hat û tirtirî
Li Metîna engirî
Xwedyê cezma çekurî
Eger cezma te qetya
Tê yeke dî bi çibkirî
Hûr û biçûkê te birî
Li gulka kumê te birî
Defîl dayê li mamûra.

Mamûr hatî ji Terê
Xwendî qoçana kerê
Mamûra li bextê te me
Kerê-m mexe defterê
Yadê gidî li mamûra.
Mamûr hatî ji Xirbika
Deftera kera ve ka
Terya kerê Xeliko
Dî qoşa jina xwe veka
Defîl dayê li mamûra.



Mem mir mem mir Me mo lo Me mo lo Me mo
pis ma mo

MEMO

Memmir, memmir, Memo,
Lo Memo, lo Memo,
Memmir, memmir, Memo,
Lo Memo, lo Memo,

Baxçê Memo rezi,
Lo Memo, lo Memo,
Baxçê Memo rezi,
Lo Memo, pismamo.

Baxçê Memo tiri,
Lo Memo, lo Memo,
Baxçê Memo tiri,
Lo Memo, pismamo.

Xelkê jina te bîr,
Lo Memo, lo Memo,
Xelkê jina te bîr,
Lo Memo, pismamo.

Bîn da marê tevîzi,
Lo Memo, lo Memo,
Bîn da marê tevîzi,
Lo Memo, pismamo.

Bîn da marê mîri
Lo Memo, lo Memo,
Bîn da marê mîri
Lo Memo, pismamo.

Xweli lî serê te kir,
Lo Memo, lo Memo,
Xweli lî serê te kir,
Lo Memo, pismamo.

Mîn tîrs e te bigezi,
Lo Memo, lo Memo,
Mîn tîrs e te bigezi,
Lo Memo, pismamo.

Mîn tîrs e te bigri,
Lo Memo, lo Memo,
Mîn tîrs e te bigri,
Lo Memo, pismamo.

MARŞA XORTÊN DÎMUQRAT

Em cîwanên welatî, haşîlî tîm divê bo cîhan
Tev pilingê xebatî, kirne yek zor û zilmên
giran

Tevde xortê cîwanîm
Serbilîndê cîhanî

Rabî bî bîn
Deng û gîrên

awazê xweş

Rabî.

Lî her derî xoşxwan dî bêjî cîwan
Her xebat, her weha..

Da cîhan tev zanîbî em ejdeha
Ejdeha..

Em cîwanî ev cîhan tev de qada me ye
Lî her derê xoşxwan dibêjî cîwan
Her weha..

Da cîhan tev zanîbî em ejdeha
Ejdaha..

Em jî bîr nakî tu carî, xwîna gernasê xwey
serbilînd

Em gîhan hevî neçarî, tev bîra ne xort û rînd

Bo bilindî herne pêş
Xurt û rindi herne pêş

Şêrên welat
Rabin xebat

Tev ser bilind

Rabin.

Pêşve naçin tu caran pêşveçun her divê bo
xebat

Naşikênin tu sozan distirêhîn ji bona welat

Bixne bin pê zorkeran

Bidne ber pê şerkeran

xortên civan

Bigrincihan

Saxbin bira

Sax bin.

Lî her cihî xoşxwan bibêjin civan

Her xebat her weha...

Da cihan tev zanibin em ejdeha

Ejdeha...

Em civanin ev cihan tevde qada me ye

Lî her cihî xoşxwan bibêjin civan

Da cihan tev zanibin em ejdeha

Ejdeha, Ejdeha...

Cigerxwîn

MASÎKO

Masîko perbeleko yar yeman.

Masîko perbeleko yar yeman, dost yeman

Vê avê şêlû meko yar yeman

Vê avê şêlû meko yar yeman, dost yeman

Yar gewre ji xew rameko yar yeman

Dost gewre ji xew rameko yar yeman, dost yeman.

Masîko perhêşîno yar yeman

Masîko perhêşîno yar yeman, dost yeman

Vê avê me çelqîno yar yeman

Vê avê me çelqîno yar yeman, dost yeman

Dost gewre me tirsîno yar yeman

Yar gewre me tirsîno yar yeman, dost yeman.

Allegretto

Me - li, Me - li Me - li, Me - li Me -
 -li Me - li, Me - li, sya - ro Me - li.

MELI

Meli, Meli, Meli,
 Meli, Meli, Meli,
 Meli, syaro, Meli.

Te'ji berda xezalê,
 Meli, Meli, Meli,
 Meli, syaro, Meli.

Xwezya ç'evê rindikê,
 Meli, Meli, Meli
 Meli, syaro, Meli

Mala Şênîê newalê,
 Meli, Meli, Meli,
 Meli, syaro, Meli.

Bû fitarê êvarê,
 Meli, Meli, Meli,
 Meli, syaro, Meli

MEMÊ Û E'YŞÊ

Andante

De la o o o o o
 o o o o o o o
 de la o la o la o la o lao
 day - ka Me - mî gu - ra çiya - be De

la - o. di - vê - î - sal h'ev.t sa - lê

Me - nê - ye. (û - ye

we.la - tê xe - rib.yê - ye.De E'y -

- şê k'a - xa - ze - kê di - ni -

- vi - se di - şî - ne pey Me - mē - ye. Di - vê - je

ne - se - ki - ne bi - ra lê - xe bê - ye. De

la.o - o - o - o - o - o - o - o - o -

- o, de la.o, la.o, la.o, la.o, la.o,

day - ka Me - mē gu.ra ç'îya - be.

MEMÊ Û E'YŞÊ

De lao, de lao, lao, lao, lao, lao,
Dayka Memê gura ç'îya be.
De lao, divê îsal h'evt salê Memêye,
Çûye welatê xerîyêye.
De E'yşî k'axazekê dinivîse dişîne pey Memêye,
Divêje- neseke bira lêxe bêye.
De lao, de lao, lao, lao, lao, lao,
Dayka Memê gura ç'îyabe.

De lao, k'axazê diçe dighîje Memêye,
Memê têye yalê malêyi
Qewazê rê nade Memêye,
Dibê: "H'eta neê îzna E'yşe xanimêye."
E'yşê derdik' eve derê malêye,
Dibê: "Çima betanê ç'e'vê we rijyabû,
Weê xerîbê min nas nekir?"
De lao, de lao, lao, lao, lao, lao,
Dayka Memê gura ç'îyabe.

Memê dibê: "E'yşê xanimêye,
Emê herne ditina Weta dêye."
E'yşê dibê: "Memê wez bi qurba,
Sibê silameti wemê mizgînika xêrê bidne Weta dîye."
Dinhêre destê morî, mircan daye ber serê xortî di xelqêye.
Divê bira xwedê birbire ît'bara di jinêye,
E'yşê digo ezê t'u cara pey Memêra,
Destê mori, mircana nadime ber serê xortê di xelqêye.
De lao, de lao, lao, lao, lao, lao,
Dayka Memê gura ç'îyabe.

De lao, digo wezê hildime t'ivingêye,
Dengê bûka minê belabe li dinêye.
Digo wezê hildim kevir sêrk'utêye,
Bira xwedê bibira qewata di jinêye.
De wezê soranyê bik'şînime li qabêye,
Daynime ser kevç'ika dilê xortê di xelqêye,
De bira soranî çar t'ilîkî bavê e'rdêye.
Qîrîni têk'eve E'yşêye, ne'lîni têk'eve Memêye,
Do bira hêja zanibe k'alîna wê berxêye.
De lao, de lao, lao, lao, lao, lao,
Dayka Memê gura ç'îyabe.

De lao, Memê lao, ha li Memêye, Diyarbek'ir,
 Sibê betanê ç'e'vê dayka te rijabûn,
 De wê çewa xeribê xwe nasnekir,
 Wezê li vêsibê dev diranê Mmê xwe dinhêrim,
 Ne welle mînanî çîl şekir,
 De lao, de lao, lao, lao, lao, lao,
 Dayka Memê gura ç'iyabe.

MEMYANÎ MEMO


Kemyanî memyanî Memo, memyanî kemyanî

Xwezî biskek bûma Memo, ji biskê berana
 Hûr hûr biçêryama Memo, li dora zozana
 Çavî li xewka şêrin Memo, destî li ser karbana.

Xwezî pezkek bûma Memo, ji pezkê nêriya
 Hûr hûr biçêryama Memo, li dora gelîya
 Çevî li xewka şêrin Memo, destê li ser morîya.

Xezka ez pezkek bûma Memo, ji pezkê berxika
 Hûr hûr biçêryama Memo, li dora tatika
 Çevî li xewka şêrin Memo, destê li ser morîka

Xwezka pezkek bûma Memo, jipezkê bizina
 Hûr hûr biçêryama Memo, li dora kizina
 Çavî li xewka şêrin Memo, destê li ser bazina



ME RÊ BERZE KIR

Gelê me kevn û merde
 Welatê me giyane
 Daxwaza me zêrerde
 Gundino ha gundino
 Nezani kul û derde
 Kul û derde nezani

Ulm; hîzîr û viyane
 Welatê me giyane
 Hewcene bo jîyanê
 Gundino ha gundino
 Şîni, me berzekîr rê
 Me berzekîr rê.

Zeneyên me kurdane
 Welatê me giyaye
 Kitêbên me çîrane
 Gundino ha gundino
 Xani pêşya hemyane
 Pêşya hemyaye Xani

MERIVÊ SOVYETÊ BIRANE

Mervê Sovyetê tamam birane,
Dilê temaman bı eşq û şan e,
Leninê mezin tım bira wan e.

Em ji partiya xwe gellek razine,
Qerarê partiyê ji mera mızgine,
Xêr û xweşiyê ji mera tine.

Em ji partiyê nakine gazin,
Edaleta wê gellek pır mezin,
Çawa qiz û xort usa ji mezin.

Merivê Sovyetê tamam birane,
Dilê temaman bı eşq û şane,
Leninê mezin tım bira wane.

MERŞA KARKERÊN VIYANA

Bı dil ketin em şerê jiyinê,
Em bı gavên pêt her pêşta dıçın.
Em lı paşiya vê rêya reş da
Bê şık rojhilata xweş dıbinın.

Derket ji paş çıyan,
Binêr, ew tê çawan!
Bibezın ber bı stêrka sor!
İdi ne xew ne ev,
Ne ji xeyal e ev,
Stêrka rızgarbûnê, ê sor!

Diya me bes refê karkeran e,
Welatê me ji hemû cihan e;
Emê bıkın şerê zor yê paşın,
Bı ser me ala me Leninizm e!

Bılındke ala me,
Pır û pır bılındkel
Rake ala me ber bı jor!
Em lı iro xının,
Em sıbê derxının,
Rabıkın hemû ref û qor!

Tu lı behra reş wek fanosek î,
Em bı ronıya te rê va dıçın;
Em lı paşiya vê rêya reş da
Benda rojhilatê dısekının.

Lı karxanan em ın,
Lı zeviyan em ın,
Em ın jiyinê çêdıkın!
Zıman yeke ji bo me,
Din yeke ji bo me,
Wek ji dê û bavek hatın!

MEYRÊ MEYREMÊ

Newal bı dare lê Meyrê Meyremê,
Gur tê bı xware nişana mın lı cemê.
Çavê gur lı kare lê Meyrê Meyremê,
Kar muxtara nişana mın lı cemê.

Newal bı heze lê Meyrê Meyremê,
Çolbi bı heze nişana mın lı cemê.
Gur tê bı leze lê Meyrê Meyremê,
Çavi lı peze nişana mın lı cemê.

Gur tê hêdiye lê Meyrê Meyremê,
Gur tê hêdiye tu lı erdê rumenê.
Çavê gur lı mi ye Meyrê Meyremê,
Mi ya cındiye lı erdê rumenê.



MEYRO Û SEYRO

Keç Meyrokê, Meyrokê,
Lê, lê, lê, lê Meyro,
Keç Meyrokê, Meyrokê,
Dım rım bona Seyro.

Keç Meyroka dımılı,
Lê, lê, lê, lê Meyro,
Keç Meyroka dımılı,
Dım rım bona Seyro.

Kesk û sor da xemılı,
Lê, lê, lê, lê Meyro,
Kesk û sor da xemılı,
Dım rım bona Seyro.

Derdê te ma lı vi dili,
Lê, lê, lê, lê Meyro,
Derdê te ma lı vi dili,
Dım rım bona Seyro.

Keç Meyroka Şıkaki,
Lê, lê, lê, lê Meyro,
Keç Meyroka Şıkaki,
Dım rım bona Seyro.

Kofiya te barê gaki,
Lê, lê, lê, lê Meyro,
Kofiya te barê gaki,
Dım rım bona Seyro.

Tu ji mın ra malê naki,
Lê, lê, lê, lê Meyro,
Tu ji mın ra malê naki,
Dım rım bona Seyro.

Allegro

Mi - laz - gir, ha Mi - laz - gir,
Mi - la - gir, ha Mi - laz - gir.

MILAZGIR

Milazgir, ha Milazgir,
Min govendêda bi naskir,
K'ofî xarbû min rastkir,
Werdekê gol xilaskir,
Ç'e'v dîtibû dil qeyaskir,

Werdekê ha bi werdekê,
Ser k'eskê, p'er belekê,
Berê xwe da bi Şebekê,
K'etîme qîrê xetayê,
Sev xatîrê ç'e'v belekê,

Werdeka bi devê bîra,
Bexika bi nav berdîra,
Te ez kuştîme pê tîra,
Memik bîna hejîra.

MIN DIBÊ HER TIM BİLINDBI

Mın dibê her tım bılındbi,
Ala rengin kesk û zer.
Hem xweşi hem ceng û rûmet,
Te hıldani sor û gewr.

Dûr nêzik ez dê te hıldım,
Tu yi xemla banê mın.
Ger dibê, derman mırınbe,
Bo te gori canê mın.

Dêrsım û Sason û Pijder,
Bo te xwinê dirêjın.
Her çı kurdın her çı xortın,
Bo te lawjan dibêjın.

Sê salan bı te kêf xweş bûn;
Ağrı, Zilan, Tendûrek.
Lı pêş rona te bûne ax,
Leşkerê rom leq bı leq.

(Osman Sebrî)



MISTO

Ha berde, berde, berde,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Ha berde, berde, berde,
 Mın go, teres, zendê zer berde.

Oda Misto li hember e,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Oda Misto li hember e,
 Mın go, teres, zendê zer berde.

Kevrê ortê mermer e,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Kevrê ortê mermer e,
 Mın go, teres, zendê zer berde

Yara Misto dilber e,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Yara Misto dilber e,
 Mın go, teres, zendê zer berde.

Oda Misto piçûk e,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Oda Misto piçûk ê,
 Mın go, teres, zendê zer berde.


Kêrangê ortê çûk e,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Kêrangê ortê çûk e,
 Mın go, teres, zendê zer berde.

Yara Misto piçûk e,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Yara Misto piçûk e,
 Mın go, teres, zendê zer berde.

Oda Misto hezizi,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Oda Misto hezizi,
 Mın go, Misto, destê mın berde.

Kêrangê ortê rizi,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Kêrangê ortê rizi,
 Mın go, teres, zendê zer berde.

Kê yara Misto dizi,
 Mın go, Misto, destê mın berde,
 Kê yara Misto dizi,
 Mın go, teres, zendê zer berde.



MIŞKÊ KÛR

Şûrkim he bû mîsrîlî bû,
Mînjî wî şûrî gîsnek çêkîr,
Şûrkîm he bû mîsrîlî bû,
Mînjî wî şûrî gîsnek çêkîr.

Herdû hêtan, herdû hêtan,
Herdû hêtan, bîşînin Botan,
Herdû hêtan, herdû hêtan,
Herdû hêtan, bîşînin Botan.

Hestiyê navê, hestiyê navê,
Hestiyê navê para zavê,
Hestiyê navê, hestiyê navê,
Hestiyê navê para zavê.

Mînbî wî gîsni gûtîk rakîr,
Mişkê koro xwe tê wekîr,
Mînbî wî gîsni gûtîk rakîr,
Mişkê koro xwe tê wekîr.

Herdû piyan, herdû piyan,
Herdû piyan bîdîn berbûyan,
Herdû piyan, herdû piyan,
Herdû piyan bîdîn berbûyan.

Hestiyê nûkê, hestiyê nûkê,
Hestiyê nûkê para bûkê,
Hestiyê nûkê, hestiyê nûkê,
Hestiyê nûkê para bûkê.

Tevran bînin bêran bînin,
Bêran bînin, mişk derînin,
Tevran bînin bêran bînin,
Bêran bînin, mişk derînin.

Ser û pêyan, ser û pêyan,
Ser û pêyan bîdîn gundiyan,
Ser û pêyan, ser û pêyan,
Ser û pêyan bîdîn gundiyan.

Ruviyê drêj, ruviyê drêj,
Ruviyê drêj para dengbêj,
Ruviyê drêj, ruviyê drêj,
Ruviyê drêj para dengbêj.

Bîvran bînin, kêran bînin,
Kêran bînin, mişk şerjêkîn,
Bîvran bînin, kêran bînin,
Kêran bînin, mişk şerjêkîn.

Hestiyê qûnê, hestiyê qûnê,
Hestiyê qûnê para xatûnê,
Hestiyê qûnê, hestiyê qûnê,
Hestiyê qûnê para xatûnê.

MÎRZEME-MÎRZEME

Mîrzeme mîrzeme, welle mîrzeme.
Mîrzeme mîrzeme, delal mîrzeme.
Genîmê lî dewsa cê me,
Welle mîrzeme.

Xîzêma pozê te me, welle mîrzeme.
Gustîla tîlya te me, bîlle mîrzeme,
Bazînê zenda te me, welle mîrzeme,
Mîrzeme mîrzeme delal mîrzemê.

Mîrzeme mîrzeme, delal mîrzeme.
Guharê guhê te me, keçê mîrzeme.
Mîrzeme mîrzeme, delal mîrzeme.

Mîrzeme mîrzeme, keçê mîrzeme,
Aşîqê bejna te me, welle mîrzeme.

Na li li nal ben dan ley lo ri şî li go
ven dan ley lo Nal ben do na lan çê ke
Te re so na lan çê ke

NALBEND Û SIWAR

Nali li nalbendan leylo,
rişî li govendan leylo,
Nali li nalbendan leylo,
rişî li govendan leylo.

Nalbendo nalan çêke,
Tereso nalan çêke.

Hûr-hûr bızmaran pê ke,
Hûr-hûr bızmaran pê ke.

Êvar e mın bı rê ke,
Êvar e mın bı rê ke.

Mın bı mivanê gewrê ke,
Mın bı mivanê gewrê ke.

Nali li nalbendan leylo,
rişî li govendan leylo,
Nali li nalbendan leylo,
rişî li govendan leylo.

Nalbendo nal piçûko,
Tereso nal piçûko.

Zeviko dor bı nûko,
Zeviko dor bı nûko.

Par qiz bû, isal bûko,
Par qiz bû, isal bûko.

Nali li nalbendan leylo,
rişî li govendan leylo,

Nali li nalbendan leylo,
rişî li govendan leylo.

Nalbendo nal mezino,
Tereso nal mezino.

Zeviko dor kijino,
Zeviko dor kijino.

Par qiz bû, isa jino,
Par qiz bû, isa, jına.

Nali li nalbendan leylo,
rişî li govendan leylo,
Nali li nalbendan leylo,
rişî li govendan leylo.

NARÊ

Narê narê hoy narê, narê
Narê narê hoy narê, şîrinê.
Narê çûye ber avê, narê
Kınc şuştî avêt tavê, şîrinê.

Kaniya li binya malan, narê
Şewq davêt gulyê daran, şîrine.
Me qet karê xwe nekır, narê
Sibê li me bû êvare, şîrinê.

Narê biskê xwe şe kıır, narê
Henekır, li destê xwe kıır, şîrinê
Sor-fıstan li bejna xwe kıır, narê
Serê dilanê xweş kıır, şîrinê.

Narê narê hoy narê, narê
Narê narê hoy narê, şîrinê
Narê narê hoy narê, narê
Narê narê hoy narê, şîrinê.

NAR HENAR

Genimê pîştâ dêrê yo,
Nar henar, nar henar, narina mîn.
Genimê pîştâ dêrê yo,
Nar henar, nar henar, şîrina mîn.

Mîn çinibû kêrê yo,
Nar henar, nar henar, narina mîn.
Mîn çinibû kêrê yo,
Nar henar, nar henar, şîrina mîn.

Herçi ki destê me bihev xe,
Nar henar, nar henar, narina mîn.
Dergevanê xêrê yo,
Nar henar, nar henar, şîrina mîn.

Genimê pîştâ mîzgeftê yo,
Nar henar, nar henar, narina mîn.
Genimê pîştâ mîzgeftê yo,
Nar henar, nar henar, şîrina mîn.

Mîn çinibû mîdretê yo,
Nar henar, nar henar, narina mîn.
Mîn çinibû mîdretê yo,
Nar henar, nar henar, şîrina mîn.

Herçi ki destê me bihev xe,
Nar henar, nar henar, narina mîn.
Dergevanê cînetê yo,
Nar henar, nar henar, şîrina mîn.

NARINÊ

Narinê hey narin, hey narin,
hey narin.
Narinê hey narin, delalê.

Narina çiyaye, hey narin,
hey narin.
Narina çiyaye, delalê.

Hewşa bavo bî darîk, hey narin,
hey narin.
Hewşa bavo bî darîk, delalê.

Bî çîre û mûmîk pê de, hey narin,
hey narin.
Bî çîre û mûmîk pê de, delalê.

Narinê bixemlinîn, hey narin,
hey narin.
Narinê bixemlinîn, delalê.

Ho negri narin negri, hey narin,
hey narin.
Negri zava xort e, delalê.

Narina çiyayi, hey narin, hey narin,
hey narin.
Narina çiyayi, delalê.

Nav gul û giyayi, hey narin,
hey narin.
Nav gul û giyayi, delalê.

Narinê hey narin, hey narin,
hey narin.
Narinê hey narin, delalê.

NARÛNÊ NARÛNA MÎN

Çi dara li nava dara
Narûnê, narûnê narûna min
Çi dara li nava dara
Kurtikê, rindikê, şêrîna min

Tefşokê dest necara
Narûnê, narûnê narûna min
Çedkim dergûşê yara
Kurtikê, rindikê, şêrîna min.

Çi dara belalûkê
Narûnê, narûnê narûna min
Tefşokê dest biçûkê
Kurtikê, rindikê, şêrîna min.

Çêdkim dergûşa bûkê
Narûnê, narûnê narûna min
Çêdkim dergûşa bûkê
Kurtikê, rindikê, şêrîna min.

NARÎNÊ HEY NARÊ

Hey narê narê narê
Hey narê narê narê
Sorgulê yemanê!
Min çavê belek xwarê
Narînê hey narê
Min çavê belek xwarê
Sorgulê yemanê.

Melazgir, xoş Melazgir
Narîne hey narê
Çavreşan çav qeyas kir
Sorgulê yemanê!
Me-b çavan hevdi naskir
Narîne hey narê
Me-b çavan hevdi naskir
Sorgulê yemanê.

Melazgir tim ava bi
Narînê hey narê
Melazgir tim ava bi
Sorgulê yemanê!
Ji çavreşa xalî nabî
Narînê hey narê
Ji çavreşan xalî nabê
Sorgulê yemanê.



NAV MENIYAN

Nav meniyan,
Nav meniyan, ben zırav,
Nav meniyan,
Nav meniyan, ben zırav.

Berfık bari serê çıyan,
Serê çıyan, ben zırav,
Berfık bari serê çıyan,
Serê çıyan, ben zırav.

Sê zeriyan dew dikiyan,
Dew dikiyan, ben zırav,
Sê zeriyan dew dikiyan,
Dew dikiyan, ben zırav.

Gışt rûniştın wer giriyan,
Wer giriyan, ben zırav,
Gışt rûniştın wer giriyan,
Wer giriyan, ben zırav.

Tu bı çûçıka nav darıkan,
Nav darıkan, ben zırav,
Tu bı çûçıka nav darıkan,
Nav darıkan, ben zırav.

Bervê çûm û xwe melisan,
Xwe melisan, ben zırav,
Bervê çûm û xwe melisan,
Xwe melisan, ben zırav.

Destan gırt û rû ramisam,
Rû ramisam, ben zırav,
Destan gırt û rû ramisam,
Rû ramisam, ben zırav.

Mın digo, bes e wê digo, disan
Wê digo, disan, ben zırav,
Mın digo, bes e wê digo, disan
Wê digo, disan, ben zırav.

NAZEWICIM

Kaniya mezın kaniya cılan,
Nazewcım, nazewcım.
Teşt û sitıl nava mılan,
Wellehi nazewicım.

Kaniya mezın pır biçûke,
Nazewcım, nazewcım.
Keleş gewra te zaroke,
Wellehi nazewicım.

Kaniya mezın ciki dûze,
Nazewcım, nazewcım.
Hemi gul û tev nêrgize,
Wellehi nazewicım.

Keçê çavê te kor bibe,
Nazewcım, nazewcın.
Mınra heye sebra dılan,
Wellehi nazewicım.

Par qız bû, isal bûke,
Nazewcım, nazewcım.
Derdê mın ewa biçûke,
Wellehi nazewicım.

NAZLÎË

Lê limin, lêlê limin, lê limin...
Lê limin, lêlê limin, lê limin nazlîyê
Kinikê çelebîyê lê nazlîyê
Lêlê limin lê limin nazlîyê
Biçûkê efendîyê lê nazlîyê
Lê limin, lêlê limin, lê limin nazlîyê.

Lê nazo sebra dila, nazlîyê
Lê limin lê, lêlê limin nazlîyê
Lê limin nazlîyê
Sîng gewrê, bexçê gula
Lê limin lêlê limin nazlîyê
Lê limin lê nazlîyê.

Lê lê limin lê nazlîyê.
Meskenê min û te ye
Lê lê limin, lêlê limin
Lê lê limin lê nazlîyê.

Heydê em heydî birevînin
Lê limin, lêlê limin
Lê lê limin lê nazlîyê
Xwe bavêjin nav Mila

Lê lê limin, lêlê limin
Lê lê limin lê nazlîyê.

Nisêbînê bi bexçeye
Lê lê limin, lêlê limin
Lê lê limin lê nazlîyê.
Gul û rihan têde ye
Lê lê limin, lêlê limin

NE LÎ MALE

Ne Imale hoy ne Imale, nermokê nermê ne Imale
Ne Imale hoy nelmale, delala xorta bêhale.

Hatim derî dadayî
Nermokê nermê ne Imale
Hatim derî dadayî
Delala xorta bê hale
Li ser doşekê paldayî
Nermokê nermê ne Imale
Li ser doşekê paldayî
Delala xorta bê hale
Min girt û ramûsayî
Nermokê nermê ne Imale
Min girt û ramûsayî
Delala xorta bê hale

NÊRGIZÊ

Lê nêrgizê, nêrgizê
Xwedê mêrê te-bkujê (kuzê)?
Şeva mêrê te bimrî
Ezê xwe-l te-bkim dizê

Lê nêrgizê koçerê
Teresbavê koçerê
Şêrinê reng esmerê
Êvarde ketme berê

Lê nêrgizê Hedayê
Teresbavê Hedayê
Mi-d pozê bavê gayê
Kanê soza te dayê
Tu-l pey soza xwe nayê.

NE LI MALE

Ne li male, ne li male oy oy oy oy
Ne li male, ne li male li min
Sebrê, te domamê.
Zava çû hemamê, oy oy oy oy
Zava çû hemamê li min
Keçikê, te domamê.
Nexweşe, bê hale oy oy oy oy
Nexweşe, bê hale li min
Gewrê, te domamê.
Ne li male, ne li male oy oy oy oy
Ne li male, ne li male li min
Sebrê, te domamê.
Zava çûye sûkê oy oy oy oy
Zava çûye sûkê li min
Gewrê, te domamê.
Tine hena bûkê oy oy oy oy
Tine hena bûkê li min
Keçikê, te domamê.
Ne li male (*Girêdan*)
Hene li teştê kîn oy oy oy oy
Hene li teştê kîn li min
Keçikê, te domamê.
Dest bûk û zavê kîn oy oy oy oy
Dest bûk û zavê kîn li min, keçikê te domamê.

NEMAYÊ - NEMAYÊ

Nemeyê, nemayê, nemayê....
Ezê pişti delalê dilê xwe ra neminim li heyatê,
li dem û li dewran û li dinyayê.
Delalo! dilê min ser delalê min ra minani bızmiya,
li ser berfê kale-kale.
Sibê bû, ji me ra cabeki ne bi xêr dihati,
digotin: delalê dilê te welatê xerib û xurbetê
nexweş û pîr bêhale.

Ez rebena xwedê dikim rabim, herim welatê xerib
û xurbetê, ji delalê dilê xwe ra bîbim ci û
yatax û balif û berpêle.

Ezê xizêma pozê xwe jêkîm, ji hespê delalê dilê
xwe ra bîkîm nal û pîsmare.
Bîla li welatê xerib û xurbetê nebêjin aveki
sare, bî pergele.

Nemayê, nemayê.... pişti delalê dilê xwe ra
neminim li dem û li dewran û li dinyayê.

Nemayê, nemayê.....
Delalo! delalê dilê min di xwe da ye, qêmiş
nabim delalê dilê xwe ji xew rakim.

Ezê dikim rabim, herim Hemisê, Nemayê, Musilê,
Bexdayê coteki şalûl û bîlîl ji delalê dilê
xwe ra karkim.
Ez van şalûl û bîlîlan binim, li ser delalê
dilê xwe da dardakim.

Bi sehera sibê ra, bi dengê dengbêjanra, lûre-
lûra bîlûra bîlûrvan ra, hoke-hoka defçiyê ber
dewaran ra, bi sewta xortê kurdanra ezê bi tîlê
û tembûrê delalê dilê xwe ji xew rakim.

Ezê dikim serê bav û bîra û dê û pîsmam û heval
û hogir û hemû ciranani bi qurban kim...

Nemayê, nemayê.. ezê pişti delalê dilê xwe ra
neminim li dem û li dewran û li dinyayê.



Ner mê Ner mê Ner ma nê lê Ner mê Ner mê Ner ma nê

şev ger ya dî lê xor ta nê

NERMÊ

Nermê, Nermê, Nermanê
Lê Nermê, Nermê, Nermanê,
Nermê, Nermê, Nermanê
Şevgerya dilê xortanê.

Hermê piştik dar ani,
Lê Nermê, Nermê, Nermanê,
Nermê piştik darmani,
Şevgerya dilê xortanê.

Semta bêderê dani,
Lê Nermê, Nermê, Nermanê,
Semta bêderê dani,
Şevgerya dilê xortanê.

Nermê qiza keşîş e,
Lê Nermê, Nermê, Nermanê,
Nermê qiza keşîş e,
Şevgerya dilê xortanê.

Paşîl tiji mewij e,
Lê Nermê, Nermê, Nermanê,
Paşîl tiji mewij e,
Şevgerya dilê xortanê.

Piştî xwe da gi tês e,
Lê Nermê, Nermê, Nermanê,
Piştî xwe da gi tês e,
Şevgerya dilê xortanê.

Nermê yêka dirêj e,
Lê Nermê, Nermê, Nermanê,
Nermê yêka dirêj e,
Şevgerya dilê xortanê.

Xwe li govendan davêj e,
Lê Nermê, Nermê, Nermanê,
Xwe li govendan davêj e,
Şevgerya dilê xortanê.

Dilê lawîkan dipêj e,
Lê Nermê, Nermê, Nermanê,
Dilê lawîkan dipêj e,
Şevgerya dilê xortanê.

NEWROZ

Ey Newroz cejna Kurdê qehreman
Her piroz tîm li Kurd û Kurdistan.
Hîldin jor, jor, jor ala rengin bê hîldan
Natewê, nakevê, naşîkê, namîrê..
Milletê kur namîrê.
Aaaaaaaa.....aaaaaaa.....
aaaa.....aaaaaa..

Tarîxa xebata ewil milletê Kurdan bû nas
Zor birinek kîrîbû kêmket û pê me
ber û xwas.
Ew Kawa ye bûye mêr, hat millet ji kîr xelas.
Natewê, nakevê, naşîkê, namîrê...
Milletê Kurd namîrê.

serdor

Iro ew bayê hênîk wan çiçek kirne jiyinê,
Her cihî seyran û her der jî kêfa dixwinê.
Newroz Kurd lî te piroz, çî xweş ew jî mizgine
Natewê, nakevê, naşîkê, namirê...
Milletê Kurd namirê.

serdor

Ber millet tev zanîbîn, Kurd xebatê nadîn xewê,
Tîm egîr û şîyar lî ber dijîmîn tu car narevê.
Serfîraz lî her cihî, Kurdîstanê bîmîni
Natewê, nakevê, naşîkê, namirê...
Ey Newroz cejna Kurdê gehreman (*Girêdan*)

NEWROZ

Newroz e newroz e sibe ye newroz e,
Maçek bîde mîn yar, cejna te piroz e.
Newroz e bîhar e belbûne gul û dar e
Bîna gul û lale dest mîn bî dest yar e.
Newroz e newroz e sibe ye newroz e,
Maçek bîde mîn yar, cejna te piroz e.
Newroz û mîzgin e, bîhara bengîn e,
Kesk û zer û heşîn e, kani çya rengîn e.

NÎNA NÎNA NÎNAYÊ

Nîna, nîna, nînayê,
Nîna gundê me nayê.
Çîbkîm malê dinyayê,
Pêra sebra mîn nayê.

Welleh govend ranabe,
Billeh govend ranabe.
Xweli lî mêrê xîrab bel!
Mêrê xîrab ezab e,
Radîkev, şîyar nabe.
Loy, loy, lo lo loy,
lo lo loy.

Ewa hat û ewa çû,
Şîyar hat û peya çû.
Çavê mîn l' çavê reş ket,
Eqîl û sevda pêra çû.

Welleh govend ranabe,
Billeh govend ranabe.
Xweli lî mêrê xîrab bel!
Mêrê xîrab ezabe,
Radîkev, şîyar nabe.
Loy, loy, lo lo loy, lo lo loy.
Ber çem, ber çem dîçûme,
Benîştê xwe dîçûme.
Xelq aşîqê mîn bûye,
Dayîkê sûcê mîn çî ye?

Welleh govend ranabe,
Billeh govend ranabe.
Ha dî ci da, dî ci da,
Mala apê Heci da.
Neci jîna xwe berda,
Fato mendîl girêda.

Mîn dî lî gîrîftîlî,
Eynîk dani, xemîlî.
Xwezi mî sebra xwe bîdîta
Lî ser gewra (cara) ewîlî.

Nîna, nîna, nînayê,
Nîna gundê me nayê.
Çîbkîm malê dinyayê,
Pêra sebra mîn nayê.

Welleh govend ranabe,
Billeh govend ranabe.
Xweli lî mêrê xîrab bel!
Mêrê xîrab ezabe,
Radîkev, şîyar nabe.
Loy, loy, lo lo loy, lo lo loy.

Allegro

Nĭ - nik Nĭ - na - ê te - me,
Ç'e'v - řeř mê - va - nê te - me.
ha. ha, ha, Nĭ - no. Nĭ - no. Nĭ - no.
ha. ha. ha. Nĭ - no.

NĪNIK NĪNAĒ TEME

Nĭnik Nĕnaĕ teme, ha, ha, ha, Nĭno,
Ç'e'vreř mĕvanĕ teme, ha, ha, ha, Nĭno,
Nĭno, Nĭno, Nĭno, Nĭno.

Ařiqĕ bejna teme, ha, ha, ha, Nĭno,
Deqa ser řingĕ teme, ha, ha, ha, Nĭno,
Nĭno, Nĭno, Nĭno, Nĭno.


Sibĕ ser řĕka xweme, ha, ha, ha, Nĭno,
Dusibĕ cĭnarĕ teme, ha, ha, ha, Nĭno,
Nĭno, Nĭno, Nĭno, Nĭno.

Bazinĕ destĕ teme, ha, ha, ha, Nĭno
Gustĭlka t'ilya teme, ha, ha, ha, Nĭno,
Nĭno, Nĭno, Nĭno, Nĭno.

NĪNIM NĪNIM NĪNAYĒ

Ninim ninim ninayĕ, hoy lı mın
Ninim ninim ninayĕ, toy lı mın.
Qiza mirĕ serayĕ, hoy lı mın,
Qiza mirĕ serayĕ, toy lı mın.
Kofi j' zĕran hĭlnayĕ, hoy lı mın,
Kofi j' zĕran hĭlnayĕ, toy lı mın.
Hesenqele ber ħeme, hoy lı mın,
Hesenqele ber ħeme, toy lı mın.
Ser mera lĕme-lĕme, hoy lı mın,
Ser mera lĕme-lĕme, toy lı mın.
Hesenqele ber řĕye, hoy lı mın,
Hesenqele ber řĕye, toy lı mın.
řer bŭ řerĕ dinĕ ye, hoy lı mın,
řer bŭ řerĕ dinĕ ye, toy lı mın,
Ninim ninim ninayĕ, hoy lı mın,
Ninim ninim ninayĕ, toy lı mın.

Moderato



Nî - nim, Nî - nim, Nî - na - yê, hoy li - min.



Nî - nim, Nî - nim, Nî - na - yê, t'oy li - min.

NÎNIM, NÎNIM, NÎNAYÊ

Nînim, Nînim, Nînayê, hoy limin,
Nînim, Nînim, Nînayê, t'oy limin.

H'esenqeale ber p'îye, hoy limin,
H'esenqeale ber p'îye, t'oy limin.

Qîza mîrê Serayê, hoy limin,
Qîza mîrê Serayê, t'oy limin.

Şer bû şerê suniya, hoy limin,
Şer bû şerê suniya, t'oy limin.

H'esenqeale ber ç'eme, hoy limin,
H'esenqeale ber ç'eme, t'oy limin.

Xûnê daye zenguya, hoy limin,
Xûnê daye zenguya, t'oy limin.

Ser mera leme-leme, hoy limin,
Ser mera leme-leme, t'oy limin.



Nî - nim, Nî - nim Nî - na - rê hay, Nî - na - rê , ha Nî - na - rê.

NÎNIM, NÎNAR

Nînim, Nînim, Nînarê hay,
Nînarê, ha Nînarê.

Nînik keç'a Dewrêşî,
Delal keç'a Dewrêşî.

Te serî ç'e'vanî,
Nînarê, ha Nînarê.

Nînim, Nînim, Nînarê hay,
Dewranê, dinyaê!

Te serî qerep'oşî,
Nînarê, ha Nînarê.

Tu zer memika nedanî,
Nînarê, ha Nînarê.

Min danîbû ser banî,
Nînarê, ha Nînarê.

Tu zer memika na'froşî,
Nînarê, ha Nînarê?

Avirê ç'e'va te danî,
Nînarê, ha Nînarê.

Nînik keç'a delalî,
Nînik keç'a delalî,

NOFA NOFELÊ

Lê nofa nofa nofa..
Lêlêlê lêlê lêlê lê nofa!
Lêlê lêlê lê nofa!

Rêka Çûlê bi ecûre
Lêlêlê lêlê lê..
Lêlêlê lêlê lê nofa
Sîngê te bi deqê hûre
Lêlêlê lêlêlê lêlêlê lê nofa
Lêlêlê lêlê lê nofa
Mîna bexçê Zinarê
Ji xorta re destûre
Lêlê hey lêlê lê nofa.

Rêka Çûlê bi şebeşe
Lêlêlê lêlêlê lêlêlê
De lêlêlêlê lê nofa
Sîngê te bi deqê reşe
Hey lêlêlê lêlê lê nofa
Ramûsankê bi min de
Li mala bavê çî xweşe
Lêlê lêlê lêlê le nofa..
Min dî li bîra Bamiştê
Lêlê.....
De lêlê lêlê lê nofa
Ez rûniştîm teniştê
Lêlê lêlê lêlê lê nofa
Min destê xwe kir ber piştê
Jê tê bihna bihiştê
Lêlêlê lêlê lê nofa.



ORDEK

Ez ordekîm , ordekîm,
Lê, lê ordekê , ordekê,
Ez ordekîm , ordekîm,
Memîk şemalê şevê o.
Ez ordeka golan îm,
Lê, lê ordekê , ordekê,
Ez ordeka golan îm,
Memîk şemalê şevê o.
Şev û rojan çolan îm
Lê, lê ordekê , ordekê,
Şev û rojan çolan îm
Memîk şemalê şevê o.
Dosta lawîkê şal reş îm,
Lê, lê ordekê, ordekê,
Dosta lawîkê şal reş îm,
Memîk şemalê şevê o.

Ez ordeka seri sor îm,
Lê, lê ordekê, ordekê,
Ez ordekîm seri sor îm,
Memîk şemalê şevê o.
Şev ûrojê dîpalîm,
Lê, lê ordekê , ordekê,
Şev û rojê dîpalîm,
Memîk şemalê şevê o.
Dosta lawîkê çux sor îm,
Lê, lê ordekê, ordekê,
Dosta lawîkê çux sor îm,
Memîk şemalê şevê o.

Ez ordeka seri reş îm,
Lê, lê ordekê , ordekê,
Ez ordeka seri reş îm,
Memîk şemalê şevê o.
Şev û rojê dîmeşîm,
Lê, lê ordekê, ordekê,
Şev û rojê dîmeşîm,
Memîk şemalê şevê o.
Dosta lawîkê keleş îm,
Lê, lê ordekê, ordekê,
Dosta lawîkê keleş îm,
Memîk şemalê şevê o.



PAR QIZ BÛ

Newala gundê me bı dar e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın,
Newala gundê me bı dar e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın,

Daran gırto hınar e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın,
Daran gırto hınar e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın.

Par qız bû isal bı yar e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın,
Par qız bû isal bı yar e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın.

Newala gundê me bı gûz e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın,
Newala gundê me bı gûz e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın.

Cılan dayne bın gûz e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın,
Cılan dayne bın gûz e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın.

Par qız bû isal bı soz e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın,
Par qız bû isal bı soz e,
Şekîrê hê, şerbetê hê, şîrina mın.

PERÎZADE

Perizade lê perizade,
Perizade lê perizade.

De tu rabe lû perizade!
De tu rabe lê perizade!

De tu rabe lê perizade!
De tu rûne lê, bîskan bade!

Qızık ramûsanî nade,
Qızık ramûsanî nade.

Perizade lê perizade,
Perizade lê derî veke!

De tu rûni lê, de tu rûni!
De tu rûni lê, gulyan çêke!

Tu bı xebera, tu bı xebera,
Tu bı xebera xelqê meke.

Tu mın nava lê singê xwe ke,
Tu mın nava lê singê xwe ke.

Perizade lê perizade,
Perizade lê perizade.

PÎR BÛM

Pîr bûm dil pîr nabî
Wey malê-m dil
Pîr bûm dil pîr nabî
Wey emrê-m dil.

Şahê Ecem rabî
Hay, hay, hay dil
Şahê Ecem rabî
Wey emrê-m dil.

Dil ket ra lê nabî
Hay, hay, hay dil
Dil ket ra lê nabî
Wey emrê-m dil.



QERSA ŞEWITÎ

Xanê lê, canê lê, Qersa şewti lî van deran,
Xanê lê, canê lê, Qersa şewti lî van deran.

Xanê lê, canê lê, herb xweş kîrîn bî xençeran,
Xanê lê, canê lê, herb xweş kîrîn bî xençeran.

Xanê lê, canê lê, Qers fîrotî bî peran,
Xanê lê, canê lê, Qers fîrotî bî peran.

Xanê lê, canê lê, Qersa şewti lî van çîyan,
Xanê lê, canê lê, Qersa şewti lî van çîyan.

Xanê lê, canê lê, herb xweş kîrîn bî singûyan.
Xanê lê, canê lê, herb xweş kîrîn bî singûyan.

Xanê lê, canê lê, Qers fîrotî bî mecîdîyan,
Xanê lê, canê lê, Qers fîrotî bî mecîdîyan.

Xanê lê, canê lê, Qersa şewti lî ber pişt e,
Xanê lê, canê lê, Qersa şewti lî ber pişt e.

Xanê lê, canê lê, şûrê lawîk serî xîşt e,
Xanê lê, canê lê, şûrê lawîk serî xîşt e.

Xanê lê, canê lê, koka dijîmî damîşt e,
Xanê lê, canê lê, koka dijîmî damîşt e.

Qı zil Eh med bı da re gu lê
gul na rin na rin na rin
ez kı lê ça vê te me

QIZIL EHMED

Qızıl Ehmed bı dar e,
Gulê gul narın, narın, narın,
Qızıl Ehmed bı dar e,
Gulê ez kılê çevê te me.

Daran gerandi nare,
Gulê gul narın, narın, narın,
Derdê m keçıka muxtare,
Gulê ez kılê çevê te me.

Derdê m keçıka muxtar e,
Gulê gul narın, narın, narın,
Derdê m keçıka muxtare e,
Gulê ez kılê çevê te me.

Qızıl Ehmed bı bi ye,
Gulê gul narın, narın, narın,
Qızıl Ehmed bı bi ye,
Gulê ez kılê çevê te me.

Bıyan gerandi si ye,
Gulê gul narın, narın, narın,

Bıyan gerandi si ye,
Gulê ez kılê çevê te me.

Derdê m keçıka Cındi ye,
Gulê gul narın, narın, narın,
Derdê m keçıka Cındi ye,
Gulê ez kılê çavê te me.

Qızıl Ehmed bı merx e,
Gulê gul narın, narın, narın,
Qızıl Ehmed bı merx e,
Gulê ez kılê çavê te me.

Merxan gerandi çerx e,
Gulê gul narın, narın, narın,
Merxan gerandi çerx e,
Gulê ez kılê çavê te me.

Derdê m keçıka Zelx e,
Gulê gul narın, narın, narın,
Derdê m keçıka Zelx e,
Gulê ez kılê çavê te me.

RABE COTYAR

Rabe cotyar
Delo rabe
Bıçine erdê
Çol û beyar

Ber destê hewe cotyar
Xelkê hemıyan
Nanê xwe xwar

Çol bı dengeki cotyara
Tova bavê wan beyara
Erdê we yê kesî nıne
Nedine zalimê cara

Gırêdan

Evan derdan, şvan halan
Paşve bîrbû gelek salan
Derdê meye nav me nêma
Em neman cotyarê tene

Gırêdan

Eman nav erdê xwe sorke
Nanê hemıyan jê peydake
Pê zarokê me azad ke
Derdê me ji nav me rake,

Gırêdan

RINDA MIN

Rında mın, ha rında mın.
Rında mın, çav reşa mın.

Şerman ra rê nabine,
Rında mın, ha rında mın,
Rında mın, çav reşa mın.

Rında mın, ha rında mın.
Rında mın, çav reşa mın.

Rında mın avê tine.
Rında mın, ha rında mın,
Rında mın çav reşa mın.

Rında mın, ha rında mın.
Rında mın, çav reşa mın.

Xortê xelqê dixapine.
Rında mın, ha rında mın.
Rında mın, çav reşa mın.

Rında mın, ha rında mın.
Rında mın, çav reşa mın.

Hûrîk-hûrîk dirêjine,
Rında mın, ha rında mın.
Rında mın, çav reşa mın.

Rışiyê şarê dihejine,
Rında mın, ha rında mın.
Rında mın, çav reşa mın.



RINDÊ

Rında mın, ha Rında mın,
Çavê reş bexşişa mın,
Rında mın, ha Rında mın,
Çavê reş bexşişa mın.

Rında mın avê tine,
Rında mın, ha Rında mın,
Rında mın avê tine,
Çavê reş bexşişa mın.

Ba lî bîskan dixine,
Rında mın, ha Rında mın,
Ba lî bîskan dixine,
Çavê reş bexşişa mın.

Jî şerman rê nabine,
Rında mın, ha Rında mın,
Jî şerman rê nabine,
Çavê reş bexşişa mın.

Pê bî pêl dirîjine,
Rında mın, ha Rında mın,
Pê bî pêl dirîjine,
Çavê reş bexşişa mın.

Rında mın çû kaniyê,
Rında mın, ha Rında mın,
Rında mın çû kaniyê,
Çavê reş bexşişa mın.

Gulî ketin paniye,
Rında mın, ha Rında mın,
Gulî ketin paniye,
Çavê reş bexşişa mın.

Rında mın çû bêriyê,
Rında mın, ha Rında mın,
Rında mın çû bêriyê,
Çavê reş bexşişa mın.

Heyrana te zeriye,
Rında mın, ha Rında mın,
Heyrana te zeriye,
Çavê reş bexşişa mın.

Allegro

Sa-rê, fa be ê-va-fe, meh-bû-bê fa-bê ê-va-re,
Sa-rê tu Sa-ra-mi-ni lo Sa-rê tu Sa-ra-mi-ni.

SARÊ, RABE

Sarê, rabe êvare,
Meh'bûbê rabe êvare,
Sarê, tu Sara minî lo,
Sarê, tu Sara minî.

Sîka girtî dîware lo,
Sî dak'tine zinare,
Kese gundê me tune lo,
Jî xênia me dost û yare.

Min bi xulama gerdenê lo,
Şêbiskê meqes kirî,
Şêbiskê meqes kirî jo,
Dor sibêla herbêlî.

Goşt qelanê Merdînê lo,
Li ser nanê genimê,
Kofî girêdan li êniê,
Pêş mala sore pêşinê.

Sarê qîza xelqê bû,
Muh'beta dilê min k'etiê
Min bi xulama gerdenê lo,
Muh'beta dilê min k'etiê.

SARÊ RABE ÊVARE

Sarê rabe êvare, mehrûmê rabe êvare.
Siyê girtî zinare lê, si daketi diware.
Kesek li gundê me tune lê, şûna me dost û yare.
Ez heyrana çavê reş lê, şebiskê wê kiware.

Sarê têye j' bêriyê, mehrûmê têye j' bêriyê.
Elba şîr daye siyê, mehrûmê têye j' bêriyê.
Sarê qîza xelqêye, muh'beta dilê ketiyê.
Sarê tu Sara mîn i, mehrûmê tu kara mîn i.

Sarê têye ji girda, mehrûmê têye ji girda.
Elba kenêr dî mil da, mehrûmê têye ji girda.
Potina reşo dî ling da, mehrûmê têye ji girda.
Dikim Sarê ramisim lê, tırki-mırki xeberda.

Sarê tu Sara mîn i, mehrûmê tu kara mîn i.
Sarê tu Sara mîn i, mehrûmê tu kara mîn i.

(Kuştina) SEÎDÊ EHMED

Eyşo digo, Wesîla! lê lawo!
Bejna Seîdê min zirave,
Kûlîlka vê Sibatê,
Bere şîn nerika li şikefta xopan
Li serê latê!
Misto! Lawo! Tu ocaxî korbî!
Te li me windakirî gulçîçeka
nav civatê.

Wesîla digo, Eyşo rebenê!
Dilê min heye, sed carî bi min weye!
Tu rabe, emê teyara binya mala,
Ji ciwanîkê bavê Ehmedê min re bikin ceye!
Ezê neketime xema kuştina bavê Ehmed,
Kuştin, kuştina mêra ye, dayê!
Lê ezê ketime xema wê xemê,
Xelkê, siba bêjin: dilê Wesîla û Misto
dihev heye! Dayê!...

SERPÊHATÎYA BIŞARÊ ÇETO

Çeto digo, lolo Bişaro lo lawo!
Bi serê bavê xwe û te kim, tu nezanî,
Roja çemê Mirdêsîke, li kaviîlê mala wendo,
Li ber cendirmê Sêrtê dest hilnanî.

Bişar digo, bavo de bese! te bi tan
û niçan rihê kurê xwe deranî,
Ma di bîra te nayê,
Li dereca têlanê minê ji nav lepê
cendirma bi darê zorê tuderanî,
Daketim mêga Tengeliê,
minê başbazirganekî giran
Ji bavê xwe re anî,
Bi çemê Şêrwan ketibûm,
Minê sê kurê Mehmûdê Şemê kuştibûn
û min qesabxana mêra li mala
Mihemedê Bişar danî,
Wele ezî destvala bûm,
Tali' û fersenda xerab ji kurê te re anî.

Çeto digo, Bişaro lo lawo!
Bejna te zirave kulfika va kuncîya,
De bere şîn nekira li kaviîlê mala Wendo,
Li çemê Mirdêsîkê li bilind çiya,
Kurê mino, minê ji te re negotibû?

Xwe navêja mala Osmanê emê,
Bere te nekî şivanê pey kerîya,
Xwezî mizgîna kuştina bavê Şebo
Ji min re bihatana
û xelkê negota, Bişarê Çeto
bûye esîrê destê kûçikên van Romîya.

Çeto digo, Bişaro lo lawol
Ezê bi çemê Mirdêsîkê diketim wa bi şuje,
Dengê mewzerê cendirmê Ridwanê helawxwerê
di sêrtê li ser serê bavê Şebo
girtî dûman û mijê,
Kesî ecebê giran bi çavê serê xwe nedî bûn,
Çawa helawxwerekî Sêrtî mêra ji mala
Hisîyê Qasim bikujel!...

SERÊ ÇIYA BI DÛMANE

Serê çiya bî dûmane, bavê mîn.
Birin kûre, bê dermane, berxê mîn.
Gelo çîma em xîzanî?
Megri, megri û manale,
Megri, megri ev çi hale,
Megri, megri şin zewale,
Megri, megri...
Va rîya me rêki tenge, bavê mîn.
Jî xew rabin wext derenge, berxê mîn.
Hişyar bibin sibê cenge;
Megri... (*Girêdan*)
Van zinciran biqetinî bavê mîn!
Vê tariyê biçirînin berxê mîn!
Karker rabin em hêvinî.
Megri... (*Girêdan*)
Ev barê te li milê me ye, bavê mîn.
Bîrina te li dilê me ye, berxê mîn.
Şev ê biçê, beri sibe ye;
Megri... (*Girêdan*)
Tekoşin wê dewam bike, bavê mîn.
Jî bo çi ye baş fam bike, berxê mîn.
Bawer jî xwe ra qurban bike!
Megri... (*Girêdan*)

SERÊ MALAN DAREK LÊ

Serê malan darek lê lê, darek lê
Binê malan darek lê lê, darek lê.
Her malek da yarek lê lê, yarek lê,
Her xanek da yarek lê lê, yarek lê.
Serê yarê şarek lê lê, şarek lê,
Serê yarê şarek lê lê, şarek lê.

Serê malan guzek lê lê, guzek lê,
Binê malan guzek lê lê, guzek lê.
Her malek da qizek lê lê, qizek lê,
Her xanek da qizek lê lê, qizek lê.
Serê qizê zêrek lê lê, zêrek lê,
Serê qizê zêrek lê lê, zêrek lê.

Serê malan nokek lê lê, nokek lê,
Binê malan nokek lê lê, nokek lê.
Her malek da bûkek lê lê, bûkek lê,
Her xanek da bûkek lê lê, bûkek lê.
Serê bûkê mûrek lê lê, mûrek lê,
Serê bûkê mûrek lê lê, mûrek lê.

Allegretto

Min Sêv dîto li ser sêvê, Hey hewar, hewar, hewar.

war, hewar, war, Min can dîto

li ser sêvê, sed hewar, kes nexun sêvê.

SÊVÊ

Min Sêv dîto li ser sêvê,
Hey hewar, hewar, hewar,
Min can dîto li ser sêvê,
Sed hewar, kes nexun sêvê.

Dine dane dest zarûka,
Hey hewar, hewar, hewar,
Dine dane dest zarûka,
Sed hewar, kes nexun sêvê.

Dine dane li ber lêvê,
Hey hewar, hewar, hewar,
Dine dane li ber lêvê,
Sed hewar, kes nexun sêvê.

Dine dane ber neynûka,
Hey hewar, hewar, hewar,
Dine dane ber neynûka,
Sed hewar, kes nexun sêvê.

Min sêv dîto li serê sûkê,
Hey hewar, hewar, hewar,
Min sêv dîto li serê sûkê,
Sed hewar, kes nexun sêvê.

SÊVÊ

Hey sêvê, sêvê, sêvê!
 Hey hawar, hawar sêvê!
 Hêy sêvê, sêvê, sêvê!
 Sed hawar, kes naxwe sêvê.

Çigare geşkir li ser lêvê,
 Hey hawar, hawar sêvê!
 Çigare geşkir li ser lêvê,
 Sed hawar, kes naxwe sêvê.

Min sêva xwe dî li ber sêvê,
 Hey hawar, hawar sêvê!
 Min sêva xwe dî li ber sêvê,
 Sed hawar, kes naxwe sêvê.

Sêv xeyidye mi naxêvê,
 Hey hawar, hawar sêvê!
 Sêv xeyidye mi naxêvê,
 Sed hawar, kes naxwe sêvê.

Allegretto

Si - be - ye te' - vê da - ye. Ce - me - dê,
 Ce - lî - lê, Si - la - vê, Gu - la - vê.
 Te sil - h'ey - ra - nî te' - vê. Lawk - no, wer - ne si - la - vê.

SIBEYE TE'VÊ DAYE

Sibeye te'vê daye,
 Cemedê, Celîlê, Silavê, Gulavê,
 Te silh'eyranî te'vê,
 Lawkno, weme silavê.

Derê mala me ave,
 Cemedê, Celîlê, Silavê, Gulavê,
 Te silh'eyranî te'vê,
 Lawkno, werne silavê.

Zêr li e'nyê xûdaye,
 Cemedê, Celîlê, Silavê, Gulavê,
 Te silh'eyranî te'vê,
 Lawkno, weme silavê.

Siyar peya dane nave,
 Cemedê, Celîlê, Silavê, Gulavê,
 Te silh'eyranî te'vê,
 Lawkno, werne silavê.

Dilê min keç'kê maye,
 Cemedê, Celîlê, Silavê, Gulavê,
 Te silh'eyranî te'vê,
 Lawkno, weme silavê.

Derdê min yanga zirave,
 Cemedê, Celîlê, Silavê, Gulavê,
 Te silh'eyranî te'vê,
 Lawkno, werne silavê.

SİNEM

Sinê sinê sinemê
Lê lê lê sinemê
Çiyayê Gîlî bîlînde
Sinê sinê sinemê
Bînyîda deşt û gunde
Lê lê sinemê
Sinê sinê sinemê
Lê lê lê sinemê

Mın dîyarê du taxê
Sinê sinê sinemê
Keçîk tev çûne caxê
Lê lê sinemê
Sinê sinê sinemê
Lê lê lê sinemê
Mın dîyanê Xamurê
Sinê sinê sinemê
Çav reşê dêre sorê
Lê lê sinemê
Sinê sinê sinemê
Lê lê lê sinemê



SİNEMÊ

Sinemê koçîka xwe bî rêxîst, delal,
Xwe bî xwe sıkîni van deran,
Sinemê koçîka xwe bî rêxîst, delal,
Xwe bî xwe sıkîni van deran.

Sinemê malîka xwe bî bar kîr, delal,
Xwe bî xwe sıkîni bewraran,
Sinemê malîka xwe bî bar kîr, delal,
Xwe bî xwe sıkîni bewraran.

Rûnişt bejna xwe girêda, delal,
Berda rîşîkê kemberan,
Rûnişt bejna xwe girêda, delal,
Berda rîşîkê kemberan.

Rûnişt bejna xwe girêda, delal,
Berda rîşîkê guheran,
Rûnişt bejna xwe girêda, delal,
Berda rîşîkê guheran.

Sinemê malîka xwe bî bar kîr, delal,
Xwe bî xwe sıkîni van çîyan,
Sinemê malîka xwe bî bar kîr, delal,
Xwe bî xwe sıkîni van çîyan.

Çûm ku Sinemê dî ramusîm, delal,
Gune lî hustiyê gundiyan,
Çûm ku Sinemê dî ramusîm, delal,
Gune lî hustiyê gundiyan.

Rûnişt bejna xwe girêda, delal,
Berda rîşîkê mecdiyan,
Rûnişt bejna xwe girêda, delal,
Berda rîşîkê mecdiyan.

SÎNEMXAN

Ay Sînem!
 Te rû heyva nûrîne,
 Şewqê daye ûmetê.
 Te gerden şûşa hêşîne,
 Nuqte nuqte xal ketê.
 Heçî herî Sînem bibîne,
 Bêşik diçî cenetê.

Ay Sînem!
 Ezê Hîzanê dihebînim,
 Salê sê cara tê bihare,
 Te rû heyva nûrîne,
 Şems û qemer tê re diyare,
 Ezê herim Sînem bibînim,
 Dîna min û Sînem ev care.

Ay Sînem!
 Hingî li dinê digêriyam,
 Kesî nedigo, Sînem nexweşel!
 Ezê hatim Hîzana xopan hicrokê feqîya,
 Dinivîsîn kêl û ferşe.
 Ezê tenbîhê bikim li mar û mişkên mirîya,
 Bere nexun navtenga çarê,
 Sed heyfe li ewraqên reşe.

Ay Sînem !
 Sînem koça xwe-b-rêkir,
 Em bixwe mane li şûn wara,
 Rûnişt û kofî çêkir,
 Berdan şirkêd guhara,
 Mî-d-kir Sînem ramîsim,
 Felek bû min neyara.

Birca Sînemxan têde,
 Wê-d navroka behrê da,
 Hat leşkerê dewletê,

Dibêjin: "Sînem keça melakî bû û mêrê wê çû seferê û jina xwe siparte du mirovên xwe, ko lê miqate bin, çavdêriya wê bikin. Tenê herdû mirovên bê bext, xwestin ko li dor jî-nîkê bigerin, lê Sînem xwe bi destên wan ve berneda û çawa mêrê wê hate mal, jere gotin: 'Jina te tolazê û em şermîkar û rûreş kirin! Hawir xelk li dor digêriyan û naçare mêrik Sînema jina xwe kuşt û diya wê, li ser ev çend dîlokên dawî gotine:

Sînem dure di behrê da,
 Emê rabin destek xewas bigrin berdîna têda,
 Çibkim destê min gîhabû miradê,
 Feleka malîkwêran çerxek lê da!

Sînem, tu rabe ev çî demel!
 Bejin ji Kela Tikrîtê, sing qumaşê Eceme,
 Bere bixêr bêyî mehka remezanê,
 Ez fitreka serê te me!

Sînem gulçîçeka li çiyayî,
 Şewqa xwe daye gêr û giyayî,
 Heçî kesê Sînem nedîtî,
 Bere binêrî rengê birayî!

Sînem! Ezê dînêrim li Bexdayê ezîme,
 Min du şahid hene îsal heft sale,
 Lawîk seferî bû, Êlixê reş kil nedîne!

Andante



Sî.p'a - no, gaz bi ga - zo, K'a - nê ley - lo - ka(min) ley_lo?
 Wê - ra - no, ga/ bi ga - zo, K'a - nê meh' - bû - ba min di - la?

SÎP'ANO


Sîp'ano, gaz bi gazo,
 K'anê leyloka min, leylo?
 Wêrano, gaz bi gazo,
 K'anê meh'bûba min dila?

Dilê daqa cewazo,
 K'anê leyloka min, leylo?

Dilê daqa cewazo,
 K'anê meh'bûba mêra?

Xurê min xortê tolazo,
 K'anê leyloka min, leylo?
 Xurê min xortê tolazo,
 K'anê meh'bûba mêra?

Andante



Hey lo, hey lo So.fî - (y)o, hey lo, gid.yo So.fî - (y)o,
 So.fî - (y)o.
 Hey lo, hey lo, So.fî - (y)o, hey lo, gid.yo So.fî - (y)o.

SOFÎO

Hey lo, hey lo, Sofîo, hey lo, gidyo Sofîo,
 Hey lo, hey lo, Sofîo, hey lo, gidyo Sofîo.
 Mala Sofî dev çaê, hey lo, hey lo, Sofîo,
 Mala k'opek dev çaê, hey lo, gidyo Sofîo.
 Berf û baranê daye, hey lo, hey lo, Sofîo,
 Berf û baranê daye, hey lo, gidyo Sofîo.
 Mala Sofî xirabkir, hey lo, hey lo, Sofîo,
 Mala Sofî xirabkir, hey lo, gidyo Sofîo.
 Yekî rabine ricaê, hey lo, hey lo, Sofîo,
 Yekî rabine ricaê, hey lo, gidyo Sofîo.

Mala Sofî garise, hey lo, hey lo, Sofîo,
 Mala Sofî garise, hey lo, gidyo Sofîo.
 Sofî k'erba fetisî, hey lo, hey lo, Sofîo,
 Sofî k'erba fetisî, hey lo, gidyo Sofîo.
 Sofî, Sofîkî ç'ake, hey lo, hey lo, Sofîo,
 Sofî, Sofîkî ç'ake, hey lo, gidyo Sofîo.
 Dêlê li mih'inê bake, hey lo, hey lo, Sofîo,
 Dêlê li mih'inê bake, hey lo, gidyo Sofîo
 Sofî li vandra undake, hey lo, hey lo, Sofîo,
 Sofî li vandra undake, hey lo, gidyo Sofîo.

Allgretto

So - sin gu - la te - li - ka, lo, de - la l gu - la
te - li - ka, bisk ber - da ser me - mi - ka, lo,
se - lam di - lê la - wi - ka, de we - re, de, de, we - re,
fa - tim we - re, to - rin we - re de, de, de, de.

SOSIN GULA TETIKA

Sosin gula tetika, lo,
Delal gula tetika
Bisk berda ser memika, lo,
Selam dilê lawika.
De were, de, de, were,
Fatim were, torin were,
De, de, de, de.

Mala Fatim meyxane, lo,
Mala t'eres meyxane,
Mîr ênya lê, girtî dîwane,
Fatim rewşa xortane.
De were, de, de, were,
Fatim were, torin were,
De, de, de, de.

"SU" AVE AVE

Su ave ave, narinê hey narin.
Su ave ave, tu gula vi canî.

Hem ave, hem berave, narinê hey narin.
Hem ave, hem berave, tu gula vi canî.
Gewr rinde, bejn zirave, narinê hey narin.
Gewr rinde, bejn zirave, tu gula vi canî.

Su-ava me jî ku tê, narinê hey narin.
Su-ava me jî ku tê, tu gula vi canî.
Bingole, jî kevirê qul tê, narinê hey narin.
Bingole, jî kevirê qul tê, tu gula vi canî

Su-ava hêz û mêzan, narinê hey narin.
Su-ava hêz û mêzan, tu gula vi canî.
Xweşe ramûsanê qîzan, narinê hey narin.
Xweşe ramûsanê qîzan tu gula vi cini.
Weka kakilê guzan, narinê hey narin.
Weka kakilê guzan, tu gula vi canî.

Su-ava hok û moka, narinê hey narin
Su-ava hok û moka, tu gula vi canî.
Xweşe ramûsanê bûkan, narinê hey narin
Xweşe ramûsanê bûkan, tu gula vi canî.
Weka goştê çûçikan, narinê hey narin
Weka goştê çûçikan, tu gula vi canî.

SULEYMANÊ EMER

Suleymano, lo lawo!
Gelî xwedan eynelîna!
Xwe bidin hafê bêndera!
Gelî xwedan kurmancina!
Xwe bidin şerê giran û girbela!
Şerê mala kêfir girane,
Ji êvara xwedê de ketiye
ser darê bêxwediyê mawîzera
Suleymano!

De lolo hekîmo qurba! tê ji Helebê
tê rabî dermana ji birîna Suleymanê
min re çêkî ji şekir û şebê,
Xwedê şeş topa têxî mala xwedîyê
gula mawîzerê, sê tilî girtîme
Ji serê bêxwedîya vê kezebê
Suleymano!

De lolo hekîmo qurba! tê ji Ana
Ji birîna Suleymanê min re çêke
dermana û sêbarî di hetwana!
Ezê neketîme heyra kuştina
Suleymanê Emer, kuştin kuştina mêra ye,
Lê ezê ketîme xema wê xemê Suleymano!
Ko cotê xatûnan û zerîyan,
di piştî çavê Suleymanê min re
li Bircabelek, bêxwedan û xwedî mane
Suleymano!

De gelî xwedan eynelîna! xwe bidin
hafê bêndera!
De gelî kurmancina!
Xwe bidin serê giran û girbela!
Şerê mala kêfir girane,
Ji êvara xwedê de ketiye
ser darê bêxwedîyê mawîzera,
De laşê Suleymanê mi nazike, Suleymano!
Dayê!...
Dane ber qeftê bêxwedîyê di xencera
Suleymano!

SULTANÊ

Sultanê dinya deme
Lê, lê, lê, lê Sultanê
Xilxalê lingê te me
Cîrane, Sultane..
Bazinê zendê te me
Gustîla tilya te me
Kembera li piştî te me
Guharê guhê te me
Xizêma pozê te me
Kilçivê mêrê te bimrî
Kuçikê mêrê te bimrî
Kiryarê bejna te me

Sultanê, Sultanê
Lê, lê, lê, lê Sultanê
Biçûkê mal cîranê
Bûye çaxê razanê
Tu bide min ramûsanê
Lê, lê, lê, lê Sultanê
Lê, lê, lê, lê Sultanê..



ŞEMLÊ, ŞEMLANÊ

Şemlê, şemlê, şemlê, şemlê
Lî mala bavê Şemlanê

Ew hêlinê qaz û maza
Lî mala bavê Şemlanê
Hêlin çêkir li ser gaza
Lî mala bavê Şemlanê
Ez ramîsim gerdengaza.
Lî mala bavê Şemlanê

Ew hêlinê qaz û çûka
Şemlê, şemlê, şemlanê
Hêlin çêkir li ser sûka
Lî mala bavê Şemlanê
Ez ramîsim giz û bûka
Lî mala bavê Şemlanê

Ew hêlinên qaz û beta
Lî mala bavê Şemlanê
Hêlin çêkir li serê xeta
Lî mala bavê Şemlanê
Ez ramîsim van hirmeta
Lî mala bavê Şemlanê

Ew hêlinê qaz û zîza
Lî mala bavê Şemlanê
Hêlin çêkir li serê gwîza
Lî mala bavê Şemlanê
Ez ramîsim bûk û qîza
Lî mala bavê Şemlanê

ŞEREFO

Kumê Şeref kulave
Şerefo were kumê xwe
Kumê Kurdo kulave
Lo Kurdo were kumê xwe
Umrê Kurdo ev gave
Şerefo were kumê xwe
Umrê Şeref ev gave
Lo Kurda were kumê xwe

Ev kum ne kumê mine
Lo lawo were kumê xwe
Kumê hevalê mine
Şerefo were kumê xwe.

ŞÊRÎNÊ TEVDE GUL

Ez ji gula gule zerim
Şêrînê tevde gul
Devê deryê wer diherim
Şêrînê tevde gul
Dosta lawkê xwey esmerim
Lê şêrînê tevde gul.

Ez ji gula gule sorim
Lê şêrînê tevde gul.
Devê deryê wer diborim
Lê delalê tevde gul.
Devê deryê wer diborim
Lê şêrînê tevde gul.

Ez ji gula gule sipî me
Lê şêrînê tevde gul.
Devê deryê wer borî me
Lê şêrînê tevde gul.
Dosta lawkê xwey gundî me
Lê delalê tevde gul
Dosta lawkê xwey gundî me
Lê delalê tevde gul.



ŞİLİ BARI

Şili bari tene-tene,
 Vanan rêçê mın û te ne,
 Şili bari tene-tene,
 Vanan rêçê mın û te ne.

Porê yarê porki kej e,
 Ber piştê da şe û meqese.
 Porê yarê porki kej e,
 Ber piştê da şe û meqese.

Çûm ku yara xwe bibinim,
 Bekçiyê bavê wa ye lî ber e,
 Çûm k uyara xwe bibinim,
 Bekçiyê bavê wa ye lî ber e.

Şili bari çilki-çilke,
 Serê qondra yarê şil ke,
 Şili bari çilki-çilke,
 Serê qondra yarê şil ke,

Gundê hember gundê me ye,
 Qe tune bi sed mal he ye,
 Gundê hember gundê me ye,
 Qe tune bi sed mal he ye.

Şûna ku yaram tê da ne bi,
 Hêlek şên bi yêk xirabe ye.
 Şûna ku yaram tê da ne bi,
 Hêlek şên bi yêk xirabe ye.

TAHİRAXANÊ CAZÊ

(Istiran)

Şerekê çêdibû li Qeraniya xopan, lî ber çayê,
 Tahirxan sê denga gazî dikir, Teymûrxano !
 lo bira !
 Tu cebilxanê ji kekê xwe re valake ser ebayê !
 Eskerê Şahê Ecem girane, kes dihana me de nayê.
 Mêrê çê be, çê bixebite, bere îro dengê me
 derkeî li dinyayê!
 Şerekê çêdibû li Qeraniya xopan wa bi dare,
 Tahirxan sê denga gazî dikir, Teymûrxano, lo bira
 Eskerê Şahê Ecem pir girane, bê jimare !
 Mêrî çê be, çê bixebite
 Kekê te yê bi sê gulên birîndare !

TAQİBELEKÊ

Taqîbelekê yeman,
 Taqîkê te beleke taqîbelekê yeman,
 Taqîkê te beleke taqîbelekê gewrê.
 Pişkojan sed û yeke taqîbelekê yeman.
 Pişkojan sed û yeke taqîbelekê gewrê
 Ramûsim te bi heneke taqîbelekê yeman
 Ramûsim te bi heneke taqîbelekê gewrê.

Taqîkê te sipî ye taqîbelekê yeman,
 Taqîkê te sipî ye taqîbelekê gewrê
 Pişkojan sed û sî ye taqîbelekê yeman.
 Pişkojan sed û sî ye taqîbelekê gewrê
 Ramûsim te bi dizî ye taqîbelekê yeman
 Ramûsim te bi dizî ye taqîbelekê gewrê.

Taqîkê te pir sore taqîbelekê yeman,
 Taqîkê te pir sore taqîbelekê gewrê
 Pişkojan hawîrdore taqîbelekê yeman.
 Pişkojan hawîrdore taqîbelekê gewrê
 Ramûsim te bi zore taqîbelekê yeman
 Ramûsim te bi zore taqîbelekê gewrê.

Allegro

Teb E'y-şika xir-dik-mir-dik, lê, lê, E'y-şê.
 eb ca-ni-ka xir-dik-mir-dik, za-lim E'y-sê.

TE BI E'ŞIKA XIRDİK-MIRDİK

Te b (i) Eşika xirdik-mirdik, lê, lê, E'şê
 Te bi canika xirdik-mirdik, zalim E'şê

Qusêsyayez dibirî, lê, lê, E'şê,
 Qusêsyayez dibirî, zalim E'şê.

Ez h'eyrana bejna kurtik, lê, lê, E'şê,
 Ez h'eyrana bejna kurtik, zalim E'şê,

Memkê E'şayez min k'irk'irî, lê, lê, E'şê,
 Memkê E'şayez min k'irk'irî, zalim E'şê.

Dergê mala we min birî, lê, lê, E'şê,
 Dergê mala we min birî, zalim E'şê.

E'ş firotyez bik'irî, lê, lê, E'şê,
 E'ş firotyez bik'irî, zalim E'şê.

Dergê mala we min vekir, lê, lê, E'ÿşê,
Dergê mala we min vekir, zalim E'ÿşê.

Bejna delal xwe te'lde ke, lê, lê, E'ÿşê,
Bejna delal xwe te'lde ke, zalim E'ÿşê.

Dêri veke, dêri veke, lê, lê, E'ÿşê,
Dêri veke, dêri veke, zalim E'ÿşê,

Şeva sarin p'axla xwe ke, lê, lê, E'ÿşê,
Şeva sarin p'axla xwe ke, zalim E'ÿşê,

TÊ JI MEZRÊ DE

Tê ji mezrê de, tê ji mezrê de
Belê loy loy, belê loy loy
Tê ji mezrê de, tê ji mezrê de
Belê loy loy, lawiko qurban.

Xwezka bi mala dostam têda
Bulê loy, loy, belê loy, loy...
Xwezka bi mala dostam têda
Bulê loy, loy, lawiko qurban.

Şûr girêda meral pêda
Bulê loy, loy, belê loy, loy...
Şûr girêda meral pêda
Bulê loy, loy, lawiko qurban.

Te'ji mezrê de sist û pistî
Belê loy, loy belê loy, loy...
Tê ji mezrê de sist û pistî
Belê loy loy, lawiko heyran.

Tu bi zava û ez dergistî
Belê loy, loy, belê loy, loy...
Tu bi zava û ez dergistî
Belê loy, loy, lawiko qurban.

Min bihîstî te yek xwestî
Belê loy, loy, belê loy, loy...
Min bihîstî te yek xwestî
Belê loy, loy, lawiko qurban.

TE MALA-M XERABKÎR

Wele te mala-m xerakir
Bile te mala-m xerakir
Bi destê xwe agir berdayê
Hay de nayî, hay de nayê.

Wele te mala-m xerakir
Bile te mala-m xerakir
Bi destê xwe agir berdayî
Hay de nayê, hay de nayê.

Min dîtibû di derencê de
Min milê xwe li milê wê da
Em tev ketin nêv hewşê da
Mi-l ser sînga gewrê pal da.


Min dîtibû li nav şênî
Qozyê çava li min dişkênî
Destê gula ji mi-r dişkênî
Ji min pêve kes nabênî
Hay de nayê, hay de nayê.

Heta stêra sibhê lêda
Heta dengê melê lêda
Hay de nayê, hay de nayê.

Wele te mala-m xerabkir
Bile te mala-m xerabkir
Bi destî xwe agir berdayî
Hay de nayê, hay de nayê.

Tu kevoka li ber çayê
Tu xezala-l ber çemayê
Tu keroşka li nav lemayê

Allegro



A . va gun.dê mej(i) kû tê, ha na . na, na . na, na . na . nar,

TENZERE

Ava gundê me ji k'u tê, ha nana, nana, nananar.
Ava gundê me ji k'utê, lê keç'ikê yeman Tenzere.
Nava gula, gîhê tê, ha nana, nana, nananar.
Nava gula, gîhê tê, lê keç'ikê yeman Tenzere.
Bîna k'awa min jê tê, ha nana, nana, nananar.
Bîna k'awa min jê tê, lê keç'ikê yeman Tenzere.
Ha siveye tevê daye, ha nana, nana, nananar.
Ha siveye tevê daye, lê keç'ikê yeman Tenzere.
Zêrê e'niê lê xûdaye, ha nana, nana, nananar,
Zêrê e'niê lê xûdaye, lê keç'ikê yeman Tenzere.

TERIM ŞERÊ ŞER GERME

Si li ser me ha, si li ser me day
Terim şerê şer germe.

Dayê rabe sibeye way
Si li ser me ha, si li ser me.
Dayê rabe sibeye way
Terim şerê şer germe.

Sibeye rê xuyaye day
Çing-çing nakim, çing nakim.
Sibeye rê xuyaye way
Terim şerê şer germe.

Azadi riya me ye day
Çing-çing hakim, çing nakim.
Azadi riya me ye way
Terim şerê şer çer germe.

Kurdistan mala me ye day
Çing-çing nakim, çing nakim.
Kurdistan mala me ye way
Terim şerê şer germe.

Sor, zer, kesk ala me ye day
Çing-çing nakim, çing nakim.
Sor, zer, kesk ala me ye way
Terim şerê şer germe.

Andante



Ner ma . le, ner ma . le, oy, oy, oy, oy.



ner ma . le, ner ma . le, li min Gewrê tu do . ma . mê.

TÎNE H'INA BÛKÊ

Ner male, ner male,
Oy, oy, oy, oy,
Ner male, ner male, li min,
Gewrê tu domamê.

Zeva çu h'imamê,
Oy, oy, oy, oy,
Zeva çu, h'imamê, li min,
Keç'ikê tu domamê.

Nexweşe bêh'ale,
Oy, oy, oy, oy,
Nexweşe bêh'ale, li min,
Gewrê tu domamê.

Zeva çu sûkê,
Oy, oy, oy, oy,
Zeva çu sûkê, li min,
Keç'ikê tu domamê.

Tîne h'ina bûkê,
Oy, oy, oy, oy,
Tîne h'ina bûkê, li min,
Gewrê tu domamê.

Ner male, ner male,
Oy, oy, oy, oy,
Ner male, ner male, li min,
Keç'ikê tu domamê.

H'ine di tişkiş kin.
Oy, oy, oy, oy,
H'ine di tişkiş kin, li min,
Gewrê tu domamê.

Dest bûk û zevê kin,
Oy, oy, oy, oy,
Dest bûk û zevê kin, li min,
Keç'ikê tu domamê.

TU DÎNÎ

Ezê berfım, berfa belekyê, lı çiyê mame,
Tava sibêra, siya êvarê daye
Hêdi hêdi heliyame, nemame,
Tu dini, tu dini, tu dini, lê kewê.
Tu dini, tu dini, tu dini, lê kewê.

Ezê berfım, berfa çax heyamê van berana,
Melê gundiyan ez û kewa kubar
Kırıne goştê nava dev diranan,
Tu dini, tu dini, tu dini, tu dini,
Tu dini, tu dini, tu dini, lê kewê.

Kewa dilê mın wê ma, sed car wê ma,
Sosın , rihan, belekyê berfê serê çiyê man,
Ez nızanım, xelq têli delal sala isalin
Kêviya kê ma,
Tu dini, tu dini, tu dini, lê kewê.

TU LI VÊ TÊLÊ

Tu li vê têtê vê tenbûrê
Delîlê dayê, dayê, dayê
Tu li vê têtê, li vê tenbûrê
Zeriyê ez mêvanê te me.
Pêşya hecîya çû Xêbûrê
Delîlê dayê, dayê, dayê




Pêşya hecîya çû Xêbûrê
Zeryê ez mêvanê te me.
Ez radimîsim te gulî hûrê
Delîlê dayê, dayê, dayê
Ez radimîsim te gulî hûrê
Zeriyê ez mêvanê te me.

Tu li vê têtê, têla biçûk
Delîlê dayê, dayê, dayê
Tu li vê têtê, tevî biçûk
Zeryê ez mêvanê te me.
Dest hine kir tevî neynûk
Delîlê dayê, dayê, dayê

Dest hine kir tevî neynûk
Zeriyê ez mêvanê te me.
Keç digirî ez nabim bûk
Delîlê dayê, dayê, dayê
Keç digirî ez nabin bûk
Zeryê ez mêvanê te me.

Tu li vê têtê, li têla mezin
Delîlê dayê, dayê, dayê
Tu li vê têtê, têla mezin
Zeryê ez mêvanê te me.
Dest hine kir tevî bazin
Delîlê dayê, dayê, dayê
Dest hine kir tevî bazin
Zeryê ez mêvanê te me.
Keç digirî min naxwazin
Delîlê dayê, dayê, dayê
Keç digirî min naxwazin
Zeryê ez mêvanê te me.

TÛZIK LI SER AVAYE



TÛZIK LI SER AVAYE

Tûzik li ser avaye,
Av li binya malaye,
Pîr nexweşe, belaye,
Tûzik dermanê dilaye.
Pîr nexweşe, belaye,
Tûzik dermanê dilaye.
Baranê rêşe-rêşe,
Pîr nexweşe, ze'f dêşe,
Tûzik jêra bipêje,
Tûzik dermanê dilêşe.
Pîr nexweşe, belaye,
Tûzik dermanê dilaye.

Pîrê rabû ser p'îya,
Gazî kire gundiya,
Amanat'a tûzikê
Tûzik h'eyate h'emîya.
Pîr nexweşe, belaye,
Tûzik dermanê dilaye.
Rya tûzik nedûre,
Gola wî jî nek'ûre,
Tûzik bendik hê hûre,
Dermanê bêqisûre.
Pîr nexweşe, belaye,
Tûzik dermanê dilaye.

Keç'ik çûnê tûzikê,
Xorta çûne bendikê,
Dest avîtin bendikê,
Av avîte navikê.
Pîr nexweşe, belaye,
Tûzik dermanê dilaye.

Allegro

Ur - mi - ya, ur - mi - ya le - bi - lê ki - ne
lê bi lê ki - nê lê, le Ur - mi - ya Ur - mi ya
dev çû - çi - ke poz pi - jî - ne e - nî ke - ve - re ca - nê

URMÎYA

Urmîya, Urmîya,
Lê bi lê kinê, lê bi lê kinê, lê, lê,
Urmîya, Urmîya,
Dev ç'ûçikê, poz pîjîne, e'nî keverê canê.

Kina min ne zerîye,
Lê bi lê kinê, lê bi lê kinê, lê, lê,
Kina min ne zerîye,
Dev ç'ûçikê, poz pîjîne, e'nî keverê canê.

Erdîşe, Erdîşe,
Lê bi lê kinê, lê bi lê kinê, lê, lê,
Erdîşe, Erdîşe
Dev ç'ûçikê, poz pîjîne, e'nî keverê canê.

Ew qîza çawîşe,
Lê bi lê kinê, lê bi lê kinê, lê, lê,
Ew qîza çawîşe,
Dev ç'ûçikê, poz pîjîne, e'nî keverê canê.

P'êşîda k'îşmîşe,
Lê bi lê kinê, lê bi lê kinê, lê, lê,
P'êşîda k'îşmîşe,
Dev ç'ûçikê, poz pîjîne, e'nî keverê canê.

WELAT ÇIQAS XWEŞ Û RINDE

Welat çiqas xweş û rinde, keçikê lê lê
Mırov têda serbılinde, delalê lê lê.
Ê' me ne rez û ne peze, keçikê lê lê
Cin û warê me qet tune, delalê lê lê.


Ez dızanım welat xweşe, lawıko lo lo
Bê welat jıyan nameşe, delalê lo lo.
Were em welat rızgar bıkın, lawıko lo lo
Kes nemine b' bextê reşe, delalê lo lo.

Destê mın lı dawa te ye, keçikê lê lê
Xew û xwarın lı mın tuneye, delalê lê lê.
Destê xwe dı destê mın ke, keçikê lê lê
Ev doza ya mın û te ye, delalê lê lê.

Destê mın lı destê te ye, lawıko lo lo
Te kengê go mın guh neda, delalo lo lo.
Gava te digo, mın digo fermo, lawıko lo lo
Tım dı riya doza xweda, delalo lo lo.

Mırın bı gılı û gazınca, keçikê lê lê
Bûm Şıvanê derd û kulan, delalê lê lê.
Hınek rabûn doz ajotın, keçikê lê, lê
Zû westıyan û nivı berdan, delalê lê lê.

Sonda mın navê Kurdistan, lawıko lo lo
Ev doza qet nayê berdan, delalo lo lo.
Dewsê kole b' fıkrê karker, lawıko lo lo
Em hıldın ala Kurdistan, delalo lo lo.



WELETÊ NAGRIM LO

Wele te nagrim lo
Bile te nastinim

Lı male tew çuye
Lı male tew çuye

Jine wi çaren
Bı doste yare

Derde hewiye
Welek nakşinim

Wele te nagrim lo
Bile te nagrim

Wele te nastinim
Bile te nastinim

Daye nastinim
Bavo nastinim

Derde hewiye
Welek nakşinim

Derde hewiye
Welek nakşinim

Derde hewiye
Welek nakşinim

Çende şirine welek
Çende şirine welek

Wele te nagrim lo
Bile te nastinim

Jine wi didiye
Çawe wi birciye

Derde hewiye
Kesek ne bine

Derde hewiye
Welek nakşinim

WELAT Û KURDISTAN

Welat û Kurdistan,
Hemû bax û bostan,
Tu mayi l' ber destan.

Ser bî reş û şinin,
Jar û dîbirinin,
Millet mın nabinin,
Oy welat û Kurdistan.

Hemû weki darın,
Rêz in lı ber harın,
Bın destê neyarın.

Pehlewan û mêrxas,
Dest da çek û das,
Şiyar bın wek gernas!
Oy welat û Kurdistan

Wi civatê çêkin!
Navê te tım lêkın!
Destê dijmin jêkın!

Lı gel hev pervabın,
Wek bav û bira bın,
Lı ber dijmin rabın!
Oy welat û Kurdistan.

Welat û Kurdistan,
Hemû bax û bostan,
Tu mayi l' ber destan.

Ser bî reş û şine!
Jar û dîbirine,
Millet mın bibine,
Oy welat û Kurdistan.

WÊ Lİ SER BANİ

Wê li ser banî, wê li ser banî
Lo kuro dîno, wê li ser banî !

Destê rastê li min hilanî
Lo kuro dîno, wê li ser banî
Îşaret kir min nezanî
Lo kuro dîno, wê li ser banî !

Wê li ser banî çek dişuştin
Lo kuro dîno, wê li ser banî
Zend û bazin tev hilmiştin
Lo kuro dîno, wê li ser banî
Xortê xelkê bi çola xiştin
Lo kuro dîno, wê li ser banî !

Wê li ser banî cil raxistin
Lo kuro dîno, wê li ser banî
Bisk û kezî li berba xiştin
Lo kuro dîno, wê li ser banî
Xortê xelkê bi çola xistin
Lo kuro dîno, wê li ser banî !

Wê li ser banî cil kutane
Lo kuro dîno, wê li ser banî
Zend û bazin tev hildane
Lo kuro dîno, wê li ser banî
Xortê xelkê li çola mane
Lo kuro dîno, wê li ser banî !

WELE NAÇME BER GARANÊ

Wele naçme ber garanê
Bileh naçme ber garanê
Serê malê bidî nanê

Wele naçme ber garanê
Keçik nedî ramîsanê
Bileh naçme ber garanê

Ew garana ga û golika
Wele naçme ber garanê
Min çêrandî li dor tatika
Bileh naçme ber garanê

Serê malê nedî nanê
Wele naçme ber garanê
Keçik nedin ramîsanê
Bileh naçme ber garanê.

WERE DELALÊ

Were delalê emrê mîn were,
Dozîk çêbûne, idi çî hale?
Were delalê emrê mîn were.

Sêva cînnetê, bavê qudretê,
Melhema dîlan, şîrîn şerbetê,
Were delalê emrê mîn were.

Axina dîkîm, heyfam bî te tê,
Kewa gozelê, bihna cînnetê,
Were delalê emrê mîn were.

Bî nûra xwedê, bê derd bê kul bî,
Tu were ba mîn, bo navê xwedê,
Were delalê emrê mîn were.

Te ez helandîm, idi guhne me,
Axina meke, hêviya te me
Were delalê emrê mîn were.

Were delalê emrê mîn were,
Dozîk çêbûne, idi çî halê?
Were delalê emrê mîn were.

WEY GUL

Dîbêjin guli xweş e, wey gul ez bîmîrîm,
Reben e û bextî reş e, wey gul wey gul,
Wey gulîzar,
Derdê mî yekbû te kîr sed hezar,
Ez jî vî canê xwe bûme bêzar.

Gula mî nî gula zer e wey gula zer e,
L' er çavê mî here were wey gul wey gul,
Wey gulîzar,
Derdê mî yekbû te kîr sed hezar,
Ez jî vî canê xwe bûme bêzar.

Allegro



Ne . man, ne . man, wey, Xa . ni . mē,



bū . ka ma . la ba . vē mi . nē, bū . ka ma . la



ba . vē mi . nē, ne . man, ne . man, wey, Xa . ni . mē.

WEY, XANIMÊ

Neman, neman, wey Xanimê,
Bûka mala bavê minê,
Bûka mala bavê minê,
Neman, neman, wey, Xanimê.

Mala Xana min zeynete,
Mala dosta min zeynete,
Ez sê denga bang dikimê,
K'aw k'ubare nak'êlimê.

Neman, neman, wey, Xanimê,
Çû miqîdê gilî dike,
Qayma qayma bertîl dike,
Neman, neman, wey, Xanimê,

Neman, neman, wey, Xanimê,
Bal çawîş ezar dike,
Dewa rûto safî dike,
Neman, neman, wey, Xanimê.

Lo, lo rûto qet nemaoy,
Xênî k'eto diwar mao,
Nava hevala şermî mao,
Neman, neman, wey, Xanimê.

WÎ WÎ LI MÎN

De wî li min, wi wi li min!...
De wi li min, wi wi li min bext bireşe.

Kurê xalê mino,
Ezê Kopê bi demankim,
Du sed zêrê Osmanlî tède karkim,
Ezê herim bajarê Erzeroma xopan,
Şal û şapikê kurê xalê xwe bi qeytankim,
Bavê xêrê bikî bi çavê serê xwe nebîni,

Çawa nedame kurê xalb min rebenê
Îsal heft salê min dilketê,
Ez dame Çaçanê mala Simo,

bûye çileçilê Çaçanê dibên:
Bûkê siwarkin, bûkê siwarkin!
De wî li min, bê wî li min, bê wî li min!
Bê wî li min, bê wî li min, lê bext bi reşe.

Lolo kurê xalê mino,
Min dil girtî ji nedîve, ji nedîve,
Min dî kurê xalê min derbas dibû taxa
mala Efendî ve, Efendî ve..
Xwezka ezê bibûma kosteka wê saetê,
Qaskê biketama ser berstika eba kendoyî ve,
kendoyî ve.
De wî wî li min, wî wî li min!

Lolo kurê xalê mino,
 Kopa xopan li wî benî, li wî benî,
 Bavê min rebenê xêrê bikî bi çavê
 serê xwe nebînî!
 Çawa nedame kurê xalê min rebenê,
 Îsal heft sal min dilketê,
 Ezê dame Çaçanê mal Simo
 kalê pisê papax genî, papax genî.
 De wîwî li min, wîwî li min!
 De wîwî li min, de wî li min, lê bext bi reşê.

Lolo kurê xalê mino,
 Min çî got û te deynekir, te deynekir,
 Kurê xalê min rebenê kolos xwarkir
 mitale kir, mitale kir,
 Lawko dîno gazin û loma ji min meke!
 Eza rih û canê te bûm xwedê li banê
 banî nekir, banî nekir.
 De wî li min, de wî li min!
 De wî li min, lê bext bi reşê.

We ri Xan we ri Xan we ri Xa nê lê Xa na min
 ca na min

Deş ta Tem ra nê a ve lê Xa na min
 ca na min

XABÛRÊ

Cigerxwin

Ey Xabûr, Xabûr, ey Xabûr, Xabûr...
 Wek daxwaza min, pîr dirêj û kûr
 Kêferata te, xum, xum, û lew, lew
 Nayên bîra te, ne razan, ne xew
 Herdem dinalî, bî qîrîn, gazî
 Lê kes nîzanî, ka çî dixwazî?
 Armanca te ye, xurtî, pêşveçûn
 Cihê te tenge, divê firehbûn
 Pêlan didî xwe qîr û fîryadî
 Te ji wekî min divê azadî
 Sînga vê erdê te çîrand bî zor
 Nîzanîm çîra tu naçî berjor
 Ev çende xurtî, bê daxwaz û vîn
 Dikevî sînga Derya bê evin
 Xwezka min bî te, bê derd û bê kul
 Dijî bî şadî, bê mejî û dil
 Tujî wekî min, ger bikûna Kurd
 Ev xurtîya te dibu kul û derd

XANÊ

Weri Xan, weri Xan, weri Xanê lê, Xana min,
 Werî Xan, werî Xan, werî Xanê lê, cana min.

Deşta Temranê av e lê, Xana min,
 Deşta Temranê av e lê, cana min.

Sê siwaran xwe da nav e lê, Xana min,
 Sê siwaran xwe da nav e lê, cana min.

Revand Xana ben zîrav e, Xana min,
 Revand Xana ben zîrav e, cana min.

Dešta Temranê aş e lê, Xana min,
Dešta Temranê aş e lê, cana min.

Lawikê xwe dêyndar nakim lê, Xana min,
Lawikê xwe dêyndar nakim lê, cana win.

Sê siwaran xwe da paş e lê, Xana min,
Sê siwaran xwe da paş e lê, cana min.

Dêyndarê evdan nakim lê, Xana min,
Dêyndarê evdan nakim lê, cana min.

Revand Xana çavreş e lê, Xana min,
Revand Xana çavreş e lê, cana min.

Qimiş nabim ji xew rakim lê. Xana min,
Qimiş nabim ji xew rakim lê. cana min.

Xanê te digo mêr nakim lê, Xana min,
Xanê te digo mêr nakim lê, cana min.

Tasîki av lî destan kîm lê, Xana min,
Tasîki av lî destan kîm lê, cana min.

Kofiya zêran xwar nakim lê, Xana min,
Kofiya zêran xwar nakim lê, cana min.


XANÊ

Xanê te digo; ez mêr nakim,
Loy loy loy loy xana min.
Bîsk û keziyan şe nakim,
Rabe rûni sebra min.

Xanê bexçe pivaze,
Loy loy loy loy xana min.
Pivaz bûne girvaze,
Rabe rûni sebra min.

Xanê bexçe incase,
Loy loy loy loy xana min.
Încas bûne mîsase,
Rabe rûni sebra min.

Moderato



XANIKÊ

Xanikê, tu bi xanî, xana min,
Canikê, tu bi canî, cana min.

Te li vî zimanî, xana min,
Te li vî zimanî, cana min.

Gelyê Emanê, xana min,
Gelyê Emanê, cana min.

Konikê reş danî, xana min,
Konikê reş danî, cana min.

P'erê Emanê, xana min,
P'erê Emanê, cana min.

Gelikî k'ûre, xana min,
Gelikî k'ûre, cana min.

Dikim ramûsim, xana min,
Dikim ramûsim, xana min.

Hevirmîş hûre, xana min,
Hevirmîş hûre, cana min.

XANİKÊ TU XANÎ

Xanikê tu xanî, lê xanê
Canikê tu canî, lê canê
Te bi vî zimanî lê xanê
Konê reş danî lê canê.

Li gelîkî tenge lê xanê
Paşa ji me dixwazî lê xanê
Hewrmêşê penge lê canê
Bajarî dûre lê xanê
Wê li me derenge lê canê.

Xanikê tu xanî, lê xanê
Canikê tu canî, lê canê
Te bi vî zimanî lê xanê
Konê reş danî lê canê.

Li gelîkî kûre, lê xanê
Ser sîngê xanê lê xane
Hewrmêşê hûre lê canê
Rabe me birêke lê xanê
Rêka me dûre lê canê.

XANIMA MIN

Xanıma mın, bermaliya mın,
Xanıma mın, bermaliya mın.
Xanımam, bermaliyam, rındê tu xemla mala mın.
Xanımam, bermaliyam, rındê tu rewşa mala mın.
Delala mın iro, jı mın xeyidiye,
Bı gazıncı, b' axini dıl cemidiye.
Xanıma mın disa jı mın xeyidiye,
Bı gazıncı, b' axini dıl cemidiye.
Xanıma mın, bermaliya mın.
Disa çı bû ye lı ba me,
Rabûne kul û derdê me.
Xanımam, bermaliyam, rındê tu xemla mala mın,
Xanımam, bermaliyam, rındê tu rewşa mala mın.
Xanıma mın, were ba mın.
Roniya herdu çavê mın.
Zanıx xanıx bırındar û bê evine,
Derdê mêran û zarokan pır dıqşine.
Xanıx dıqşine wek dayıka mın Kurdistan.
Mêr û zarok xıçıl bûne wekê Kurdan.
Xanımam, bermaliyam, rındê tu xemla mala mın,
Xanımam, bermaliyam, rındê tu rewşa mala mın.
Dıxwazi bibi wek xanıman,
Jiñ bıki mêr û zarokan.
Belê raste, tu delali,
Bı axine wek te Şıvan.



XANIMÊ, LÊ XANIMÊ

Xanimê, lê Xanimê,
Bûka mala bavê minê,
Ç'iç'ekê rewşa dinê,
Tu soz nedî yekî dinê.

Çi xanimkî bi lomeye,
Bi şev û roj mala meye,
Qisûrek lê t'uneye,
Gotina wî bi me'neye.

Him gulî, him sosinî,
Tu bi xizêma ser bazinî,
Bimrî, bijî, tu a minî,
Bûka mala bavê minî.

Xanimê, tu Xanimê,
Tu çil biskê gulavdûnê,
K'eremke were rûnî,
Agir dayne ser qelûnê.

Xanimê dinya deme,
Ne me derde, ne me xeme,
ez h'eyrê bejna teme,
Ez aşiqê ç'e'vê teme.

XANIMOKÊ

Min xew tê, ha min xew tê
Xanimokê xewarê.
Xewa te l-mala kê tê
Xanimokê xewarê.

Xewam li mala Remo tê
Xanimokê xewarê
Serê xwe deyn ser çokê
Xanimokê xewarê.

Di virde jî xewa wê li mala gundiya tevan tê û hevala wê serê wê datênî ser çoka xortê malê, lê herwekû tê bîra min tiştêkî dî jî dibêjin: "heta..... bê jî derde", yan jî dibêjin:

Ew kî bû hat jî derde
Xanimokê xewarê
Reşo hatî jî derde
Xanimokê xewarê
Kurd bû bi turkî xeber da
Xanimokê xewarê.

Allegretto

Xe.co - kê, min di-go e- we, ye-man, ye-man,ye-man.
De-la - lê, min di-go e - we. Xe-co, di - lê min.

XECOÛÊ

Xecokê, min digo ewe, yeman, yeman, yeman,
Delalê, min digo ewe, Xeco, dilê min.

Herşev k'arê me ewe, yeman, yeman, yeman,
Herroj k'arê me ewe Xeco, dilê min.

Xecokê, Semerqedî, yeman, yeman, yeman,
Delalê, Semerqedî, Xeco, dilê min.

H'imayla kabazbendî, yeman, yeman, yeman,
H'imayla kabazbendî, Xeco, dilê min.

Xecokê, sêlê bine, yeman, yeman, yeman,
Delalê, sêlê bine Xeco, dilê min.

Dendika biqelîne, yeman, yeman, yeman,
Dendika biqelîne, Xeco, dilê min.

P'êşikê xwe jê bi hilîne, yeman, yeman, yeman,
P'êşikê xwe jê bi hilîne, Xeco, dilê min.

XERABO

Lolo xerabo!
Ji dinyayê, alemê xerabtiro-
li ber dilê min evdala xwedê
Ji bav û birakê min çêtiro
Ji şekirê elbika,
Ji muhibeta dê û welediyê
şêrîntiro xerabo!
Min evdala xwedê,

heft sala di dawa teqîkê xwedê
bi pars û pûsê xwedî kiro,
sala heşta toleke reşe lêvdeqandî
Ji xwer dibiro, xerabo!

Lolo xerabo!
Malxerabo! dikim nakim tu xerabî,
teniya bi duhnî ji riwê min venabî,
dikim nakim ji ber çoka min ranabî.
Derdê dila derdkî noye ra lê nabî
şûşa dilê min şikestîye cebar nabî,
Ji min evdala xwedê re tu ezabî
de lolo xerabo, tu xerabî!
Malxerabo! min bihistî te yek xwestî
Ezê herim daweta xerabê malê
bi taqîkê sipî, bi dilê şikestî
eger ji min çêtir bî, sed pîroz bê li wî canî
lê heke ji min pîstir bî, tu nifirê xerab
li te nakim, bere goştê laşê te bihelî,
bimênî komek hestî;
serpîra tu kor bibî, heft sala bikevî
ber vî destî, lolo xerabo!
Lolo xerabo!
Malxerabo! ne te xwestim, ne revandim!
Te ez kirim darê tenûrê reş qelandim!
Te kirim şareke hemawî, li dora kumê xwe gerandim!
Te kirim taseke çingo, li odê maqûl û axelera
diçingandim! lolo xerabo!
Lolo xerabo!
Malxerabo! bere li mi-bî li vî dilî
Na wele, bere li mala bavê te bî, li wî aqilî.
Çawa te dev ji min kihêla serê tewla berda
û li bergîleke pişturmî, qoşfilitî
li pey etara dihesilî.
Kul û derdê xerabê mala min giranin,
Şaxê xwe berdane ser qulpa kemberê
ser vî dilî xerab!
Min sondxwariye terka delalê mala
bavê xwe rebenê nakim
heta bekişênin serê min rebenê
topek cawê şêrêz kirî.
Li ber serê min deynin cotek kelên
dikevirî, xerabo!
De lolo xerabo!

Malxerabo!

Ez û xerabê malê qaskê li hafa
mala li hev rûniştin.

Ji kul û kederê dinyayê

meyê gilî kirin, gazin bi şûnve hiştin

berî û baranê li me dayê, hêstirê çavê

min rebenê kevir û kuçikê binê newalan tev dimiştin xerabo!

Masiyê binê behra ji derdê min û xerabê

mala min biriştin;

teyr û tilûrê serê çiya bi ser nîkilên

Xwe de dipûniştin, xerabo!

Miriyên cebana heft safî,

qerqerê xwe li serê xwe gerandin

û li ser tîrbê xwe rûniştin xerabo!

XEYDA

Keyda, xeyda

Lê, lê Xeyda

Xulama keçka seyda

Lê, lê Xeyda

Ezê bêjim me xeda

Lê, lê Xeyda

Ramîsankê bide min

Lê, lê Xeyda

Siba vî çaxî eyda

Lê, lê Xeyda

Lêlê Xeyda, xeydokê

Lê, lê Xeyda

Biçûkê şemamokê

Lê, lê Xeyda

Şêrinê xweş bihokê

Lê, lê Xeyda

Ramîsim te zarokê

Lêlê Xeyda.., lêlê Xeyda..

Mala Xeyda li derê çeme

Lê, lê Xeyda

Ez mêvanê Xeyda xwe me

Lê, lê Xeyda

Îşev ez mêvanê te me

Lê, lê Xeyda

Kûçkê mêrê Xeyda bimrî

Lê, lê Xeyda

Ez kiryarê bejna te me

Lê, lê Xeyda.

XEZALA ÇIYAYÊ ŞENGALÊ

Zeal Zeal uwi uwi... hayê hayê hayê hayêêêê
Iro mîn ê dibûn, mala Xezala mîn barkır,
çû zozanan uwi uwi.. uwii cefaêêê...

Şewitiii.. kulê dilê mîn pır bûn Xezalê uwi hayê.
Ezê va kul û dilim, heyata rebiyê ji te ra bîbim
cem aşiq û cem hozanan uwi cefaêêê...

Geli gundiyan û ciranan, ma hun ê qey nîzanin;
Rûkê Xezala mîn sor bûne ji tomatê lo lo
ramûsanen uwiii.

Xezala mîn xeyidiye, geli gundiyan û ciranan
Ez nîzanim çîma va qîza seba çî ye hoyê, hoyê,
nayê rayê uwi...

Xezal biyane uwi Xezal,
Xeribi zore uwi cefa,
Belê merî xerib û welatê xeribiyê kor e, Xezal.

Iro din û bala xwe dîdime çeyayê zozanan,
çiyayê Sipanê xelatê berfê lêkır uwii.. cefaêê.

Iro mînê bala xwe dîdim çiyayê Sipanê,
berfê lêkır uwi Xezal.

Disa mînê di bîbîlê malxırab uwii hayê hayê..
hayêêê...

Mîn ê di, bîbîlê malxırab dî qunta de hêlin
çêkır uwi cefaêêê.
Sala par heta van çaxana Xezaliya mîn bû, sala
isal mêrê heram rabû, lo lo, dawê lêkır.
Xezala mîn biyane, geli gundiyan û ciranan.
Ezê nîzanim çîma va qîza seba çî ye hoyê, hoyê,
hoyê nayê rayê...

Xezal biyane, uwi Xezal,
Xeribi zore, uwi cefa,
Belê merî xerib û welatê xeribiyê kor e,
Xezal...

XEZALA MIN

Xezala mın,
Delala mın,
Hay hêli, hêli, hêli.

Xezala mın,
Delala mın,
Anin barê xiyaran.

Xezala mın,
Delala mın,
Pezê bavê te reşe.

Xezala mın,
Delala mın,
Koçerên beriya jêrin.

Xezala mın,
Delala mın,
Pezê bavê te sore.

Xezala mın,
Delala mın,
Beriyêda dimeşe.

Xezala mın,
Delala mın,
Koçer çûne zozanan.

Xezala mın,
Delala mın,
Beriyêda ore-ore.

XEZALA MÎN

Xezala min, delala min
Hey hêrî, hêrî, hêrî
Xezala min, delala min
Xezala li berya jêrî
Xezala min, delala min
Koçera ser bixêlî
Xezala min, delala min
Koçeran pez da bêrî.

Xezala min, delala min
Xezalêl beryê çarin
Xezala min, delala min
Her çar jî, bi kum û şarin
Xezala min, delala min
Her çar jî, bi dost û yarin.

Xezala min, delala min
Xezalêl beryê şeşin
Xezala min, delala min
Xezalêl beryê şeşin
Xezala min, delala min
Her şeş jî, bi şarên reşin
Xezala min, delala min
Her şeş jî, xweş keleşin.

XEZALÊ HÊLI HÊLI

Xezalê hêli, hêli,
Delalê hêli can.

Wan, Dêrsım, Diyarbekır,
Xezalê hêli can.

Wan, Dêrsım, Diyarbekır,
Delalê hêli can.

Mın l' Qersê dukan vekır,
Xezalê hêli can.

Mın l' Qersê dukan vekır,
Delalê hêli can.

Bazara şara te kır,
Xezalê hêli can.
Bazara şara te kır,
Delalê hêli can.

Mın ji bir kır, por-por nekır,
Xezalê hêli can.

Mın ji bir kır, por-por nekır,
Delalê hêli can.

Bazara sola te kır,
Xezalê hêli can.
Bazara sola te kır,
Delalê hêli can.

Mın ji bir kır nalçe nekır,
Xezalê hêli can.

Mın ji bir kır nalçe nekır,
Delalê hêli can.

XEZAL Û EVDAL

Herê lê lê lê lê lê lê
Her lê lê Xezal lê lê

Delo lo lo lo lo lo
Delo lo lo Evdal lo lo

Xezalam keça kurdayê
Delal çuyê kan'ya bayê
Avê tîne ji bona çayê
Hemu xorta dil berdayê

Herê lê lê lê lê lê lê
Herê lê lê Xezal lê lê

Evdalem pêşmergeyê
Şal û şapık lı bejneyê
Sekîniye ser xaniyê
Çavê keça hemu léyê


Delo lo lo lo lo lo
Delo lo lo Evdal lo lo

Xezal derket ji bêriyê
Hur dimeşe ser panîyê
Fistan sore gerden zerê
Tu kulîlka der bihare

Herê lê lê lê lê lê lê
Herê lê lê Xezal lê lê

Evdal têyê ji bajarê
Serî qote porî kejê
Delalê mın pır dengbejê
Ser evîndara dibeje

Delo lo lo lo lo lo
Delo lo lo Evdal lo lo




XIMŞÊ

Mala Ximşê serê çîaye,
Oy, li min, oy, oy, li min, oy, oy li min,
Oy, oy li min, lê lê Ximşê,
Mala Ximşê serê çîaye,
Bûktî nakim bextê teme,
Gidî yeman lê, lê Ximşê.

Dilê qîza xorta maye
Oy, li min, oy, oy, li min, oy, oy li min,
Oy, oy li min, lê, lê Ximşê.
Dilê qîza xorta maye,
Bûktî nakim bextê teme,
Gidî yeman lê, lê Ximşê.

Mala dostê bi dergeye,
Oy, li min, oy, oy li min, oy, oy li min,
Oy, oy li min, lê, lê Ximşê,
Mala dostê bi dergeye,
Bûktî nakim bextê teme,
Gidî yeman lê, lê Ximşê.



XIRPANÎ

De bi lor, lor, lor, xirpanî De bi lor, lor, lor, xirpanî	Qelena k'awa min deranî, De bi lor, lor, lor, xirpanî	Ha sibeye, te'vê daya, De bi lor, lor, lor, xirpanî
Malê me me mesrê dani De bi lor, lor, lor, xirpanî	Ha(w)îro, (w)îro, (w)îro. De bi lor, lor, lor, xirpanî	Zêra e'nyî xûdaye, De bi lor, lor, lor, xirpanî
Mesra teng bû hilneani De bi lor, lor, lor, xirpanî	Me li bang da dikê nivro, De bi lor, lor, lor, xirpanî	Ha sibeye, te'v zeriqi, De bi lor, lor, lor, xirpanî
Lawkno lexin rojkanî De bi lor, lor, lor, xirpanî	Kumo, qizna ha lêxin, De bi lor, lor, lor, xirpanî	Zêra e'nyê biriqi, De bi lor, lor, lor, xirpanî
Çil qant'irê qeremani, De bi lor, lor, lor, xirpanî	Lawkno, lêxin rojkanî, De bi lor, lor, lor, xirpanî	Ser sîngê zer t'iviqi, De bi lor, lor, lor, xirpanî
Çil berdîrê doşanî, De bi lor, lor, lor, xirpanî		

XWE KAR BIKIN JI BO ŞER

Bî ser çıyan ketim ez karê mine bez û rev
Cî nîne têde rûnim, ne biroj û ne bî şev
Cihê bav û kalê mın bî xwînamın bûye sor
Dijmın îro têde ye, dibêjî mın tu derkev
Bûye sîh sal dinalım, birîndar û gıha hev
Berî bîbım birîndar xwedî dost û mirov bûm
Lê îro mame تنها, ez bê zıman û bê dev
Zıvıstane nıkarım, bî dijmın re bıkıım şer
Pûk û berfê dagirtın, gelî, derbend, û bandev
Vaye bıhar bıxêr tê, xwe kar bıkıın jı bo şer
Êrîş bıkıın neyaran weke mêran hemî-tev

Cıgerxwîn

Moderato

Xwesti-me Xwesti - me le ya - dê le le

lo va - bo min - na - din. Wes Xwes - ti - me Xwest - i - me

le ya - dê le le lo ya bo min - na din

XWESTÎME

Xwestîme wez xwvestîme
Lê yadê lê lê, lo yabo mîn nadîn
Wez xwestîme, xwestîme
Lê yadê lê, lê, lo yabo mîn nadîn

Xwzîniyên mîn hatîne lê yadê lê; lê,
Lo yabo, mîn nadîn
Xwzîniyên mîn hatîne lê yadê lê, lê,
Lo yabo, mîn nadîn

(Gîrêdan)

Melle, gazî û muftîne, lê yadê lê, lê,
Lo bavo, mîn nadîn
Melle, gazî û muftîne, lê yadê lê, lê,
Loy bavo, mîn nadîn

(Gîrêdan)

Qelendê mîn birîna lê yadê lê, lê,
Loy bavo, mîn nadîn
Qelendê mîn birîna lê yadê lê, lê,
Loy bavo, mîn nadîn

(Gîrêdan)

Sed mihên qerqaşîne lê yadê lê, lê,
Loy bavo, mîn nadîn
Sed mihên qerqaşîne lê yadê lê, lê,
Loy bavo, mîn nadîn

(Gîrêdan)


Sed zêrên Reşadîne lê yadê lê, lê,
Loy bavo, to mîn nadîn
Sed zêrên Reşadîne lê yadê lê, lê,
Loy bavo, to mîn nadîn

(Gîrêdan)

Xwezîniyê mîn hatîne lê yadê lê, lê,
Loy bavo, mîn nadîn
Xwezîniyê mîn hatîne lê yadê lê, lê,
Loy bavo, mîn nadîn

Qelendê mîn anîne lê yadê lê, lê,
Loy bavo, mîn nadîn
Qelendê mîn anîne lê yadê lê, lê,
Loy bavo, mîn nadîn

Gîrêdan = Keç û Mêr bihevra (Beraber)



XWEZILA BISKIK BAMA

Xwezila biskik bama, yado, Bisk biskê beranan, Xwezila biskik bama, yado, Bisk biskê beranan.	Xwezila biskik bama, yado, Bisk biskê karikan Xwezila biskik bama, yado, Bisk biskê karikan	Xwezila biskik bama, yado, Bisk biskê bızinan Xwezila biskik bama, yado, Bisk biskê bızinan.
--	--	---

Hûr-hûr biçêriyama, yado, Dorkê van xoydanan, Hûr-hûr biçêriyama, yado, Dorkê van xoydanan.	Hûr-hûr biçêriyama, yado, Dorkê van darikan, Hûr-hûr biçêriyama, yado, Dorkê van darikan.	Hûr-hûr biçêriyama, yado, Dorkê van zinaran, Hûr-hûr biçêriyama, yado, Dorkê van zinaran.
--	--	--

Çavki lî xewka şîrin, yado, Dest lî ser mircanan, Çavki lî xewka şîrin, yado, Dest lî ser mircanan.	Çavki lî xewka şîrin, yado, Dest lî ser çîçikan, Çavki lî xewka şîrin, yado, Dest lî ser çîçikan.	Çavki lî xewka şîrin, yado, Dest lî ser zendalan, Çavki lî xewka şîrin, yado, Dest lî ser zendalan.
--	--	--

XWEZÎ JI TÊLAN TÊLEK BAMA

Xwezi ji têlan têlek bama, têl têli beranan.
Hûr-hûr biçêriyama yado, dor kevir û xwêlikan.
Çav lî xewa şîrin yado, dest lî ser biskan.

Xwezi ji têlan têlek bama, têl têli berxikan.
Hûr-hûr biçêriyama yado, dor kevir û merxikan.
Çav lî xewa şîrin yado, dest lî ser memikan.

Xwezi ji têlan têlek bama, têl têli karikan.
Hûr-hûr biçêriyama yado, dor kevir û darikan.
Çav lî xewa şîrin yado, dest lî ser biskan.
Çav lî xewa şîrin yado, dest lî ser memikan.




YARA MIN

Yara min yara min
Sebra dilê min
Yara min yara min
Kara mala min

Çavê reş û belek
Tevda kil dane
Bejna yarê ziravê
Weki leylane

Yarê li me barî
Berfêka pûke
Yarê min bihîsti
Tu buyê bûke

Allegro



YAR GEVEZE

Yar geveze bi geveze,
Yar geveze, bi geveze.

Çêkirina komûnîzmê
Gele mera jî ferze.

Yar geveze, bi geveze.
Beyraga me bi geveze

Sovxozax bax û reze,
Fêrmê me berx û peze.

Beyraqa me bi geveze,
Sed şikir e'mrê t'eze.

Allegretto



YAR GOVENDÊ

Yar govendê lê, yar govendê,
Ez h'eyrana lê, bazinê zendê.
K'erba t'eva hatime bendê.
Govend gerya lê, xet ber xete,
Sergovendî lê, qiz û met'e.
Govend gerya lê, sûk ber sûke,
Sergovendî lê, qiz û bûke,
Yar govendê lê, yar govendê,

Moderato

Yar lê çî - ma, çîm çî - ma. Dost lê çî - ma,
war çî - ma, Yar lê çî - ma, war çî - ma,
Dost lê çî - ma, war çî - ma Ez h'el - yam bû - me şî - ma.

YAR LÊ ÇIMA

Yar lê çîma, çîm çîma,
Dost lê çîma, war çîma,
Yar lê çîma, çîm çîma,
Dost lê çîma, war çîma,
Ez h'elyam bûme şîma.

Yar lê ç'emê Gergerê,
Dêşin birinêd berê,
K'etime xîyalêd xema,
Qet gund ne got, çîma
Ez h'elyam bûme şîma.

Yar lê çîma, çîm çîma,
Dost lê çîma, çîm çîma,
K'etime xîyalêd xema,
Qet gund ne got, çîma
Ez h'elyam bûme şîma.

Yar li ç'emê Erdîşê,
Xort dilizin qayîşê,
K'etime xîyalêd xema,
Qet gund ne got, çîma
Ez h'elyam bûme şîma.

Allegro

Yar, ya - rû ya - ra rêz, Di - do ha - tin lez bi lez,

Yek ca - ca - ne, yek çer - ke - ze lo. Yek rêz - wa - ne, cû ber fez.

YAR REZÊ

Yar yarû, yara rez,
Dido hatin lez bi lez,
Yek çaçane, yek çerkeze, lo,
Yek rezwane, çû ber rez.
Yar, yara boşatî,
Bejn û bala şîmşatî,
Serî zêrê reşatî, lo,
Li ser ç'e'vê min hatî.

Yar, yara zin - zinî,
Dest û milê bazinî,
Tu bi xizêma mezinî, lo,
Bimrî, bijî a minî.

Yara min çî biç'ûke,
H'ine li dest û neynûke,
K'î çî zane k' u bûke, lo,
Xelqê t'irê zarûke.

Yar, yara h'indrûfî,
Tu li serî şal û k'ofî,
Çî bi tirsî, bi xofî, lo,
Bextê mira bûyî sofî.

Allegro



Yar so - sin, so - sin, so - sin, so - si - nê mêr - gê - da ma - yî.



Ke - ç'ik çû - ne dî - la - nê, h'e - mû k'em - be - rê ba - da - yî.

YAR SOSIN

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Keç'ik çûne dîlanê, h'emû k'emberê badayî.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Em çûne ramûsana, aqil û sewda nemayî.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrga hêşine.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Keç'ik çûne dîlanê, h'emû k'emberê zivîne.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Wez dikim sosin ramûsim, aqil sewda t'unîne.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrga belek.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Keç'ik çûne dîlanê, h'emû k'emberê xeleşe.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Wez dikim sosin ramûsim, mira dike h'eneke.

YAR WELLEH KEÇİKE

Yar welleh keçike,
Billeh keçike.
Yar dıkım ramisım,
Nızam çı dıke.

Yar pozi xızême,
Xızêm şırıke.
Ez dıkım ramisım,
Nızam çı dıke.

Yar guhi guhare,
Guhar gupıke.
Ez dıkım ramisım,
Nızam çı dıke.

Yar mıli bazıne,
Bazın şırıng.
Ez dıkım ramisım,
Nızam çı dıke.

Yar welleh keçike,
Billeh keçike.
Ez dıkım ramisım,
Nızam çı dıke.

Allegro

Yar, ya - rê, ya - rê lê, yar, ya - rê, ya - rê,
yar, ya - rê, ya - rê lê, yar, ya - rê, ya - rê,
qîz çû - ne ço - lê bîr - ta ê - va - rê,
qîz çû - ne ço - lê bîr - ta ê - va - rê.

YAR YARÊ

Yar, yarê, yarê lê, yar, yarê, yarî,
Yar, yarê, yarê lê, yar, yarê yarî,

Qiz çûne çolê bêria êvarê,
Qiz çûne çolê bêria êvarê,

Ser malê mera, bin malê mera,
Ser malê mera, bin malê mera,
Holikê çêke ji xwe û kina xwera,
Holikê çêke ji xwe û kina xwera,

Kin diçû seyrê, min nabe bi xwera,
Kin diçû seyrê, min nabe bi xwera,
Ji faê vê gulê, ji faê vê gulê,
Bejna vê yarê, ji faê vê gulê.

Hêşin dikirî ç'emê Musilê,
Hêşin dikirî ç'emê Musilê,
Kaser mi bidîta dêra Zerç'elê,
Kaser mi bidîta dêra Zerç'elê,

Yar ya rê ya rê lê yar ya rê ya rê
yar ya rê ya rê lê şar hê şî no kê

YAR YARÊ

Yar yarê, yarê lê,
Yar yarê, yarê
Yar yarê, yarê lê,
Şar heşinokê.
Şar hêşinokê lê,
Xort xapinokê.
Xort xapinokê lê
Xort revinokê.

Carek mîn goti lê,
Hiva me waye.
Du car mîn goti lê
Hiva me waye.
Rûkê ezmanda lê,
Waye xuyaye.
Derdê mîn, kula mîn,
Keçka keya ye.

Carek mîn digoti lê,
Hiva me zize.
Du car mîn digoti lê,
Hiva me zize.
Orta ezmanda lê,
Waye dilize.
Derdê mîn, kula mîn,
Keçka ezize.

Yar yarê,... (Girêdan)

YAR YAR LI MÎN QUDRETÊ

Yar yar li min, yar li min
Yar yar li min, Qudretê!
Topa Xwedê lê ketê
Yar yar li min, yar li min
Yar yar li min, Qudretê!
Keç dixwênî Tebetê
Yar yar li min, yar li min
Yar yar li min, Qudretê!

Ji bo xatirê umetê
Yar yar li min, yar li min
Yar yar li min, Qudretê!
Ramûsim te hurmetê
Yar yar li min, yar li min
Yar yar li min, Qudretê!

YAR YAR YARA MÎN

Yar, yar, yara mîn.
Yar, yar, yara mîn.

Govend geriya lî hewşêye,
Yar, yar, yara mîn.
Ketime milê Eyšê ye,
Yar, yar, yara mîn.

Govend geriya lî sūkêye
Yar, yar, yara mîn.
Ketime milê bûkêye,
Yar, yar, yara mîn.

Navê yaram Emine,
Yar, yar, yara mîn.
Bîn dawetan namine,
Yar, yar, yara mîn.

Govend geriya bîn darê
Yar, yar, yara mîn.
Ketime milê yarêye,
Yar, yar, yara mîn.

YEK MÛMIK

Yek mûmîk, du mûmîk, sê mûmîk,
Çar mûmîk, çardeh mûmîk.
Serê malê mîsqalek,
Bûk lî zavê bîmbarek,
Ha nina, ha nina, nina nina.
Ha nina, heyran nina.

Kirasê zavê ho lo,
Kirasê paşê ho lo,
Dani l' ber me ye ho,
Pêşya me dibê ho,
Zavayê çav lî rê ho.

— Kanê zavayê we lo ?
— Kanê zavaçiyê we ?

— Vaye zavayê me lo ?
— Vaye zavaçiyê me ?
— Kanê tîrşîka we lo ?
— Kanê tîrşîkçiyê we ?

— Vaye tîrşîka me lo ?
— Vaye tîrşîkçiyê me ?
Yek mûmîk, du mûmîk, sê mûmîk,
Çar mûmîk, çardeh mûmîk.
Serê malê mîsqalek,
Bûk lî zavê bîmbarek,
Ha nina, ha nina, nina nina.
Ha nina, heyran nina.

YEK MÛMIK

Ha nina ha nina
Nina nina ha nina

Heyran nina / qurban nina.
Tırsa ke, ser zavé-yo me dani
Ber me rê yo li çiya
Me dibe yo Azepan
Çev me rê yo

Ha nina ha nina
Nina nina ha nina
Heyran nina / qurban nina.

Kane zava ye we lo
Kane zava çiyê we

Vaye zava ye me lo
Vaye zava çiyê me

Kane daweta we lo
Kane dawet çiyê we

Vaye daveta me lo
Vaye davet çiyê we

Yek mûmîk, dû mumîk, sê mûmîk
Çar mûmîk çardeh mumîk
Sere male mîsqalek
Buk lî zave bîmbarek ha nina

Ha nina ha nina
Nina nina ha nina
Heyran nina / qurban nina.

kane hîneya we lo
Kane hine çiyê we

Vaye hîneya me lo
Vaye hine çiyê me

Kane tırşîka we lo
Kane tırşîk çiyê we

Vaye tırşîka me lo
Veya tırşîk çiyê me

Yek mûmîk, dû mumîk, sê mûmîk
Çar mûmîk çardeh mumîk
Sere male mîsqalek
Buk lî zave bîmbarek ha nina

Kane mivanen we lo
Kane mazuwanen we

Kane xanîm buka we lo
Kane xanîm buka we

Kane tembura we lo
Kane temburwanen we

Kane dahola we lo
Kane daholwane we

Yek mûmîk, dû mûmîk sê mûmîk
Çar mûmîk çardeh mûmîk
Serê malê mîsqalek
Bûk lî zavê bîmbarek, ha nina

ZEKO, ZEKIYA

Zeko, Zeko, Zekiya
Zeko dî li ser xaniya
Tena-tena dimeşiya
Berfa bişev bariya
Lî ser zimana heliya
Kevanê libûdçiya
Bi ser mi de teviya
Mi dest avêt guliya
Hel û morî qetiya
Bîna misk û mawerê
Bi ser mi de fûriya
Ketim dilêm êşiya.

Zeko, Zeko, Zeynebê
Hat kerwanê Helebê
Danî li devê neqebê
Temênîya mil tebê
Tul nerînê miqatebê
Mi davê xwe kir xebxebê
Tez kuştim, tez helandim
Kirim darê lewlebê
Xwedya şara qesebê
Lê Zeko, Lê Zeko..

Mi Zeko dî li ber diwêro
Bisk berdane ji hawêro
Ramûsankê bide min
Ji qirikê berjêro
Ji binya qulpa guhêro
Ji kê tirî ji kê newêro
Tirsa te kûçikê mêro
Teres çûye bajêro
Kengî wê bê ne bixêro
Lê Zeko, Lê Zeko..

Lê, lê lêlê lê Zeko
Tu bi qedrê bavê xwe ko
Tê derî li min veko
Tê xeta so simbêla
Dî boxaza qirka xwe ko
Bere mêrê te bimrî
Xwedê te bi rizqe meko
Lê Zeko, Lê Zeko..

ZEYNO, ZEYNEBA MÎN

Kirasê Zeyneb melese, Zeyneba min
Min dabû ber meqese, Zeyneba min
Herçî dosta wê tune, Zeyneba min
Li herdû dinya bêkese, Zeyneba min

Kirasê Zeyneb mebrûme, Zeyneba min
Hûrik-hûrik didrûme, Zeyneba min
Herçî dosta wi tune, Zeyneba min
Li herdû dinya mehrûme, Zeyneba min

Kirasê Zeyneb tîrgale, Zeyneba min
Min daye ber pergale, Zeyneba min
Herçî dosta wi tune, Zeyneba min
Li herdû dinya bêmale Zeyneba min

Andante

Zem-bîl li roş zem-bî la tî ne,
 sūk û mi-hê la di-ge-rî-ne,
 Gul xa-lûn ji bir-cê di-bî-ne
 a-qil di-çe, sew-da di-mî-ne.

ZEMBÎL FIROŞ

Zembîl firoş zembîla tîne
 Sûk û mih'ela digerîne,
 Gul xatûn ji bircê dibîne,
 Aqil diçe, sewda dimîne,
 Divê: "Zembîl firoş, lawkê devrêşe,
 Kerem bike tu were pêşe,
 Tu bihaê zembîlê xwe bêje".
 Dibê: " Xatûnê, ez tobedarim,
 Hurmete, ez tobedarim,
 Tobedarê xelqê cebarim,
 Ez ji rebê jorîn nikarim,
 Zaruê birçîne li malin."
 Dibê: Qerweşo, tu lezke, bilezîne,
 Ti rabe birincekî bik'elîne,
 Bira zembîl firoş buxwe aqil bicvîne".
 Dibê Zembîl firoş, lawkê e' base,
 Bi tena derpê u kirase,
 Ji destê xatun nabi xilase
 Dibê: "Xatûna gerden bi morî,
 Tu bibi cemal u horî,
 Ez dest nadime te wi p'orî,
 Tirsî min ji rebê jorî"
 Dibê: " Zembîl firoş were ber misilê tê,
 Şuxul bike, xîrî te tê,
 Emê tevî herne cinetê".

ZÊRBERBENÎ

Zêrberbenî, berbenî
Xala li gerdenê, li gerdenê
Zêrberbenî, berbenî
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Wel nav bexçê gul çinî
Xala li gerdenê, li gerdenê
Wel nav bexçê gul çinî
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Mel hev nerî keç kenî
Xala li gerdenê, li gerdenê
Mel hev nerî keç kenî
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Zêrberbenî, em yekin
Xala li gerdenê, li gerdenê
Zêrberbenî, em yekin
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Hafê reza bi helekin
Xala li gerdenê, li gerdenê
Hafê reza bi helekin
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Lawno qîzik henekin
Xala li gerdenê, li gerdenê
Lawno qîzik henekin
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Zêrberbenî, em done
Xala li gerdenê, li gerdenê
Zêrberbenî, em done
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Hafê reza bi hirmone
Xala li gerdenê, li gerdenê
Hafê reza bi hirmone
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Lawno qîzik gezone
Xala li gerdenê, li gerdenê
Lawno qîzik gezone
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Zêrberbenî, em çarin
Xala li gerdenê, li gerdenê
Zêrberbenî, em çarin
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Hafê reza bi hinarin
Xala li gerdenê, li gerdenê
Hafê reza bi hinarin
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Lawno qîzik gulnarin
Xala li gerdenê, li gerdenê
Lawno qîzik gulnarin
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Zêrberbenî, em şeşin
Xala li gerdenê, li gerdenê
Zêrberbenî, em şeşin
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Hafê reza bi şebeşin
Xala li gerdenê, li gerdenê
Hafê reza bi şebeşin
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Lawno qîzik keleşin
Xala li gerdenê, li gerdenê
Lawno qîzik keleşin
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Allegro

Na-çi-me di - k'a - nê wê e' - t'a - ra,
Zêr Ze - mo. zêr Ze - mo, Ze - mo can.
Na-çi-me di - k'a - nê wê e' - t'a - ra,
Ez bê m Ze - mo, tu bê can.

ZÉR ZEMO

Naçime dik'anê wê e 't' ara,
Zêr Zemo. zêr Zemo. Zemo can,
Naçime dik'anê wê e't'ara,
Ez bê m Zemo, tu bê can.

Bazar nakim guharan,
Zêr Zemo, zêr Zemo. Zemo can,
Bazar nakim guharan,
Ez bê m Zemo, tu bê can.

Naynim qizê cînanan,
Zêr Zemo, zêr Zemo. Zemo can,
Naynim qizê cînanan,
Ez bê m Zemo, tu bê can.

Naçime dik'anê muxsiyan
Zêr Zemo, zêr Zemo. Zemo can,
Naçime dik'anê muxsiyan
Ez bê m Zemo, tu bê can.

Bazar nakim cindîyan
Zêr Zemo, zêr Zemo. Zemo can,
Bazar nakim cindîyan,
Ez bê m Zemo, tu bê can.

Naynim qizê rûspiyan,
Zêr Zemo, zêr Zemo. Zemo can,
Naynim qizê rûspiyan,
Ez bê m Zemo, tu bê can.

ZÊRZEYNEBÊ

Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Zêrzeynebê, Heseni
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Tub qolan û bazinî
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Ji bextê min re dipesinî
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Zêrzeynebê, Ertoşî
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Te li serî qereboşî
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Payê ji min re difroşî
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Zêrzeyneba Şikakî
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Te kofi ji barê gaki
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Hero, hero li awakî
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Hero li cem axakî
Zêrzeynebê, Zeynebê
Kûz li milan cêr li destan
Şandime sûka Helebê.

Koka dilokê bi vî awayî jêrî tê
gotin û hatiya danîn:

Zêrzeynebyê, Zeynebê
Zêrzeyneba Heseni
Tu bi qolan û bazinî
Je bextê min re dipesinî

Zêrzeyneba Ertoşî
Tel serî qereboşî
Payê li min difroşî.

Zêrzeyneba Şikakî
Te kofi ji barê gaki
Nero, hero li awakî.

ZÊR ZEYNEBÊ

Zêr Zeynebê, lı Zeynebê,
Zêrê lı Zeyneba Bıruki.
Tu bı xızêma şırıkı
Mori lı qırıkê, melhemê.

Par qız bû, isal bûki,
Zêrê lı Zeynebê Zeynebê.
Par qız bû, isal bûki,
Mori lı qırıkê, melhemê.

Zêr Zeynebê, lı Zeynebê,
Zêrê lı Zeyneba Malbatê.
Tu bı xızêma du qati,
Mori lı qırıkê, melhemê.



ZEYNEMÊ

Bayê baniyan ba tine,
Zeynema mın, Zeynema mın,
Bayê baniyan ba tine,
Zeynema mın, melhema mın,
Kılê çavan yar tine
Zeynema mın, Zeynema mın,
Kılê çavan yar tine
Zeynema mın, melhema mın,
Zeynem qıza meta mın,
Zeynema mın, Zeynema mın,
Zeynem qıza meta mın,
Zeynema mın, melhema mın,
Mın xwast metê neda mın,
Zeynema mın, Zeynema mın,
Mın xwast metê neda mın,
Zeynema mın, melhema mın,

Bû kul ket cigera mın,
Zeynema mın, Zeynema mın,
Bû kul ket cigera mın,
Zeynema mın, melhema mın,
Zeynem dergıstiya mın,
Zeynema mın, Zeynema mın,
Zeynem dergıstiya mın,
Zeynema mın, melhema mın,
Xelkê bır û neda mın,
Zeynema mın, Zeynema mın,
Xelkê bır û neda mın,
Zeynema mın, melhema mın,
Xırab kırın mala mın,
Zeynema mın, Zeynema mın,
Xırab kırın mala mın,
Zeynema mın, melhema mın,

ZEYNO

Hey lêlê, lêlê, lê lêlê, Zeyno
Êvare cîka deyno lêlê Zeyno
Sibhê cîka hilmeno lêlê Zeyno
Ramûsankê bide min lêlê Zeyno
Heta salek dî bideyno lêlê Zeyno
Navê keçkê nizañim lêlê Zeyno
Navê lêwik Hiseyno lêlê Zeyno

ZIRAV- ZIRAV

Zirav, zirav, zirav, zirav
Lê keçko ziravê
Gewrê bozê , li mala bavê
Lê keçko ziravê
Mij te pêve kesek navê
Lê leylo ziravê
Lê mij te pêve kesek navê
Lê Leylo ziravê.

Ew zirave weke mûye
Lê Leylo ziravê
Devê deryê me re çûye
Lê keçko ziravê
Mid go ax û ted go ûye
Lê leylo ziravê
Lê mid go ax û ted go ûye
Lê Leylo ziravê.

Ew zirave weke teşî
Lê Leylo ziravê
Devê deryê mere meşî
Lê keçko ziravê
Misk û mawer jê diweşî
Lê leylo ziravê
Lê misk û mawer jê diweşî
Lê Leylo ziravê.

Ew zirave weke dezi
Lê Leylo ziravê
Devê deryê mere bezi
Lê keçko ziravê

Mid go ax û ted go xwezi
Lê Leylo ziravê
Lê mid go ax û ted go xwezi
Lê keçko ziravê.

Ew zirave weke taye
Lê Leylo ziravê
Devê deryê mer bazdaye
Lê keçko ziravê
Mid go ax û ted go aye
Lê Leylo ziravê
Lê mid go ax û ted go aye
Lê keçko ziravê.

ZIRAVÉ

Zırav, zırav, zıravê,
Leylo, leylo zıravê.
Zırav, zırav, zıravê,
Ax keçê, zalım bavê.

Zırav, qıza keşe ye,
Leylo, leylo zıravê.
Rındê qıza keşe ye,
Ax keçê, zalım bavê.

Zırav, çüye qırşikan,
Leylo, leylo zıravê.
Rındê çüye qırşikan,
Ax keçê, zalım bavê.

Şırpa-şırpa şımıkan,
Leylo, leylo zıravê.
Şırpa-şırpa şımıkan,
Ax keçê, zalım bavê.

Zırav dendık qeline,
Leylo, leylo zıravê.
Rındê dendık qeline,
Ax keçê, zalım bavê.

Paya xortan hıltine,
Leylo, leylo zıravê.
Paya keçan dirêje,
Ax keçê, zalım bavê.



ZOZAN

Zozan, Zozan, Zozan, lê, lê, Zozan, lê, lê. Zozan,
Zozan, Zozan, Zozan, lê, lê, Zozan, kewê canê.
Rewşê refê qazan, lê, lê, Zozan, lê, lê. Zozan,
Rewşê refê qazan, lê, lê, Zozan, kewê canê.
Qûryan serkê qazan, lê, lê, Zozan, lê, lê. Zozan,
Qûryan serkê qazan, lê, lê, Zozan, kewê canê.
Bextê Zozan reşe, lê, lê, Zozan, lê, lê. Zozan,
Bextê Zozan reşe, lê, lê, Zozan, kewê canê.
Hûrik-hûrik dimeşe, lê, lê, Zozan, lê, lê. Zozan,
Hûrik-hûrik dimeşe, lê, lê, Zozan, kewê canê.
Ç'âyê zozan, rinde, lê, lê, Zozan, lê, lê. Zozan,
Ç'âyê zozan, rinde, lê, lê, Zozan, kewê canê.
Dor bi mal û gunde, lê, lê, Zozan, lê, lê. Zozan,
Dor bi mal û gunde, lê, lê, Zozan, kewê canê.
Zozan, Zozan, Zozan, lê, lê, Zozan, lê, lê. Zozan,
Zozan, Zozan, Zozan, lê, lê, Zozan, kewê canê.

ZOZAN

Zozan, zozan, zozan,
Lê lê zozan, lêlê zozan.
Zozan, zozan, zozan,
Lê lê zozan, kewê canê.

Ref tê refê qazan,
Lê lê zozan, lêlê zozan.
Ref tê refê qazan,
Lê lê zozan, kewê canê.

Fırıyan serkê gazan,
Lê lê zozan, lêlê zozan.
Fırıyan serkê gazan,
Lê lê zozan, kewê canê.

Ref ha tın re fê qa zan lê lê
zo zan lê lê zo zan
ZOZAN
gewrê can

Pezê zozan reşe,
Lê lê zozan, lêlê zozan.
Pezê zozan reşe,
Lê lê zozan, kewê canê.

Hûnk hûr dimeşe,
Lê lê zozan, lêlê zozan.
Hûrik hûr dimeşe,
Lê lê zozan, kewê canê.

Ref hatın refê qazan,
Lê, lê zozan, lê, lê zozan.
Ref hatın refê qazan,
Lê, lê zozan, lê, lê gewrê can.

Fırıyan diyarê sazan,
Lê, lê zozan, lê, lê zozan.
Fırıyan diyarê sazan,
Lê, lê zozan, lê, lê gewrê can.

Mın sılav lı keçikê lazan
Lê, lê zozan, lê, lê zozan.
Mın sılav lı keçikê lazan
Lê, lê zozan, lê, lê gewrê can.

Ref hatın refê çûçikan,
Lê, lê zozan, lê, lê zozan.
Ref hatın refê çûçikan,
Lê, lê zozan, lê, lê gewrê can.

Fırıyan diyarê sûkan,
Lê, lê zozan, lê, lê zozan.
Fırıyan diyarê sûkan,
Lê, lê zozan, lê, lê gewrê can.

Mın sılav lı keçik û bûkan
Lê, lê zozan, lê, lê zozan.
Mın sılav lı keçik û bûkan
Lê, lê zozan, lê, lê gewrê can.

Ref hatın refê betan,
Lê, lê zozan, lê, lê zozan.
Ref hatın refê betan,
Lê, lê zozan, lê, lê gewrê can.

Fırıyan diyarê xetan,
Lê, lê zozan, lê, lê zozan.
Fırıyan diyarê xetan,
Lê, lê zozan, lê, lê gewrê can.

Mın sılav lı keçikê metan
Lê, lê zozan, lê, lê zozan.
Mın sılav lı keçikê metan,
Lê, lê zozan, lê, lê gewrê can.

DERLEMEDE YARARLANILAN KAYNAKLAR

1. **Özgürlük Yolu Dergisi Koleksiyonu**
2. Eskere Boyik: **Kullika Çıyan**, 1978
3. **Helbesten Kurdî** (Weşanen Ranahi)
4. H. Navdar: **Kılam u Stranen Me**, KOMKAR Yay. 1985
5. Cemilê Celil: **Kılam u Mıqamed Cımeta Kurda**, 1982
6. Cemilê Celil: Ordixane Cemil: **Zargotına Kurd** (Kürt Folkloru) 2 cilt, 1978
7. Cigerxwin: **Folklorê Kurdî**, 1988
8. Ferhad: **Govend**, KOMKAR Yay. 1990
9. DGB: **Sayılmayız Parmağınan, Tükenmeyiz Kıрмаğınan**; Devrimci Gençlik Birliğı Yay. 1975
10. **Roja Nû** (1983-1985 Koleksiyonu)
11. **Koma Aşitî Repertuarı**

Institut kurde de Paris

KÜRTÇE- TÜRKÇE SÖZLÜK (FERHENG A KURDÎ-TIRKÎ)

-A-

Ağır
Ajotin
Al
Av
Azad

Ateş
Sürmek
Bayrak
Su
Özgür

Bırındar
Bısk
Bıxêr
Botan
Bûk

Yaralı
Zülûf
Hayırlı
Yer İsmi
Gelin

-B-

Ba
Ballf
Ban
Banzdan
Bar
Bejn
Bendewar
Benişt
Beran
Berav

Rüzgar
Yastık
Dam
Koşmak
Yük
Boy Pos
Bekleyiş
Sakız
Koç
Dere kenarında çamarsır yıkanan yer

-C-

Cem
Cemed
Cemidi
Cew(co)
Cl
Cıran
Cot
Cotek
Cûtın

Yanında
Buz
Buz oldu
Kanal
Yer
Komşu
Çift
Bir çift
Çiğnemek

Berbû

Gelini almayı giden kadınlar

-Ç-

Çav
Çêkırın
Çêrandın
Çıqas
Çiya
Çûçık

Göz
Yapmak, onarmak
Otlamak
Ne kadar
Dağ
Kuş

Berf
Berx(ık)
Bese
Bexşiş
Bextereş
Bêder
Bêhn
Beçare
Bılbıl
Bılind
Bılûr
Bırıqın
Bırın

Kar
Kuzu
Yeter
Bahşiş
Bahtı kara
Harman yeri
Koku
Çaresiz
Bülbül
Yüksek
Kaval
Parlamak
Yara

-D-

Dawet
Deng
Destmal
Deşt
Dêr
Dıçere
Dılize
Dıran
Dırevîne

Düğün
Ses
Mendil
Ova
Kilise
Otluyor
Oynuyor
Diş
Kaçırıyor

Dırésım	Eđiriyorum	Hene	Kına
Dıbêjım	Söylüyorum	Henek	Şaka
Dıl	Yürek, gönül	Herl	Yün
Dotmam	Amca kızı	Hernepeş	İleril
Düz	Düz	Hesın	Demir
-E-		Hewş	Avlu
Emr	Ömür	Hezan	Yer ismi
Eni	Alın, politik anl. Cephe	Hêlln	Yuva
Entax	Yer ismi	Hêlûg	Gürgen
Evin	Sevgi	Hêvl	Umut
Ezab	Bekar	Hıstêr	Gözyaşı
Ezman	Gökyüzü	Hışk	Kuru
-Ê-		Hlv	Ay
Êmiş	Yemiş, kız ismi	Hlvz	Koruma
-F-		Hûrik	Ufak, küçük
Famkırın	Anlamak	-I-	
Fırın	Uçmak	Istûn	Sütun, direk
-G-		-I-	
Garıs	Darı	İncas	Kara erik
Gav	Adım, zaman	İro	Bugün
Gaz	Tepe	-J-	
Gel	Halk	Jêra	Ona
Gellek	Oldukça, çok	Jın	Kadın
Gelo	Acaba	Jiyin	Hayat, yaşam
Genım	Buğday	-K-	
Gêll	Vadi, geçit	Kar	Oğlak, iş
Goşt	Et	Keç	Kız
Govend	Halay	Kesk	Yeşil
Guh	Kulak	Kevır	Taş
Guhar	Küpe	Kevok	Güvercin
Gull	Dal, saç örgüsü	Kew	Keklik
Gundi	Köylü	Kezeb	Ciğer
Gur	Kurt	Kezl	Saç örgüsü
Gurçık	Böbrek	Kılol	Küçük ekmek
-H-		Kınc	Çamaşır, giysi
Hatın	Gelmek	Kıras	Atlet
Helandın	Eritmek	Kon	Kıldan yapılmış çadır
Henar	Nar	Kul	Yara, derd
		Kullık	Dağ çiçeği
		Kur	Oğlan çocuğu

K0r	Derin	Pani	Topuk
-L-		Paşver0	Gerici
Law(ık)	Ođlan ocuđu	Paytext	Başkent
Leşker	Asker	Peya	Yaya
Lewj(an)	Marş, marşlar	Pez	Hayvan(küçük baş hayvan.)
Lez	Acele	Pêra	İle, onunla
Lêxin	Vurun, oynayın	Pêşkêş	Sunma
Libas	Elbise, giysi	Pêşver0	İlerici
Listık	Oyun	Piling	Kaplan
-M-		Pısmam	Amca ođlu
Maf	Hak	Pısmar	ivi
Mar	Yılan	Pıroz	Kutlama
Meb0s	Milletvekili	Poz	Burun
Mexel	Koyunların kırdı barındıkları ve dinlendikleri yer	Pozbılnd	Burnu havada
Mêrg	Çayır çimen	-Q-	
Mêrxas	Yiđit	Qaz	Kaz
Mêvan	Misafir	Qefle	Kafile
Mifte	Kilit, anahtar	Qell	Kavurma
Mil	Omuz, kol	Qel0n	Pipo
Mısqal	Az, küçük para	Qesr	Saray
Mışk	Fare	Qet	Hi
Mızgln	Müjde	Qevd	Sap, demet
Mi	Koyun	Qevdek	Bir demet
M0mık	M0m	Qeyde	Kaide
M0r (morl)	Boncuk	Qeym	Razı olma, sađlam
-N-		Qırık	Bođaz, boyun
Nalın	İnlemek	Qırşık	alıırıpı
Newal	Dere	Qirin	Bađırmak
Neyn0k	Tırnak	Qonax	Konak
Nezani	Bilmemezlik	Qul	Delik
Nêzlk	Yakın	Quling	Turna
Nok	Nohut	Qulp	Kulp
-O-		Q0	Taş yığını
Ore-or	Böđürtü	-R-	
-P-		Rab0n	Kalkmak
Pale	Reñçber	Ramusan	Öpücük
		Rast	Meydan, dođru
		Ref	Sürü(kuş sür.)
		Reqlb	Rakib
		Reş	Siyah

Rewş	Durum, hal	Tijl	Dolu	Zozan	Yayla
Rêkırın	Yolcu etmek	Tırş	Ekşi	Z0	Erken
Rijandın	Dökmek	Tışt	Şey		
Rızgarl	Kurtuluş	Tıt0n	Tüt0n		
Rızı-mızl	Çürük-mürük	Tomet	Töhmet		
Rihan	Reyhan	-U-			
Rojhılat	Doğu (yön)	-Ü-			
Roni	Aydınlık	-V-			
-S-		-W-			
Serbılınd	Alın açık	Welat	Vatan, yurt		
Serok	Başkan, lider	Were	Gel		
Sêwi	Öksüz				
Sibê	Yarın, sabah	-X-			
Sing	Göğüs	Xapandın	Kandırmak		
Sıvder	Kapı eşiği	Xedar	Çetin, ağır		
Sl	Gölge	Xem	Gam, keder		
Sinor	Sınır	Xerlb	Yabancı		
Sitil	Kazan	Xeyal	Hayal		
Sondxwarın	Yemin etm.	Xeyldın	Küsmek		
Spi	Beyaz	Xew	Uyku		
Standın	Almak	Xezal	İsim, ceylan		
Stêr	Yıldız	Xırab	Kötü		
-Ş-		Xızan	Fakir, yoksul		
Şar	Şal	Xurme	Hurma		
Şerm	Ütanma, ar	X0z	Eğri, eğilim		
Şêr	Arslan	Xwedê	Allah		
Şıkandın	Kırmak	Xwell	Kül		
Şırlg	Ortak	Xwezi	Keşke		
Şıxul	İş, çalışma	Xwln	Kan		
Şiyar	Uyanık	Xwlnxwarl	Kanemici(lik)		
Şoreş	Devrim	-Y-			
Şûr	Kılıç	Yadê(dayê)	Anne		
-T-		-Z-			
Tak	Tek, bir sap	Zava	Damat		
Taştê	Kahvaltı	Zebeş	Karpuz		
Tav	Güneş, güneşlik	Zef	Çok		
Tekoşın	Mücadele	Zer	Sarı		
Terım	Gidiyorum	Zêr	Altın		
Teşl	İğ	Zırav	İnce, narın		
Teşt	Hamur teknesi	Zıring	Yer ismi		
Têl	Tel	Zlv	Gümüş		

Institut kurde de Paris

Sedan sal, hezaran zimanê meye
Weki me di bin destê dijmindeye

Çi gernas û mêre di meydanê ceng
Ne şûr û ne mertal, ne top û tifeng

Yüzlerce, binlerce yıl dilimiz
Bizim gibi tutsak kaldı

Ne denli kahraman ve yiğit ki
Yenilmedi kılıca ve mızrağa

Cigerxwin

